DI XIZMETÊN CIHKÎ DE ÇI JI DESTÊ AMEDÊ DIÇE

PIRSGIRÊKÊN BAJÊR Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

AMED - 2024

"Bu Yayın Avrupa Birliği Sivil Düşün Programı kapsamında Avrupa Birliği desteği ile hazırlanmıştır. İçeriğin sorumluluğu tamamıyla Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi Derneği'ne (DİTAM) aittir ve AB'nin görüşlerini yansıtmamaktadır."

DI XIZMETÊN CIHKÎ DE ÇI JI DESTÊ AMEDÊ DIÇE

PIRSGIRÊKÊN BAJÊR Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

AMED – 2024

"Bu Yayın Avrupa Birliği Sivil Düşün Programı kapsamında Avrupa Birliği desteği ile hazırlanmıştır. İçeriğin sorumluluğu tamamıyla Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi Derneği'ne (DİTAM) aittir ve AB'nin görüşlerini yansıtmamaktadır."

DI XIZMETÊN CIHKÎ DE ÇI JI DESTÊ AMEDÊ DIÇE

PIRSGIRÊKÊN BAJÊR Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

"Bu Yayın Avrupa Birliği Sivil Düşün Programı kapsamında Avrupa Birliği desteği ile hazırlanmıştır. İçeriğin sorumluluğu tamamıyla Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi Derneği'ne (DİTAM) aittir ve AB'nin görüşlerini yansıtmamaktadır."

NAVEROK

DESTPÊK..... 8

BAJAR, HAWIRDOR Û MÎRATEYA ÇANDÎ..... 10

1. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ..... 10

1.1. Herifandina Avanîya Çandî, Dîrokî û Civakî ya Sûrê..... 10

1.2. Pirsgirêkên Bajêr yên Binesazî û Veguhastinê..... 11

1.3. Ji Bo Pîlankirina Bajarî Biryargirtina Di Asta Navendî De..... 12

1.4. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Bajarîyî..... 13

1.5. Pirsgirêka Nişîngehan û Pîlankirina Jîngehan..... 13

1.6. Li Bajêr Pirsgirêka Afirandina Rantan ya Bi Mebesta Berjewendîyê..... 14

1.7. Avanîbûna Bêdestûr û Hengavên Dagirkirinê..... 14

1.8. Pêkhatina Hîyerarşîya Çînî ya Di Teşedana Nişîngehan De..... 15

1.9. Pirsgirêka Zêdebûna Bêkontrol ya Di Avbikaranînê De..... 16

1.10. Avanîbûna Bi Rengê Sîteyî Çêbûna Karpêdana Jêhatî Berbend Dike..... 16

1.11. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Têrînekir yên Li Bajêr..... 16

1.12. Bikaranîna Ava Baranê..... 17

1.13. Pirsgirêka Destkarîkirina Li Qadên Şînkayîyê yên Bajêr..... 18

1.14. Pirsgirêka Trafîkê û Parkkirinê..... 19

1.15. Saznekirina Sîstemeke Veguhastinê ya Li Ser Hîma Peyayan..... 20

1.16. Hebûna Avahîyên Şemirandî..... 21

1.17. Herifandinên Li Çemê Dîcleyê û Li Newala Wê..... 22

1.18. Pirsgirêka Pîlansazîya Ji Bo Bobelatên Wekî Erdhej û hwd..... 22

JI BO JINAN, CIWANAN Û ZAROKAN BAJAREKÎ ÇAWA 24
2.PIRSGIRÊK Û ÇARESERÎ 24
2.1. Girtina Torên Piştevanîyê yên ku Jîyana Civakî Destek Dikin 24
2.2. Alûdetîya Tiryakan ya Berbelav Dibe 25
2.3. Tiryak û Teşedayîna Sîyasî 27
2.4. Çavpêxistina Jinûve ya Pîlansazîyên Bajêr û Şûngehan 29
2.5. Sazîyên Jinan yên Di Dema Qeyûmê De Hatin Girtin û Ji Kar Hatin Xistin ...31
JÎYANA SOSYO-KULTURÎ Û POLÎTÎKA 33
3. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ 33
3.1 Herifîna Sazîya Qeyûmê Çêkirî û Beşdarîtî 33
3.2. Parastina Zanava Bajêr 34
3.3. Veguherîna Çalakîyên Çandî û Hunerî 35
3.4. Rewşa Zimanê Dayikê û Polîtîkaya Zimanê Dayikê 36
3.5. Perwerdehî 38
3.6. Tenduristî 39
REWŞA ABORÎ Û BIPÊŞKETINA ÇOLTERÎ 40
4. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ 40
4.1. Divê Ji Bo Amedê Mîxwera Bipêşketinê ya Rast Çi Be 40
4.2. Pirsgirêkên Di Sektora Çandinîyê De 42
4.3. Pirsgirêkên Sektorî 46
4.4. Pirsgirêkên Di Sektora Sanayîyê De 50
4.5. Pirsgirêkên Di Ranêzikîyên Aborîya Nû De 52
4.6. Lidervehêlana Şaredarîyan ya Ji Qada Aborîyê 54
'DI XIZMETÊN CIHKÎ DE ÇI JI DESTÊ AMEDÊ DIÇE' 56
5. EZMÛNEYA ÎZMÎRÊ YA DI BIRÊVEBIRINÊN CIHKÎ DE 56
6. EZMÛNEYA ŞAREDARÎYA BAJARÊ MEZIN YA AMEDÊ YA DI BIRÊVEBIRINÊN CIHKÎ DE: 1999-2004 62
7. TEVKARÎ Û PIRSYAR 65

DESTEYA BIRÊVEBIRINÊ YA DİTAMê

Mesut AZİZOĞLU
Meral ÖZDEMİR
Sedat YURTDAŞ
Ahmet ÖZMEN
Barış YAVUZ
Sevim VURAL
Mahmut BOZARSLAN
Dilan Kaya TAŞDELEN
Nevin SOYUKAYA
Mahmut LEZGİN YALÇIN
Cihan AY

MODERATOR

Mehmet ASLAN
Nevin SOYUKAYA
Meral ÖZDEMIR
Dilan KAYA TAŞDELEN
Reha RUHAVIOĞLU

AMADEKIRINA RAPORAN

Mehmet ASLAN

TÎMA XEBATÊ

Halil BAYHAN
Deniz TEKİN

WÊNE

Mahmut BOZARSLAN

WERGER

Dr. Dilawer ZERAQ

NÎGARSAZÎ

A Grafik Creative Solutions

KURTENAV[1]

TIRKÎ	KURDÎ	DIRÊJENIVÎSÎNA BI KURDÎ YA KURTENAVAN
CHP	PGC	Partîya Gel ya Cumhurîyetê
DEM Parti	DEM Partî	Partîya Demokrasî û Wekhevîya Gelan
DİTAM	KNLCD	Komeleya Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê ye
DTSO	OSBA	Odeya Sanayî û Bazirganîyê ya Amedê
FAO	RÇD	Rêxistina Çandinîyê ya Dinyayê
GAP	PBA	Projeya Başûrêrojhilata Enadoluyê
GSMH	HNB	Hilberandina Neteweyî ya Brût
GSYH	HNWB	Hilberandina Nava Welat ya Brût
HA	HA	Hektar
HADEP	PDG	Partîya Demokrasîya Gel
HEP	PKG	Partîya Keda Gel
KOSGEB	SDPGKPNB	Serokatîya Daîreya Piştevanî û Geşkirinê ya Kargehên bi Pîvanên Navîn û Biçûk
KSS	SSB	Sîteya Sanayîya Biçûk
MHP	PTM	Partîya Tevgera Miletperest
MTA	LVM	Lêgerîn û Vekolîna Madenê
ODTÜ	ZTRN	Zanîngeha Teknîk ya Rojhilata Navîn
OSB	HSO	Herêma Sanayîya Organîze
PEN	KN	Komeleya Nivîskaran
PİSA	BNXN	Bernameya Nirxandina Xwîneran ya Navneteweyî
SGK	SES	Sazîya Ewlekarîya Sosyal
SSPE	NPSS	Nexweşîna Subakut Sklerozan Panensefalit
STÖ	RCS	Rêxistinên Civaka Sivîl
TKDK	SDBÇÇ	Sazîya Destekkirina Bipêşketina Çolterî û Çandinî
TÜİK	SST	Sazîya Statîstîkê ya Tirkîyeyê
TÜGVA	WCT	Weqfa Ciwanan ya Tirkîyeyê
TÜRGEV	WXPCT	Weqfa Xizmekirina bo Perwerdehî û Ciwanan ya Tirkîyeyê
TYS	SNT	Sendîkaya Nivîskarên Tirkîyeyê
UNESCO	UNESCO	Sazîya Çand, Ziman û Zanistê ya Neteweyên Yekbûyî

1 **Têbinîya wergêr**: Ji bo parastina orîjînalîya hin sernavan û kurtenavan, awayê wan yê Tirkî û Îngilîzî hatine bikaranîn. Hin sernav jî, carinan wekî orîjînal carinan jî wekî awayê wan yê Kurdî hatine bikaranîn.

Ji DİTAMê

Em wekî sazîya DİTAMê, me berîya hilbijartinên cihkî, xebateke bi navê “Çespandina Pirsgirêkên Bajêr û Pêşnîyazên Çareserîyê” da destpêkirin û di çarçoveya vê xebatê de, me li Amedê çar xalbend û sernav dîyar kirin û bi tevlêbûna bi qasî 80 sazîyên civaka sivîl, me çar civînên bi komên navendî yên ji hev cuda çêkirin.

Mijarên civînên bi komên navendî ev bûn;

Bajar, Hawirdor û Mîrateya Çandî

Jîyana Sosyo Kulturî û Polîtîka

Rewşa Aborîyê û Bipêşketina Çolterî

Jin, Ciwan û Zarok

Me daneyên ku ji van civînan hatin bidestxistin, roja 27ê Sibatê ya sala 2024an, li Amedê, bi sernavê ‘Di Xizmetên Cihkî De Çi Ji Destê Amedê Diçe’, di civînekê de ku ji Amedê û ji herêmê STÖ (RCS-Sazîyên Civaka Sivîl) tev lê bûn, bo raya giştî aşkere kirin.

Armanca me ya di civînê de ev bû; me xwest di kêmanîyên xizmetên cihkî de heyî xuyanîtir bikin ku di jîyana polîtîk ya Amedê de li ser wan pir hindik tê axaftin û xizmetên şaredarî yên li rojavayê Tirkîyeyê û xizmetên şaredarîyê yên li Amedê bidin ber hev.

Em wekî DİTAMê, me li Amedê, civîneke bi navê ‘Di Xizmetên Cihkî De Çi Ji Destê Amedê Diçe’ çêkir û daneyên ku me parve kirin û di vê weşanê de gengeşîyên ku li ser mijaran hatine kirin, cî didin xwe.

Desteya Birêvebirinê ya DİTAMê

DESTPÊK

Em wekî DİTAMê, di rojên 6 û 7ê Rêbendana sala 2024an de, li Amedê, bi tevî 80 sazî û kesayetan, bi çar sernavên ji hev cuda, xebateke bi navê "Çespandina Pirsgirêkên Bajêr û Pêşnîyazên Çareserîyê" çêkir. Di xebatê de ku wekî civînên komên navendî hat kirin, li ser van sernavan gengeşî hatin kirin:

1. Bajar, Hawirdor û Mîrateya Çandî
2. Jîyana Sosyo Kulturî û Polîtîka
3. Rewşa Aborî û Bipêşketina Çolterî
4. Ji bo Jinan, Ciwanan û Zarokan Bajarekî Çawa

Me encamên ku ji vê xebatê hatin bidestxistin, di 27ê Sibata sala 2024an de, di civîna ku me li Amedê bi sernavê 'Di Xizmetên Cihkî De Çi Ji Destê Amedê Diçe'çêkir, bi raya giştî re parve kir û me encam dan ber gengeşîyê.

Me çima wisa kir? Pêşqebûleke me ya wisa heye; em bawer dikin ku dewlet û cumhurîyet, ji avabûna xwe bi vir ve ye, herêmên ku Kurd lê dijîn, bi zanebûn, feramoş dike. Statîstîkên ku sazîyên fermî di warên aborî, tenduristî, perwerdehî û hwd. de diweşînin û belav dikin jî vê feramoşkirinê dide der ku jixwe li her hêla jîyanê li dar e.

Piştî vê destpêka ku ji bo Kurdan bi dezawantaj e û bi tevî van 40 salên dawî ku bi pevçûnê didome û pêkanînên qeyûmavêtinê ku piştî sala 2015an her li dar e bûn sedem ku kêmanîyên di warê xizmetên şaredarîyê û xizmetên cihkî de zêdetir bibin.

Neh sal, bi birêvebirina birêveberên sazîyên fermî ku dîrok, çand û kuçeyên bajêr nas nedikirin, bi awayekî ji gel dûrketî, bihurîn û ev yek bû sedem ku kêmanîyên di warê xizmetên cihkî de zêdetir û mezintir bibin. Konseya Bajêr ya Amedê ku hemû pêkhateyên bajêr tê de digihîştin hev û ji alî hiqûqîbûnê ve xwe dispart qanûna şaredarîyê, hema bêje hate bêerkkirin û bêbandorkirin.

Wekî encam, hemû tiştên ku qewimîn, bûn sedem ku xizmetên şaredarîyê yên ji bo Amedê kêm bimînin û kalîteya jîyanê ya civakê jî di asteke nizm de be. Ev rewş, li bajarên din yên herêmê jî bi heman awayî ye û ev yek ne ji bo rojên îroyîn, di heman demê de, ji bo siberoja me jî pirsgirêkên mezin çêdikin.

Em wekî DİTAMê, berîya hilbijartinên cihkî ku wê di demek nêz de çêbibin, armanca me ya ji vê xebatê ew e ku em;

- Bi tevî SCS, akademîsyen û komeleyên pîşeyî, çespandina pirsgirêkên Amedê û geşe bidin pêşnîyazên çareserîyê.
- Pêşnîyazên hatî kirin, hem di asta herêmî de hem jî bi awayekî gelemperî ragihînin sazî û kesayetên muxatab û eleqedar,
- Bi çêkirina fişarekê, ji sazî û kesayetên eleqedar daxwazê bikin da ku li ser

pirsgirêkan çareserîyan peyde bikin û şopgerîya xebatên çareserkirinê bikin.

- Neheqîya ku Amed, hem di asta herêmî hem jî di asta gelemperî de, dûçarî wê dimîne, xuyanîtir bikin.

Daneyên ku ji civînên komên navendî hatine bidestxistin, sed korayî, şanî me daye ku Amed bûye bajarekî bêxwedî. Ev kêmanîyên ku di xizmetên herêmî de çêbûne, di jîyana polîtîk ya geş ya Amedê de pir hindik tên behskirin û em li xwe dikin armanc ku van kêmanîyan xuyanîtir bikin. Wekî din jî me xwest xizmetên şaredarîyê yên li vê derê û xizmetên şaredarîyê yên li rojavayê bidin ber hev. Em wisa fikirîn, kesên ku wê herî baş karibin ji van kêmanîyan fam bikin û wan bidin der ew kes in ku şaredarî kirine û bi vê mebestê jî, me şaredarê bajarê mezin yê Îzmîrê Birêz Tunç Soyer û yek ji şaredarên bajarê mezin yên Amedê yên berê Feridun Çelik vexwendin. Ez spasîya xwe ji bo her duyan jî dibêjim. Tiştên ku wan gotin, tevkarîyên mezin li pirsa me ya 'Di Xizmetên Cihkî De Çi Ji Destê Amedê Diçe' kiriye. Em careke din spasîya xwe ji bo her duyan dibêjin ji ber ku tev li civînê bûn.

Helbet ne gengaz e em şaredarîya Amedê ji meseleya Kurd cuda bifikirin. Du şaredarên Bajarê Mezin yên vê dawîyê, Gülten Kışanak û Selçuk Mızraklı di girtîgehê de ne, şaredarê berîya wan, Osman Baydemir jî, ji ber berbendîyên qanûnî li derveyî welêt e.

Bi tevî hemû neyînîyên ku qewimîn, kevneşopeke civaka sivîl ya pir xurt heye li Amedê. Bi taybetî, ji ber jîyana polîtîk ya geş ya van salên dawîyê, zimanê civaka sivîl jî, paralelî vê rewşê, pir zêde bû zimanekî polîtîk. Em di vê xebata xwe de, li xwe dikin armanc; xebatên ku civaka sivîl li ser qada xwe kirine, agahîyên teknîk ku wê hilberandine, xuyanîtir bikin û wan bigihînin sazîya sîyasetê ya navendî û herêmî. Em hewlê didin da ku agahîyên civaka sivîl hilberandine bibin naveroka zimanê sîyasetvanan. Jixwe felsefeya sereke ya sazkirina DİTAMê jî ev bû. Helbet em pê dizanin, ev xebat hemû pirsgirêkan li xwe nagire û kêmanîyên vê xebatê jî hene. Lê belê em wisa difikirin ku wê ev xebat, ji bo xebatên di pey re ji me re bibe rêber.

Em spasîya xwe ji hemû kesayet û sazîyan dikin ku tevkarîyên xwe di amadekirina vê raporê de kirin û her wisa, malavayî li Birêz Tunç Soyer û ji Birêz Feridun Çelik dikin ku îro bi me re ne.

Desteya Birêvebirinê ya DİTAMê

BAJAR, HAWIRDOR Û MÎRATEYA ÇANDÎ

Moderator: Nevin Soyukaya

1. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

1.1. Herifandina Avanîya Çandî, Dîrokî û Civakî ya Sûrê

Ji alî avanîya dîrokî, çandî û civakî ve, Sûr ew beş e ku herî zêde hat herifandin. Bi taybetî demajoya pevçûnê ku piştî sala 2015an qewimî û ranêzikîyên li ser hîma ewlekarîyê ku ji ber demajoya pevçûnê hat nîşandan û polîtîkayên qeyûm, rehend û çarçoveya herifandinê kûrtir kir. Çalakîyên xerakirin û veavakirina li Sûrê ku bi biryara desteya wezîran ji %82yê wê hat dewletîkirin, kir ku ji %50yê qada di nav Sûrê de ji navê winda bibe û tevdehîya avanîya wê tera bibe. Sûr, ji jîngehbûnê hat dûrxistin û bo qada bazirganîyê hat veguherandin. Bi avanîya nû ya li ser hîma ewlekarîyê hatî danîn, sîstematîkek wisa hat tercîhkirin ku tu eleqeya wê bi avanîya mîmarî ya bajêr û bi avanîya bajêr ya kevneşopî re tune ye. Piştî bûyerên salên 2015-2016an, pêşî qada di Sûrê de, ji alî Wezareta Hawirdor û Bajarvanîyê ve hat rûxandin. Paşê sînorên erdik, parsel û kuçeyan hatin guherandin. Di pey re, KAİP (Pîlana avahîyan ya bi armanca parastinê) li gorî pîlana bicîanînê hat nûkirin. Bi awayekî li dijî avanîya kuçeyên Sûrê, bi mebesta ewlekarîyê rêyên fireh hatin çêkirin, avanîya dîrokî û çandî ya Sûrê bi pîlan û bi bicîanînan hat herifandin. Avanîya fizîkî ku ji navê hat windakirin, bi biryara dewletîkirin û dankoçkirina jibêgavî ya mirovên ku li wê qadê dijîn, qad ji mirovan hat xalîkirin û ev yek jî bû sedem ku zêdetirî bîr û hafizeya hevpar û kolektîf ya bajêr biherife û ji navê winda bibe. UNESCO ji alî xisardayîn û herifandinên ku li Sûrê hat kirin, nirxandinê dike û balê dikişîne serê ka ji alî dewletê ve rûxandineke çawa hatiye kirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Di sala 1990î de li Sûrê xebat hatin destpêkirin û 300 avahîyên tescîlkirî hatin dîyarkirin. Digel xebatên ku di sala 2012yan û di çarçoveya KAİPê de hatin kirin jî, li Sûrê, hejmara avahîyên tescîlkirî bû 595 (448 jê avahîyên sivîlan, 147 jê jî avahîyên mêlav). Roja îro, ji ber ku rûxandinên di qadê de berdewam dikin, ev hejmar guherî.

Ji bo ku Sûr bigihîje rewşa xwe ya berê, digel avahîyên tescîlkirî yên roja îro, bi piştevanîya xebatên ku bûne sedem Keleha Amedê û Qada Peyzajê ya Çandî ya

Baxçeyên Hewselê bikeve nav Lîsta Mîrateya Dinyayê ya Unescoyê, divê erdik, parsel û sînorên kuçeyan ku li gorî pîlan û sazûmanîya di sala 1954an de hatine çêkirin û di paftayên qadastral de cî girtine, wekî esas werin qebûlkirin.

Divê Qada Mîrateya Dinyayê bi awayekî tevdehî were parastin.

Divê Pîlana Nazim ya Avadanîya 1/5000 car din were nûkirin, sînorê KAİPê ya li Sûrê û Baxçeyên Hewselê jî were tevlêkirin û KAİP ji nû ve were destnîşankirin.

Divê Pîlana Birêvebirinê ya Qadê ya Qada Mîrateya Dinyayê ji nû ve were çêkirin û li ser hîma stratejîyên parastina qadê, herifandin û xerabûnan, ji nû ve were birêkûpêkkirin.

Hemû pîlanên ku wê li ser qadê werin çêkirin, divê bi awayekî şefaf û beşdarîya hemû derdoran werin kirin.

Divê li ser rapora Mîsyona Reaktîf ya UNESCOyê ku di sala 2023yan de amade kir û li ser biryarên ku UNESCO bi vê raporê re pêwendîdar wergirt, di qadê de xebatên nûkirinê werin kirin.

1.2. Pirsgirêkên Bajêr yên Binesazî û Veguhastinê

Li bajêr, pirsgirêkên giring hene di warê binesazîya veguhastinê de. Razemendîyên veguhastinê yên makro ya ku di asta navendî de tên kirin û xebatên veguhastinê û binesazîyê ku di asta herêmî de tên kirin, gelek dûr e ji asta ku tê xwestin. Ji ber ku polîtîkayên veguhastinê yên nû, li ser angajebûna trendên wekî trênên bilez, vekirina rêyên dorhêlî yên pîlankirî, kêmbûna pîlana veguhastina nava bajêr, têrînekirina veguhastina komî û rêyên heyî, nayên birêkûpêkkirin, her ku diçe trafîk asêtir dibe û qezayên çêdibin jî zêdetir dibin. Xebatên danîna sîstemên rayên sivik/tramvaya ji bo veguhastina di nava bajêr de, hê jî di qonaxa pîlankirinê de ye. Pevgirêdana otobanê ku divê xebata wê di asta navendî de were kirin û gihandina herêma lojîstîk ya bi rêya trênê ya li keştîgehê jî ne di rojevê de ye... Yek ji pirsgirêkên mezin yên bajêr jî, veguhastin e; lê belê divê pirsgirêka veguhastinê tenê di çapana nava bajêr de neyê famkirin. Pevgirêdana bajêr ya bi bajarên dîtir e, pevgirêdana bajêr ya ji bo veguhastina navbajaran û veguhastina navneteweyî jî, bi awayekî tevdehî, wekî pirsgirêkên hîmî û esasî li rastê ne.

Di civîna koma navendî de, bi 2 sernavan, mijara veguhastinê hat nirxandin. Ya yekem, aksên veguhastinê yên ku ew ê pevgirêdana rêyên bajêr yên bi qadên navneteweyî re û bi bajarên dîtir re çêke; Ya duyem jî, pevgirêdana bajêr ya bi bajarokên dîtir re û pevgirêdanên di nava bajêr de ye. Ji bo vebijêrka yekem, ji ber ku çêkirina rêyên dorhêlî nehatine neçûye serî an jî çêkirina wan dereng ketiye û pevgirêdanên wan yên bi torên veguhastinê re temam nebûye, ev yek dibe sedem ku rêyên navbajêr wekî rêyên transît werin bikaranîn û bar û asêbûna trafîka bajêr zêdetir bibe. Derengmana ku di pevgirêdana bo Amedê ya otoban û xeta trêna bilez de çêdibe, ji alî veguhastina rêwîyan û lojîstîkan ve jî dike ku pirsgirêk li ser hev kom bibin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Di nava 30 bajarên mezin de, rêya dorhêlî ya Amedê tune ye û ji bo çareserkirina pirsgirêka veguhastinê, divê xebatên bi bandortir werin kirin, divê lobîkarî were kirin û pestên sîyasî werin kirin. Rêya dorhêlî ya Mêrdîn-Pirinçlikê ancax di 10 salan de hat temamkirin û ev yek jî nîşan dide ku daxwazên bajêr di asta navendî de bi awayekî xurt nayê bersivandin. Loma jî, divê li herêmê, mekanîzmayeke lobîyê û ya pestlêkirinê ya xurt hebe. Di vê deqbendê de, divê rêyên dorhêlî li gorî pêwîstîyê werin pîlankirin û werin çêkirin, pîlana veguhastina nava bajêr were nûkirin, sîstema rayê were çêkirin û bi vî awayî jî pirsgirêka asêbûna trafîkê were çareserkirin.

Di çarçoveya pevgirêdana otobanê de ku divê xebata wê di asteke navendî de were kirin, ji bo ku herêma lojîstîk bi rêya trênê bi keştîgehê ve were pevgirêdan, pêwîst e rojeveke taybet were çêkirin û di demajoyeke nêz û pir ne dûr de tev li pîlankirinên welêt werin kirin.

Ger qadek ji bo projeya gundên lojîstîk ya Amedê were terxankirin, wê ev yek bike ku barê lojîstîk yê bajêr bo hawirdorê were veguhastin. Di qada lojîstîkê de, avakirina binesazîyê û destpêkirina avakarîya hîmî, pêşketineke giring e. Lê belê, ji bo ku proje rengekî kartêker û çalak bigire, divê pevgirêdana otobanê û ya trênê were temamkirin. Gava rêyên bejayî yên pevgirêdana dorhêlî yên Riha û Xarpêtê werin çêkirin, wê ev yek bike ku entegrasyona rêyan ya Amedê xurttir bibe. Ji bo çareserkirina pirsgirêkê, divê Wezareta Veguhastinê û Binesazîyê û şaredarî, bi hevkarî bixebitin û bi demajoyeke beşdar, gavek berî gavekê dest bi bicîanîna projeyan werin kirin.

1.3. Ji Bo Pîlankirina Bajarî Biryargirtina Di Asta Navendî De

Li ser erdên kesan û xezîneyê ku ne qadên veguherandina bajarîyî ne, biryar tên girtin. Bi biryarên şaredarîyê, di warê pîlankirina bajêr de, bi nûkirinên bi çapanên mezin û biçûk ji bo rantê nûkirinên cihkî tên kirin. Sedema sereke yên di nûkirinên cihkî de ev e; binbarîyên qanûnî yên wekî bac û xercê ku ji zêdebûna bihayan çêdibin, di navbera biryargiran û kesên ku zêdebûna bihayan bi kêrî xwe tînin de dibe lihevparvekirineke rantî.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Bi taybetî Wezareta Hawirdor, Şarevanî û Guherîna Avhewayê û şaredarîyên qeyûmî, bi awayekî li dijî qanûnan, qadên parkan, qadên rekreasyonê, qadên perwerdehî û tenduristîyê betal dikin û wekî ofîseke emlaqê nirxa erdên xwe zêdetir dikin û didin ber firotanê an jî ranta ku di nûkirinên cihkî de çêdibe, ji hêlekê ve, çerxa bertîlê çêdike; bi taybetî sazîyên civaka sivîl ku bi vê meseleyê re eleqedar in dikarin li dijî wê kirinê, bala mirovan bikişînin ser meseleyê, serî li qanûnan bidin û di platformên wekî çapemenî û medyaya civakî de behsa mekanîzmaya rantê bikin. Lê belê, tiştekî jibêgavîyê ye ku birêvebirîyên cihkî, di demajo û qo-

naxên biryargirtin, pêkanîn û pîlankirinê de ku wê ji bo çareserkirina meseleyê bên kirin, bergirîyên pêwîst lê bikin.

1.4. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Bajarîyî

Qadên perwerdehîyê ku wekî binesazîyên bajarîyî hatine destnîşankirin, qadên tenduristî, sazgehên çandî û qadên parkan bi awayekî rêjeyî tên kêmkirin. Digel vê yekê jî, paşê şênî tev li pîlanên avadanîyê tê kirin û ev yek dibe sedem, bi awayekî *de facto* qada gelemperî û binesazîyên bajarîyî roj bi roj kêmtir bibin. Her wisa, li bajêr, her wekî li taxên Fîsqeya, Baxlar û Kaynartepeyê jî wisa ye, hin pêkanînên veguherandina bajarîyî tê dîtin ku ji pêkanînên veguherandinên bajarî yên li Sûrê hatî kirin bi vir ve ye berdewam dike. Li bajêr, veguherînên ku mirovan naxin navenda xwe, avanîya demografîk diguherînin û rantê dixin navenda xwe tên kirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Parastina dîrok û avanîya çandî ya Sûra dîrokî ku cîyê navendî yê bajêr e, ji bo ku bîra (hafizeya) civakî winda nebe, divê biryara veguherandina bajarîyî û biryarên dewletîkirinê werin betalkirin û divê pêkanînên veguherandinên bajarî werin rawestandin. Ji bo vê yekê, divê pêjnkarîya raya gştî û pestlêkirina wê were xurtkirin.

Di veguherandinên bajarî yên ku jibêgavî tên kirin, divê Wezareta Hawirdor, Şarevanî û Guherîna Avhewayê û şaredarî, li ser hîmên ku mirovan dixin navendê, rêzê li heqê milkdarî û xweyîmaltîyê digirin, pêkanînên veguherandina di şûna xwe de bi cî bînin. Te divê bila navendî be te divê bila herêmkî be, divê rêbaz û navgînên destkarîkirina li pîlanên veguherandinên bajarî werin bipêşxistin.

Her wekî di mînaka rêya Sûr-Farqîn de jî wisa ye, divê xebat li serê were kirin da ku; rantên mezin yên ku ji bo xwedîyên parselên taybet tên dabînkirin, werin astengkirin, divê rojeva rapor û pîlanên avadanîyê yên ku tên manîpulekirin, werin geşkirin, bi taybetî jî, divê perde ji ser were hildan ku di projeksîyonên hejmarên şênîyan de bi qasî ji %50, ji %100 zêdehî tên nîşandan û bi awayekî taktîkî rêjeyên qadên gelemperî û qadên şînkahîyê tên kêmkirin û divê li ser şênîyên heyî û şênîyên projeksîyonî xebatên teknîkî werin kirin û divê ranta ku piştî encama pîlankirin û nûkirinan çêbibe, divê li ser rê û rêbaza wê xebat were kirin da ku bi awayekî wekhev li hemû şênîyên di nava qada nûkirin û guherandinê de heyî were parvekirin û ev yek bi qadên şênîyên eleqedar re were parvekirin û haydarîya wan were zêdekirin.

1.5. Pirsgirêka Nişîngehan û Pîlankirina Jîngehan

Di pîlankirina nişîngehan û jîngehan de, tevî ku çavnêrî lê tê kirin ku hejmara carînê û zêdekirina hevtayan bi piranî di nav sînorên Kayapinarê de çêdibin jî, gelek caran operasyonên cihkî yên ku qadên wekî Peyas û Fîsqeyayê jî li xwe dikin navend, tê dîtin. Digel vê yekê jî, bi taybetî li bajarokên wekî Bismil, Çınar, Gêl û Farqînê jî,

hewldanên mezin yên ji bo rantê jî tên dayîn.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Ne tenê habîtata bajêr ya Amedê, divê pîlanên û nûkirinên ku li ser rantê û li bajarokan tên çêkirin jî werin rojevê. Ne tenê haydarîya ji bo rantê, divê têgiha "pîlankirina îdeolojîk" jî were rojevê û gengeşî li ser were kirin.

Dibe ku xebatên ku wê li dijî pîlanên rantê werin kirin komên berjewendîyê li xwe bikin armanc û ev yek jî carinan bibe sedem ku saîkên polîtîk ji ber çavan winda bibin, paşperdeya pîlanên ku li ser ewlekarîyê tên kirin an jî mebesta veşartî ya pîlanên ku avanîya sosyal û dîrokî li xwe dikin armanc, neyê dîtin. Loma jî, nanakirinên ku wê bên kirin jî, divê bi awayekî pirrehend bin û bi awayekî stratejîk di ber çavan re werin derbaskirin.

1.6. Li Bajêr Pirsgirêka Afirandina Rantan ya Bi Mebesta Berjewendîyê

Li bajêr, hin 'şîrketên ku qasa zêdebûna bihayan dîyar dikin' hene ku bi avabûneke organîzebûyî, der heqê zêdebûna bihayan de, bi pêwendîyeke organîk, bi şaredarî û birêvebirîya navendî re dixebitin. Ji ber ku şîrket û pêkhateyên bi vî rengî hene ku binesazîya rantê pêk tînin, hin şîretan li şaredarîyan dikin, bi taybetî li ser bulwarên Riha û Xarpêtê ranta bazirganîyê di destê xwe de digirin, ev yek dike ku enîya rantê, bi mentîqa networkê hê bêtir organîzebûyî bixebite.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Ne tenê pîlankarên bajêr an jî sazîyên ku ji mîmaran pêk tên, divê bi rêkxistineke ji avanîyên piralî pêkhatî li dijî van rêkxistinên ku ji ber parvekirina rantê bûne hevparên hev, were têkoşkirin. Bi taybetî divê ji hêla dînamîkên bajêr ve xwedîtî li hewldanên Odeya Pîlankarên Bajêr were kirin û piştgirî bê van hewldanan were dayîn. Divê ji bo dozên ku wê vebibin, fonên hiqûqî werin amadekirin. Divê avanîyên spesifîk yên wekî "konseya bajêr", ku tenê ji bo meseleya rant û avadanîyê hatiye avakirin, avanîyên ji alî îcrayî û darayî ve hatine piştgirîkirin werin danîn... Wekî din jî, divê li ser van vesazbûnan, serlêdanên qanûnî bilez werin kirin.

1.7. Avanîbûna Bêdestûr û Hengavên Dagirkirinê

Pirsgirêkên wiha hene; hengavên dagirkirinê û avanîbûna bêdestûr yên bi wateya klasîk, hengavên rêkxistinî yên ku ranteke mezin li xwe dikin armanc û ku di mînaka Göletli Parkê de jî wisa ye, hengavên dagirker ku qadên gelemperî dikin milkê xwe yê şexsî, pêpeskirinên li ser para kêşanê ku dibin dagirkirina rêyan û pêkanînên wisa dibin çerxeke dagirkirinê yên asayî. Her wekî di mînaka Nexweşxaneya Genesisê de jî wisa ye, "hengavên dagirkirinê yên berfireh" zêdetir dibin. Her wekî bi palpiştîya biryara rûniştina 45an ya sala 2023yan ya UNESCOyê jî hatiye belgeki-

rin, dagirkirinên di nav sînorên Newala Dîcleyê, Baxçeyên Hewselê û Pira Dehderî de çêbûne jî ji bo van mîjaran mînak in.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Birêvebirina navendî û şaredarîya qeyûmî, valahîya ku ranêzikîyên li ser ewlekarîyê li bajêr çêkiriye, refleksên der heqê dagirkirin û avahîyên bêdestûr de çêbûyî, vediguherîne ser fikira ku tiştên hatî kirin asayî û cihgirtî ne û heqek e. Li dijî dagirkirin û "avahîyên bêdestûr yên pirreng", bêyî ku bal pê were dayîn ka dagirker kî ye, dîtina wî ya polîtîk çi ye, networka wî ya sosyal çi ye û hwd, divê refleksekê bajarî were avakirin.

Divê di ser têgihên dagirkerîyê re, yên wekî "dûrî me ye" an jî "nêzî me ye", pozîsyon neyên çêkirin û bi vî awayî jî têgiha "dagirkirin"ê neyê rewakirin.

Divê ji alî şaredarîyên pêwendîdar ve dawî li dagirkirinên li dorhêla Newala Dîcleyê, Baxçeyên Hewselê û Pira Dehderîyê hatî kirin, were anîn û cihên valamayî li gorî avanîya sirûştî ji nû ve werin çêkirin.

Ji bo hengavên li ser Hewselê ku hewl tê dayîn ku bi pêkanînên rekreasyonê pêşîya avahîçêkirinê were vekirin, divê odeya endezyarên ziraetê nanakirinekê li Desteya Axê bike, şerh li serê dayne û dozên ku TMMOBê (YOAET) bi mebesta ku pêşî li hengavên bi vî rengî bigire vekirine û qazanc kirine, wekî mînak were girtin û hengavên li ser vê mebestê her tim werin berdewamkirin û wisa were kirin ku civak jî piştgirîyê bide van nankirin û qebûlnekirinan.

1.8. Pêkhatina Hîyerarşîya Çînî ya Di Teşedana Nişîngehan De

Bi tevî qadên berfireh yên nişîngehan, li Amedê, ji bo komên ku dahata wan navincî û serincî ye, feraseta sîteyî ya li ser mîmarîyeke çikwar, di avahîçêkirina berwarî de jî, xanîyên luks yên wîllayî tên tercîhkirin. Di ser nişîngehan re, hîyerarşîyeke çînî li bajêr tê sazkirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Li Amedê, der heqê avahîçêkirinê de, hin rêkxistinên cihgirtî organîze bûne û ev yek dike ku feraseta avahîçêkirinê ya heyî were berdewamkirin. Ji alîyekî din ve, vê feraseta avahîçêkirinê, li ser hîma mûtehîtan cih girtiye û divê li dijî vê yekê, modêlên alternatîf yên li ser pêşînîyên ekolojîk werin hilberandin.

Projeyên pir mezin ku bi xwe re rantên pir mezin çêdikin, bi rola "dîyarkirina bazarê" û teşedarkirina daxwazê radibin û divê li dijî vê yekê pîlanên alternatîf werin hilberandin.

Divê bal pê were dayîn ku daxwaz bi awayekî vebir ne di şertûmercên bazarê de çêdibe, loma jî ji bo ku malbatên ku dahata wan hindik in karibin bibin xwedî mal, argumanên alternatîf werin hilberandin.

1.9. Pirsgirêka Zêdebûna Bêkontrol ya Di Avbikaranînê De

Mijareke din ya giring jî ev e; avahîyên sîteyî yên li ser parselên mezin tên çêkirin, bûne sedem ku bikaranîna avê ya bi awayekî bêkontrol zêde bibe. Li Amedê, pirsgirêkên ku li ser bikaranîna avê ya ne hişmendî çêdibin, her ku çû xuyanîtir bûn. Bi paşkoya ku bi pîlana avadanîyê ve hat kirin, ji bo ku qadên şînkahîyê yên di sîteyan de werin avdan, destûra bîrvedanê hat dayîn û vê yekê jî bi awayekî neyînî bandor li ava binerdê kir.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Mûtehît, pêşînî didin lêçûnan loma jî birêvebirina bikaranîna avê û ranêzikîyên ekolojîk ji derveyî pîlanê tê hêlan û ev hemû jî dibin sedem ku pirsgirêka zêdebikaranîna avê çêbibe.

Serê pêşîn divê der heqê avê de, standardeke sîstematîk ya bikaranînê were danîn.

Ji bo ku bikaranîna avê ya kontrolnekirî û sondajên ku ji bo bîrvedanê tê dayîn, nebin sedem û wekî ku li deşta Konyayê qewimî, hewdik çênebin, divê ava ku wekî "ava gewr" tê binavkirin, were veguherandin û were bikaranîn û ji bo wê jî, divê di pîlana avadanîyê de têbinîyên jibêgavîyê werin danîn.

1.10. Avanîbûna Bi Rengê Sîteyî Çêbûna Karpêdana Jêhatî Berbend Dike

Avahîyên ku li ser parselên mezin û bi rengê sîteyî tên çêkirin, bi awayekî neyekser, karpêdana jêhatî berbend dike. Çêkirina projeyên lêkirina avahîyên mezin, projeksîyon, xebatên pratîk yên li qadê tên kirin û pêkanînên mîmarî, di kontrola ofîsên mîmarîyê yên mezin de tên meşandin. Ev yek dike ku endezyar û mîmar nikaribin ji derveyî ofîsên ketî behsê kar bikin û ji ber vê yekê jî, hêza kar ya jêhatî ji derveyî karpêdanê dimîne.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Gava mekanîzmayên lêkirina avahîyan were likarxistin, divê karpêdana hêza kar ya jêhatî jî wekî parçeyekî vê mekanîzmayê were aşopkirin. Gava di parselên biçûk de û ji bo komên ku dahata wan navincî û jêrincî avahî werin lêkirin û ev yek berbelavtir bibe, wê karpêdana hêza kar ya jêhatî yên wekî gelek mîmar, endezyar û teknîker çêbibe.

1.11. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Têrînekir yên Li Bajêr

Li bajêr, pirsgirêkên binesazîya têrînekir (ava paqij û qirêjî, sîstemên palandinê, sîstemên berhevkirin û jihevkirina gilêşan, kanalên drenajê yên baranê û hwd.) hene. Digel ku di bikaranîna ava bajêr de sîstemên ku pereyekî zêde tê de diçe û

girêdayî pêşînîyên rantê hene, di palandina ava bajêr de jî kêmanîyên giring hene. Ji ber têrînekirina binesazîya bajêr, li bajêr enfeksîyon û pirsgirêkên tenduristîyê çêdibin. Di sîstemên palandinê yên ku di salên 2002, 2003yan de hati çêkirin, tevî ku 20 sal di ser re bihurîye jî, tu razemenîyên hêjayî gotinê nehatiye kirin, kapasîteya wan nehatiye zêdekirin, kollektor nehatine nûkirin û bi vê ve girêdayî jî, di mêjera ava rezerv de, di asteke ku tê xwestin de fîltrekirin nehatiye kirin û loma jî pirsgirêkên ketî behsê her tim li dar in. Wekî din jî, gava barana tavîyî dibare jî, av radibe û lehî çêdibin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Divê pîlanên hemû sîstemên binesazîyê, li gorî pêwîstîya îro û ya siberojê, ji alî şaredarîya pêwendîdar ve, were nûkirin û were bicîanîn.

Divê sîstemên ava paqij û qirêjî, li gorî hewcetîya roja îro were nûkirin.

Gava bikaranîna avê li ser ranêzîkîyên mûtehîtan ku li ser lêçûnê ye, were birêvebirin û ranêzikîyên ekolojîk ji derveyî pîlanan were hêlan, ev yek dibe sedem ku pirsgirêk zêdetir bibin. Serê pêşîn divê bikaranîna avê standardek were danîn.

Divê ava ku wekî ava gewr tê binavkirin, were veguherandin û ji bo ku di avdanê de were bikaranîn, divê têbinîyên jibêgavîyê di pîlana avadanîyê de werin nivîsîn.

Wekî din jî, divê li ser bikaranîna avê ya di qonaxên duyan, sêyan de jî, çareserîyên kesaneyî werin peydekirin. (Her wekî ava ku ji serşokê dimîne di sîfonê de were bikaranîn...)

1.12. Bikaranîna Ava Baranê

Der heqê bikaranîna ava baranê, çêkirina qadên deşarjkirina baranê û sînyalîzasyonê de, ji alî şaredarîya qeyûmê ve tu xebat nehatiye kirin, loma jî, analîzên ku di van demên dawîyê de li ser nimûneyan hatî kirin nîşan didin ku di sîstema palandina bîyolojîk de pirsgirêk hene û tê dîtin ku ava qirêjî bi Çemê Dîcleyê ve tê berdan.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Gengaz e ku pirsgirêkên di mijarên wekî deşarjkirina ava baranê, kanalîzasyon, sînyalîzasyon, palandina bîyolojîk de heyî, di çarçoveya xizmetên şaredarîyê de werin çareserkirin û pîlankirin. Divê li ser peydekirina rêbazên wisa xebat were kirin ku ava baranê wekî deşarj were komkirin û bêyî ku karek li serê were kirin û bi kanalîzasyonê ve were berdan, were paqijkirin. Ji bo vê yekê, divê di sîteyan de û di qadên veavabûnê de, pêkanînên li ser ava baranê di projeyan de werin cîbicîkirin û divê ev yek ji alî şaredarîyan ve jî wekî rêbazekê were qebûlkirin. Di vê mijarê de, bi taybetî, divê rêxistinên pîşeyî, bi xebatên wekî test, tehlîl, analîza qadê û rapornivîsînê, reng û awayên xizmetan dîyar bikin.

Bêyî ku li bendê bin ka ew ê şaredarîya qeyûmî were berdewamkirin an jî neyê berdewamkirin, divê sazîyên civaka sivîl, bi peywirên xwe yên beralîker, di kudandina xizmetan da çalak bin.

Der heqê berdana ava qirêj ya bi Çemê Dîcleyê de, ji bo ku sîstemên binesazîyê yên pêwîst werin danîn û bêyî ku cudahî di nav kesan de were kirin, cezayên pêwîst li wan were birîn, divê mekanîzmayên hewce werin sazkirin.

Der heqê qirêjînekirina Çemê Dîcleyê de, divê hemû pêkhateyên bajêr, bervekirî bin ji bo hemû kirinên biryardar û pêşîlêgir Ji bo vê dikare "platformeke çem" were avakirin.

1.13. Pirsgirêka Destkarîkirina Li Qadên Şînkayîyê yên Bajêr

Ji ber birêvebirina qeyûmê, biryarên parastina qadên şînkahîyê û bikaranîna wan qadan ya ji bo armancên din bûye sedem ku qadên şînkahîyê yên bajêrê hindiktir bibin. Di demên berê de, krîtereke wekî serê her kesekî 10 metrekare qada şînkahîyê/qada gelemperî ya hevpar hatiye danîn û ev pîvan gihîştiye serê her kesekî 11, 12 metrekare qada şînkahîyê û ji armanca xwe jî rabihurtîye, lê belê, bi taybetî, reng û taybetîyên qadên wekî Hewsel, Talaytepe, Girê Mastfiroş hatine guherandin, ew qad ji bo avadanîyê hatine destnîşankirin; her wisa, qaydeya 10 metrekare hatiye binpêkirin û roja îroyîn, serê her kesekî 4 metrekare qada şînkahî dikeve.

Talaytepe ya ku bi tevayî 300 hektar e, ji çarçoveya qada şînkahîyê hatiye derxistin, bi tevayî bi firotanê dewrî TOKİyê hatiye kirin û ji ber ku ji bo Girê Mastifiroş jî, ku 350 hektar e, heman tişt tê pîlankirin, ev yek di vî warî de pirsgirêkên esasî zêdetir dike.

Ji bilî vê, bi tercîha rayderîya navendî, cihên ku statûya wan qada şînkahîyê ye, mizgeft li wan deran hatine lêkirin, dewrî sazûmanên wekî TÜGVA; TÜRGEV hatine kirin û ji hêla din ve jî, qadên şînkahîyê/park bi hengavên kesaneyî jî tên dagirkirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Amed û Newala Dîcleyê, bi awayekî tevdehî, ekosîstema bajêr pêk tînin. Ji ber ku Newala Dîcleyê û Baxçeyên Hewselê, di nava Qada Mîrateya Dinyayê de ne, divê bi awayekî tevdehî werin nirxandin. Di vê çarçoveyê de, divê "Pîlana Birêvebirina Qadê" ji nû ve were kirin, krîter werin danîn û bergirîyên parastina stratejîk werin kirin û divê stratejîyên qadên şînkahîyê yên dîtir jî li gorî vê avanîya tevdehîyê werin dîyarkirin û divê li gorî ekosîstema sirûştî, baldarî li tevdehîya mîmarî û peyzajê were kirin.

Ji bo vê jî, ji bo guherandin û veguherandina rengûawayê qadên şînkahîyê, biryarên ku di asta navendî de hatine girtin û bikeyskirinên cihkî yên di pîlanên avadanîyê de hatine kirin jî werin betalkirin.

"Estetîka bajêr", divê ji têgiheke populer zêdetir bibe navenda pêkanînê.

Divê peyzaj ne tenê wekî dardanînê were famkirin, divê ranêzikîyeke piralî û sîstematîk li vê mijarê were kirin. Divê şaredarî û sazîyên pîşeyî yên eleqedar xebateke hevpar li ser bikin ka gava darên wekî kaj, çinar û hwd., di refûja navîn de werin danîn ev yek wê ji hêla şixulandina avê de çi qas bar û pirsigêrkan çêke.

Ev xebat, divê hin detayên teknîk yên wekî dengûdor, qirêjîya hewayê, xirecira zêde, mehandina karbondîoksîtê jî di xwe de bihewîne.

Wisa xuya dike ku ne tenê di dema qeyûmê de, di dema berî wê de jî, li şaredarîyê der heqê mîmarîya peyzajê de, karpêdan nehatiye kirin. Divê ev kêmanî werin temamkirin û peyzaj êdî nebe kirineke çawalêhato.

Di rewşa niha de, ji bilî projeyên pir mezin, pêkanîneke wisa heye ku projeya peyzajê ne hewce ye. Bêyî ku bal li ser qand û olçeka wê were hêlan, divê di demajoya avakirina qadên şînkahîyê de, projeya peyzajê bibe tiştekî jibêgavî û li şûna çareserîyên cihkî, divê çareserîyên tevdehî werin tercîhkirin.

Fikir li ser wê yekê ye ku gava li hemberî guherandinên heyî û tên kirin, serî li dadgehê were dayîn wê ev yek jî tevkarîyekê li çareserîyan bike. Di vê der heqê de, bi taybetî 2 dozên ku Odeya Pîlankarên Bajêr ya Amedê li dijî Wezareta Hawirdor û Şarevanîyê vekirin û her du jî qazanc kirin, mînakên giring in. Heke di vê mijarê de, hengavên heyî werin destekkirin û xwedîtî li wan were kirin, wê ev yek tevkarîyeke hêja li parastina qadên şînkahîyê bike.

1.14. Pirsgirêka Trafîkê û Parkkirinê

Wekî beşeke veguhastinê, pirsgirêka trafîkê û otoparkê cuda hatiye nirxandin. Wisa tê famkirin, bi taybetî di dema lêkirina avahîyên wekî navenda kirînûfirotinê, nexweşxane, banke û qadên dîtir yên bazirganîyê de, nehatiye hesibandin ka wê barê trafîkê çendî giran be.

Pirsgirêkeke din ya giring jî, pêwîstîya otoparkê ye ku li gorî zêdebûna hejmara amrazan, mezintir dibe. Digel ku hewcetî bi qadên parkkirinê heye jî, ji bo van qadan di asteke teknîk de cih nehatiye hilbijartin û ev yek jî wekî pirsgirêkekê hatiye qebûlkirin. Biryareke din jî ku bûye sedema asêbûna trafîkê ev e; otobusên kesk yên gel ji trafîkê hatine rakirin û di şûna wan de, heqê şixulandina 2 mînîbusan dane kesên xwedîheq. Tenê ev tercîh jî bûye sedem ku ji otobusên kesk 2 caran zêdetir amraz têkevin trafîkê.

Çespandineke din ya giring jî ew e ku di veguhastinê de sîstemeke li ser hîm û mîxwera peyayan nehatiye danîn. Tevî ku xizmetên ku çûnehata kesên berastengan hêsantir dikin, hene jî, pirsgirêk jî hene di vî warî de û digel ku hin xebatên ku han didin meşînê çêbûne jî, têrî bajêr nakin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Li bajêr, ji ber ku qadên otoparkê pêwîstîyan naqedînin, ji ber ku ji bo parkkirina amrazan standardek tune ye, pêşî lê hat girtin ku her wekî İSPARKê ya li Stenbolê, Şaredarîya Bajarê Mezin, di ser sazgehekê re, meseleyê kontrol bike, tevkarî li dahatên şaredarîyê bike û ji hêla "değnekçi"yan ve hin qad neyên dagirkirin. Pêşnîyaz hatiye kirin ku avanîyeke wekî İSPARKê were danîn û çalakkirin ku berê li Amedê dihat pêkanîn lê ji hêla dadgehê ve hat betalkirin.

Divê ji bo hin qadan pêşînîys bikaraanînê were dîyarkirin, divê ji bo parkkirinên bêserûber polîtîkayên cezakirinê werin meşandin, divê destûr neyê dayîn ku rêyên ku qadên herî gelemperî ne werin dagirkirin û meydan jî werin parastin.

Divê li ser baldarîyê be ku hejmara şênîyên Amedê zêdetir dibe û bi awayê vegu-hastinê û bi xwedîtîya amrazên kesaneyî trafîka asê ji hev sist nabe. Di vê çarçoveyê de, divê trafîk bi pêkanînên mirovane were piştgirîkirin, divê han ji bo vegu-hastina komî were dayîn û di dem û saetên dîyar de jî, bi rêbazên ku wê trafîkê bi sînor bikin, qadeke jîyanê ya mirovanetir were aşopkirin.

Divê tora veguhastina nava bajêr, li gorî kesên ku hewcetîya wan ya taybet heye jî were pîlankirin û bi wî awayî were birêkûpêkkirin.

1.15. Saznekirina Sîstemeke Veguhastinê ya Li Ser Hîma Peyayan

Çespandineke din ya giring jî ev e; divê di veguhastinê de, sîstemeke li ser hîm û mîxwera peyayan were danîn. Hin tiştên ku di nava bajêr de bi awayekî pir zêde tên kirin, tenê çareserîyên li ser amrazan li xwe digirin, ji ber rêyên jêr û jorîn, peya nikarin bi rihetî di kolanan re derbas bibin, mirovên berasteng di çûnehatê de zêde ne rihet in û digel wê jî, pêkanînên ku wê birêveçûnê bi mirovan bide hezkirin jî têr nakin.

Ji ber ku bilindahîya pêlikên berborên jor, ne ergonomîk in û ji bo bikaranînê han nadin mirovan, baldarî ji bo mafê peyatîyê yê hevwelatîyên berastengan nayê nîşandan û ji ber ku ji bo berastengan berborên asansorî tunene, di çûnehata peyayan de pirsgirêkên berçav çêdibin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

- Divê li bajêr, pîlanên veguhastinê ne li ser amrazan lê li ser peyayan werin çêkirin û werin bicîanîn.
- Li bajêr, rêyên bihurîna jêrîn û jorîn çûnehata peyayan dijwartir dike û divê dest ji bicîanîna vê yekê were berdan.
- Ji bo ku mirov wekî çand û ferasetekê berborên jorîn bi kar bînin, divê bergirîyên wekî bilindahîya pêlikan werin kirin.
- Divê ji bo kesên berasteng, berborên bi asansor werin çêkirin û ev yek divê di

projeyan de jî wekî standardekê were qebûlkirin.

- Divê perspektîfên wisa werin bipêşxistin ku han bide peyayan da ku bimeşin.
- Divê di bihureke peyayan de, sîstema bi deng were çêkirin da ku dema têrebihurînê bê zanîn û divê sîstemeke hêsanîyê di vî warî de were danîn.

1.16. Hebûna Avahîyên Şemirandî

Yek ji pirsgirêkên giring yên bajêr jî, avahîyên şemirandî ne. Ev avahî, pirî caran, bi awayekî sîstematîk, ji bo gihîştina armancekê, wekî rêyekê, wekî alavekê tên bikaranîn û bi taybetî li Ali Paşayê û li Sûrê, di gelek cihên nişîngehê de, qadên şemirandî, ji bo "valakirin"ê, "dewletîkirin"ê û ji bo "veguherandina bajarîyî", bi awayekî sîstematîk, wekî hincetekê tên bikaranîn.

Qadên ku tên şemirandin, dibin şûngeha kesên tiryakkêş û bikarhênerên hişbiran û pê re jî pirsgirêkên asayîşê çêdibin; tirs û qilqilînên ji bo ewlekarîyê didin der û hincetên wekî "em nikarin ji mala xwe derkevin" dibin sedem ku demajoya daxwaza hilweşandinê dest pê bike.

Li Taxa Ali Paşayê, li taxa Lale Beyê, li taxa Ziya Gökalpê û li taxa Melik Ahmetê ku gava pêşî ya veguherandina bajarîyî ji wir dest pê kiriye, ji bo ku veguherandina avanîyî bi lez û bez be, bi rêya birêvebirina qeyûmî, av û elektrîkên malan hatine birîn, di serî de kanalîzasyon, gelek xizmetên binesazîyê hatine kêmkirin û vê yekê kiriye ku şênîyên van taxan kêmtir bibin û demajoya şemirandina jiberxweve dest pê bike. Her wiha, tirsa dilan hatiye serê mirovan û Şaredarîya Sûrê ku bi qeyûmê tê birevebirin, di roja 16.02.2024an de, îhaleyeke bi navê "Hilweşandina 13 Avahîyên Şemirandî ku Di nav Sînorê Şaredarîya Me De Ne" çêkiriye.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

- Divê veguherandina bajarîyî ku di ser şemirandinê re û bi awayekî *de facto* tê destpêkirin, were redkirin. Divê lihevkirinek were çêkirin ka divê were hilweşandin an na û divê demajoyên veguherandinê jî di ser rehenda şûngeh û mirovan re werin pîlankirin.
- Divê li dijî armanca ku li Sûrê şûngehan diguherîne û bi mebestên bazirganî û rantê nişîngehê bêzanav û bêşexsîyet dike û bîr û hafizeya dîrokî tune dike, veguherandineke wisa were bipêşxistin ku di navenda wê de veguherandina ekolojîk hebe.
- Divê avanîya sosyo-kulturî ya kevneşopî were parastin.
- Divê birêvebirina navendî û şaredarî, dev ji polîtîkayên xwe berdin û êdî van qadan nedin şemirandin û hilneweşînin û ji bo ku qad ji hêla fizîkî û sosyo-kulturî ve bikeve rewşeke çêtir, divê bi demajoyên beşdar, proje werin çêkirin.

1.17. Herifandinên Li Çemê Dîcleyê û Li Newala Wê

Mijareke din jî ya ku di civîna koma navendî de gengeşî li serê hat kirin, herifandinên li Çemê Dîcleyê û li newala wê ye. Her wisa, ji ber ku li Sûrê koçberî zêde bûye, mirov nemane ku li Hewselê bixebitin û ji ber vê yekê jî, çanda baxçevanî û bostanvanî ji navê radibe û çandinîya endustrîyel dest pê dike û wekî encama jiberxweve ya van tercîhan, gilgil, pembû an jî berên endustrîyê yên wekî wan tên çandin û loma jî, hêdî hêdî hilberîneke mono-kulturî dest pê dike.

Herifandina herî mezin ya ku wê mono-çandinî li baxçeyên Hewselê çêke ev e; wê cins û curên endemîk roj bi roj kêmtir bibin û tune bibin, wê bikaranîna maddeyên kîmyasal, bikaranîna zêde ya avê, kêmbûna pircureyîya riwêkan û mono-çandinî bibin sedem ku her cure zirar li herêmê aktîf bibe. Yek ji talûkeyan ku wê bi mono-çandinîyê li Sûrê çêbibe ev e; wê heyînên ava şîrîn ku li vê herêmê dijîn û ji % 25ê cureyên li Tirkîyeyê pêk tînin, ji navê winda bibin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Divê çareserkirina pirsgirêkên li ser meseleya Çemê Dîcleyê, ji bo bajêr û dînamîkên wî bibe pirsgirêka herî sereke. Heke hewldan hebin ji bo çareserkirina pirsgirêkên der heqê Çemê Dîcleyê de, meseleya sereke ku divê bal pê dayîn ev e; divê ji kan û jêderka wê ve, statuya çembûnê bo Çemê Dîcleyê bê dayîn. Çi gava li ser çem statuyeke qanûnî were danîni wê hingê wê mijarên wekî ocaxên xîzê, dagirkirinên li derdora çem, sîstematîka benda 100 metreyî jî di çarçoveyên xwe de çareser bibin.

Pirsgirêkên wekî avkêşana ji çem, bikaranîna xîzên çem, qirêjkirina ava çem ku pirsgirêkên rojane yên Çemê Dîcleyê ne, ji bo çareserîyê divê sîstematîkek were danîn. Wekî din jî, ji bo ku çivîk, masî, kêzik, kurmik, xişoke jî tê de, 635 curên gîyanewer karibin bijîn, xwedîstatubûna Çemê Dîcleyê pêşmerceke jîyanî ye.

Ji bo ku herifandina di Çemê Dîcleyê de bi dawî bibe, divê bi tevî Pira Dehderî, destûr ji bo çêkirina avahîyên wekî kafe, restoran, baxçê milet neyê dayîn.

1.18. Pirsgirêka Pîlansazîya Ji Bo Bobelatên Wekî Erdhej û hwd.

Bi erdhejê re derket rastê ku pîlaneke bobelatê ya bajêr heye ku pir zêde jî bi kêr nayê. Amed, 400 km dûrî navenda erdhejê bû û loma jî xerabûneke zêde çênebû û digel wê jî pîlana heyî bi kêr nehat û ev yek nîşan dide ku hem ji hêla mewzûatê ve hem jî ji hêla cîbicîanînê ve, gelemşe çêdibin.

Di erdhejên ku di 6ê Sibata sala 2023yan de çêbûn, li navenda Amedê 6 avahî hilweşîyan û 411 hevwelatîyên me mirin. Hatiye çespandin ku avahîyên hilweşîyane, yek ji wan jî destûra wan ya lêbicîbûnê tune ye, di 2 avahîy**ê**n hilweşîyayî de jî, tewqên bêdestûr hatine çêkirin.

Li gorî xebata ku Odeya Endezyarên Înşaatê ya Şaxa Amedê ya TMMOBê kiriye; li navenda bajêr, xebata ji bo hilweşandina avahîyên ku xisarên giran di wan de çê-

bûne, dest pê kiriye û di wan avahîyan de ku xisarên mezin çêbûne û divê gavek berî gavekê werin hilweşandin, 22.670 mal hene. Digel vê yekê jî, li Amedê, îhaleya 5.156 malan ji hêla TOKİyê ve hatiye kirin û hê lêkirina tu malekê temam nebûye û tu malek jî nehatiye teslîmkirin.

Avahîyên ku tên hilweşandin, li gorî Qanûnnameya Hilweşandina Avahîyan ku ji hêla Wezareta Hawirdor û Şarevanîyê ve hatiye amadekirin, nayên hilweşandin; divê avahî ji tewqa herî jor ve werin hilweşandin lê belê ji tewqa zemînê ve û bi rêbaza rûxandinê tên hilweşandin. Ji ber ku av jî lê nehatiye reşandin, di hilweşandinê de, toz û xûbar rabûye û hevwelatî ev hewaya qirêj hilmijandiye. Ji ber ku di avahîyên hilweşandî de hûrgerîya asbestê nehatiye kirin, nayê zanîn ka rêjeya asbestê çi qas e û hevwelatî bi rîska kansêra pişikê re rû bi rû tê hêlan.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Piştî erdhejê, li şaredarîyê, xebatên avanîya nû dest pê kirine û di rewşa heyî de, bi navê Serokatîya Daîreya Bobelatan yekîneyeke koordînasyonê hatiye sazkirin. Lê belê, di vê demê de bi koordînasyon û piştevanîya ku hate kirin aşkere bû ka civaka sivîl çendî giring e. Divê avakirina komeke lêgerîn û filitandinê ku çi gava hewce bû karibe li kar bikeve, wekî pêwîstîyekê were qebûlkirin û xebata di vî warî de ne tenê di rojeva şaredarîyê de be. Ne tenê birêvebirinên cihkî, divê Wîlayet, birêvebirina navendî, civaka sivîl û gel tev li birêvebirina bobelatê bibin û koordînasyonek di vî warî de were çêkirin. Divê birêvebirina bobelatê, heta tu bêjî bes bi dormandorî û bi tevlêbûneke pirhêlî ku hemû alî tê de cî digirin, were pîlankirin û cîbicîanîn.

- Xebatên ji bo amadehîya bobelatan, dem û çavkanî divên jê re. Loma jî, divê qanûnên wisa werin çêkirin ku ne birêvebirên herêmî ne jî yên navendî karibin sist bikin û li gorî xwe bi cî bînin, divê çavkanî rast û di cih de werin bikaranîn û kirinên berevajîya wan qanûnan werin cezakirin.
- Divê hejmara avahîyên bi rîsk yên li bajêr were dîyarkirin, divê envantereke avahîyan were çêkirin û bi dora zêdebûna rîskê hemû avahî ji hêla ewlekarîya erdhejê ve werin destnîşankirin.
- Der heqê qewînkirin, veguherandina bajarîyî, projeyên avahîyên sosyalî, veguherandina di cihê xwe de, divê bi odeyên pîşeyî û zanîngehan re hevkarî were kirin, divê dîtinên pisporan werin zanîn, feydeya giştî were parastin û dev ji ferasetên rantî were berdan. Di van pêkanînên hemûyan de, bipêşketina sosyalî, aborîya û şûngehî bi awayekî tevdehî were nirxandin.
- Gava pergala avadanîyê li ser rantê be û di avahîlêkirinê de qayde tunebin û ceza neyê dayîn, ev yek dike ku avahîyên bêdestûr çêbibin û wekî encama wê jî, efûya avadanîyê dibe tiştekî "bivênevê." Gava çav ji bo avahîlêkirina alîyên 'bihêz' yên komên sermayeyê tê girtin û bi awayekî berevajî, birêkûpêkkirinên taybet tên hiqûqîkirin, ev yek ji bo hemû civakê dibe mînakeke xerab. Divê efûyên avadanîyê car din dubare nebin.

JI BO JINAN, CIWANAN Û ZAROKAN BAJAREKÎ ÇAWA

Moderator: Meral Özdemir û Dilan Kaya Taşdelen

2. PIRSGIRÊK Û ÇARESERÎ

2.1. Girtina Torên Piştevanîyê yên ku Jîyana Civakî Destek Dikin

Bi taybetî di dema şaredarîya berîya qeyûmê de, bidawîkirina torên piştevanîyê, ji alî gelek beşdaran ve wekî yek ji pirsgirêkên sereke hat gotin. Sazîyên ji bo zarok û ciwanan, Malên Piştgirîyê yên Zarokan, Malên Piştgirîyê yên Perwerdehîyê, stargeha jinan, sazîyên jinan û meclîsên zarokan, hatin girtin û entegrasyona civaka sosyal, bi gelemperî li feksê hat xistin.

Bi girtina van pêkhateyan, heqê perwerdehî, tevlêbûna li jîyana bajêr ya zarok û ciwanan û azadîya wan ya derbiranê, bi rêjeyeke pir zêde hatiye bisînorkirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Divê di dema pêş me de, sazîyên nûnerîyê yên sala 2015an û berîya wê, careke din jî werin avakirin û heqê tevlêbûnê ji bo zarok, ciwan û jinan ji nû ve werin danîn. Gelek giring e ku bi rêya van mekanîzmayan, pirsgirêkên mirovên ku li Sûrê, li Yenîşehîrê, li Kayapinarê, li Baxlarê dijîn, ji destê yekem, ji devê yekem were destnîşankirin û çareserîyên wan jî li ser vê hîmê werin peydekirin. Piştî ku mekanîzmayên birêvebirinê hatin avakirin, divê çarçoveyek were danîn ka mirov dikare vî bajarî bi jinan, bi ciwanan û bi zarokan û tev bi hev re çawa dikare bi rê ve bibe.

Bi tevî hemû hengavên berbendkirin û bêpiştevanhêlanê, di ser sazîyên wekî "Zimzim Qreş" re avanîyên nû hatine sazkirin û ev yek giring û hêvîbexş e.

Beşdarên vê civînê got, berîya sala 2012an, ji bo zarokan menzelên lîstikê hatin çêkirin û ev yek li ba dêûbavan bi rengê çareserî û hayjêbûnê da der û wan ev rewş bi vî awayî derbirand:

"Berîya sala 2012an, menzelên lîstikê yên şaredarîyan hebûn. Zarok û dêûbav dihatin van menzelên lîstikê, malbat û jinan pirsgirêkên xwe digot û parve dikir.

Paşê, qrêşa Baxçê Zarokan û Zarokistan vebûn. Bi taybetî ji bo zarokên dêûbavên

ku dixebitîn, qadên ewle hatin çêkirin. Civateke wisa ji bo zarokan hat avakirin ku dikaribûn bi çavdêrîya pisporan bi hevsalên xwe re bên ba hev û lîstikan bilîzin.

Wekî din jî, li taxan, di Navendên Jîyanê yên Jinan de, jinan dikaribû cilên xwe bi belaşî bişûştana û gava wan ev kar dikir, zarokên wan jî di qadên lîstikê yên li navendê de dilîst. Jinan di vê qadê de xwe rihet hîs dikir, ji ber ewledarîya wê derê dikaribû pirsgirêkên xwe bi kesan re parve bikirana.

Piştî avêtina qeyûmê, ev sazî wekî pirsgirêk hatin famkirin. Loma jî, pêwendîya di navbera kesan û jinan de hat birîn, mirov li hev neban bûn û wan nedizanî ka ew ê pirsgirêkên xwe ji kê re bêjin û li ku derê li çareserîyê bigerin."

Her wekî di vê mînakê de tê dîtin, divê qet bal li ser hebûn an jî nebûna qeyûman neyê birin û ji bo ku ev avanîyên ku jîyana civakî biserûber dikin, piştevanîyê saz dikin, li gorî hewcetîya kesan qadên pêwîst çêdikin û derfetên hevpêwendîyê peyde dikin, careke din jî werin avakirin, rê û rêbaz werin bipêşxistin.

Der heqê sazkirina mekanîzmayên di qada civakî de, ranêzikîyeke din ya giring ku ji bo çareserîyê ye, ji alî nûnerê Navenda Mafên Zarokan ya Baroya Amedê ve hat gotin.

Xuya ye ku, tora Xebatên Zarokan ku digel STÖyên (RCS) din yên bajêr hat avakirin û ji alî Baroya Amedê ve li ser zarokan xebatan dimeşîne, hengaveke sivîl e ku kargînên giring li ser milê xwe kiriye. Armanca sereke ya hengavê ew e ku dayne rastê ka "bajarekî zarokan" ya çawa tê xwestin... Di xebatên ku di sala 2018an de dest pê kir, hûrnêrîna pîlanên stratejîk yên şaredarîyan û raporên çalakîyên wan û çespandina xebatên ku wê di warê zarokan de werin kirin, wekî armanc hatin danîn; lê belê, ji ber ku şaredarîyan xebatên xwe û raporên xwe yên çalakîyan parve nekirin, loma jî daneyên ku wê ji bo xebatan bibûna palder, kêm man. Tê famkirin; daneyên ku berê şaredarîyan di sîteyên xwe yên di internetê de parve dikirin, ji ber ku di dema qeyûmê de hişmendî li ser birêvebirîya navendî ye, nehat parvekirin.

Tevî ku birêvebirîya cihkî ku bûye navendî, agahîyên ku divê ji bo gel aşkere be, bi baroyê re parve nekirin, dîsa jî, Baro ji bo zarokan belgeyeke stratejîyê weşand û divê ev yek wekî hengavek**ê were qebûlkirin** ku dikare ji bo çareserîyê bibe palderek.

Gava qadên nişîngehê tên avakirin, giring e ku li gorî taybetîyên zarokan yên fizîkî û têgihanî were sêwirandin û qadên taybet yên ku wê zarok û ciwanan bikaribin jîyana xwe ya sosyal bi awayekî xweş bibihurînin, werin avakirin...

2.2. Alûdetîya Tiryakan ya Berbelav Dibe

Li bajêr, alûdetîya tiryakan ku bi taybetî di nava ciwanan, tew di nava zarokên berbalix de berbelav dibe, wekî pirsgirêkeke bêhenek hatiye qebûlkirin ku ne tenê ji bo roja îroyîn e, siberoja bajêr jî îpotek dike.

Li Amedê, bikaranîna tiryakê êdî di nav zarokên dibistana pêşîn de jî berbelav e û

gava pirsgirêkên aborîyê jî tev li vê pirsgirêkê dibe, ev yek dibe sedema jihevşikestineke mezin.

Beşdarek ku li ser zarok û ciwanan xebatê dike, got; ji, salên 90î û bi vir ve ye koçberî bo vî bajarî çêdibe, Sûr ew cî ye ku herî zêde koçber lê bi cî dibin û piştî demajoya pevçûna li Sûrê, şênîyên ku ji Sûrê belavî tax û texmên dîtir bûn, ne homojen in û gelek koçber jî tê de hene.

Koçberîya ku ber bi Amedê ve çêdibe, zêdetir ji bajarên wekî Bîngol, Mêrdîn, Şirnex û Colemêrgê ne ku li wan deran şer û pevçûn zêdetir in û hema bêje tevahîya koçberan, pîşeyeke wan tune ye, ne xwende ne, di warê çand, huner û hilberînê de tu tiştekî tev li bajêr nakin. Digel ku ji bajarên dorhêlê koçberî bo Amedê çêdibe jî, ji Amedê jî rêgehek çêbûye ber bi bajarên mezintir û ber bi derveyî welêt û ev yek jî bûye sedem ku avanîya homojen ya li bajêr biguhere avanîyeke tevlihev û bajar jî bibe cîyekî ku lê hêlên koçberîyê tê dîyarkirin. Bi bandora pirsgirêkên wekî pevçûn, koçberî, cihşihitîkirina bi kotekî û hwd., di nava şênîyên ku piranîya wan ji ciwanên xizan, betal û tu jêhatîbûneke wan tune pêk tê û salên wan di navbera 15-2an de ye, rêjeya bikaranîna tiryakan bilind e.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Gava li ser bikaranîna tiryakê xebat ji bo çareserîyê hate kirin pêwîst e hemû alî têkevin nav wê xebatê. Bi taybetî, beşdarekî pispor, bal pê da û got; berîya entegrasyon/rehabilitasyonên ku wê ji bo ku bikarhêner ji nû ve tev li civakê bibin, were kirin, bi ranêzikîyeke ku wê pêşî li bikaranîna tiryakê bigire, divê bikarhênerên nû û yên potansîyel ji van qadan werin dûrxistin **û** ji bo vê yekê jî pêwîst e malbat werin teşwîqkirin.

Tê qebûlkirin ku kêşana cixareyê yek ji wan faktoran e ku ji bo bikaranîna tiryakê han dide û pêşnîyaz tê kirin ku li malê û li cihên ku zarok lê ne cixare neyê kişandin. Pêşnîyazeke din jî dibêje, divê bi hişmendîya seferberîya tevdeyî, hişmendîya bajarekî "li dijî tiryakê" were avakirin, di asta pisporîyê de destek were girtin, polîtîka werin hilberandin û werin bicîanîn.

Wekî pêşnîyaza çareserîyeke din jî hatiye gotin; sazîya Hevrayê ku li ser tiryakkêşî û bikaranîna hişbiran li qadê dixebitî, piştî qeyûmê hat betalkirin û divê ji nû ve were çalakkirin.

Ji bilî van:

- Divê şaredarî di qadên kontrolkirinê de tevdîrên pêşîlêgir bigire.
- Divê were qedexekirin û bûfe û dikandarên li ber dibistanan "hebek cixare" nefiroşin.
- Divê cezayên bikaranîna tiryakê zêde bin ku karibe ji niyet û daxwaza kêşanê vegerîne.
- Divê kesên alûde misêwa nekevin girtîgehê û dernekevin.

Piranîya alûdeyên ku ji girtîgehê derdikevin, car din dest bi bikaranîna hişbiran dikin û ev yek jî dike ku fînansmana tiryakfiroşî û hişbiran çêbibe. Bi wateya cihkî, ji bo ku ev lêçûn were dabînkirin, kesên ketî behsê, li ber dibistanan di tûrikê de, tiryakê difiroşin.

Ji bo ku ev çerx were sekinandin, wîlayeti şaredarî, STÖ (RCS) û pêkhateyên bajêr bi hev re xebatê bikin.

Amed, ji hêla bikaranîna tiryak û hişbiran ve, li Tirkîyeyê di dora 12-13an de ye û ev yek ji bo zarok û ciwanan talûkeyeke mezin e.

Beşdar, li ser çavdêrî û serîlêdanên ku di qadê de çêbûne, gotin; bi taybetî li Sûrê, di nava zarokên/ciwanên ku ji ber şer û pevçûnan ji Cizîr**ê** û ji Silopyayê koç kirine, rêjeya bikaranîna hişbir û tiryakê zêdetir bûye.

Hat destnîşankirin ku di navbera wan zarokan de ku mala wan, bajaroka wan an jî herêma wan rûxîyaye, hişbir û tiryak berbelavtir tê bikaranîn.

Wekî din jî, leşkerên ku li herêmê ne jî, bi taybetî ji ber bikaranîna hişbiran, dibin sedema suîstîmalkirina zarokan, lê belê ev rewş têrî xwe nehatiye qeydkirin.

2.3. Tiryak û Teşedayîna Sîyasî

Gelo ji bo Amedê, mezinahîya pirsgirêka hişbirê çi ye? Ger em hemû alûdeyên li Tirkîyeyê bi yên Amedê re bidin ber hev, em ê daneyeke çawa bi dest bixin? Gelo hêsanbûna bidestxistina tiryakê, berbelabûna bikaranîna wê, tercîheke sîyasî û sîstematîk e? Gelo gengaz e ku mirov kesên ku hişbir û tiryak bi kar tînin, tespît bike? Gelo profîla bikarhêneran çawa ye? Û hwd.

Di civîna koma navendî de, li dor û mîxwera pirsên li jor dîtin hatine derbirîn û li ser pêşnîyaz û çareserîyan hin tespît hatine kirin. Li Amedê, berîya qeyûmê, avanîyên ku ji bo zarok, ciwan û jinan hatine avakirin, di dema qeyûmê de betal hatine hiştin û vê yekê kiriye ku bi taybetî di nav ciwanan de, avarêbûn zêdetir bibe.

Konservatuarên Bajêr yên Aram Tîgran û Cegerxwîn ku berê ji alî birêvebirinên cihkî ve bi awayekî aktîf dihatin piştgirîkirin, malên piştgirîya bo perwerdehîyê, çalakîyên sportîf (avakirina binesazîya çalakîyên sportîf ku wekî Amed Spor tê zanîn), Komeleya Sarmaşık ku di ser sazîyan re komên bi dezawantaj yên li bajêr tespît dikirin û çalakîyên alîkarîyê yên wekî dayîna xurekan bo wan dihat kirin, Zarokistanên ku tenê ji bo zarokan dihatin vekirin, li taxan navendên xwedîtîkirina li zarokan û qadên lîstikê dihatin vekirin, sazîyên jinan û meclîsên zarokan dihatin vekirin; di dema qeyûmê de, ev hengav hemû hatin berbendkirin an jî ji derveyî birêvebirinên cihkî hatin hêlan û li gorî TÜİKê, li bajêr ku 859 hezar kesên di binê 24 salîyê de nîvê şênîyê pêk tînin, ji destek û piştgirîyan bêpar mane. Her wekî di civînê de jî hatiye gotin; hin mexdûrbûn hene ku bi polîtîkayên hişê sîyasî çêbûne: tercîhên wekî kum datînin ser serê zarokên 12, 13 salî û li kuçeyên bajêr didin meşandin...

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Bi taybetî di warê tiryakê de, divê mezinahîya çarçoveyê were dîyarkirin û paralelî vê yekê stratejîyên çareserîyê werin dîyarkirin. Di rewşa heyî de, di meseleya tiryakê de, di navbera rewşa qeydkirî û rewşa fîîlî de cudahîyên mezin hene. Gava kesek serî li sazîyeke tenduristîyê bide û teşxîsa alûdebûnê li serê were kirin, li şûna ku demajoyeke tibî dest pê bike, demajoyeke dadî dest pê dike. Heke teşxîs û şikek di vî warî de hebe, ji bo ku were qeydkirin, divê testên cuda werin çêkirin û gelek belge û girtename werin tijekirin. Di vê rewşa zêdebûna nexweşan ya li nexweşxane û sazîyên tenduristîyê de, ne gengaz e ji bo nexweşekî demeke ev qas zêde were terxankirin. Wekî din jî, nexweş bi xwe jî, ji bo ku aşkere nebe û neyê zanîn, naxwaze tev li van demajoyan bibe.

Bi mebesta tespîtkirinê, divê prosedur werin kêmtirkirin an jî rêbazên nû werin bicîanîn da ku di demeke kurt de encamên pratîk werin girtin.

Wekî rêbazeke din jî, gengaz e ku ji kanalîzasyonê mînak werin girtin (analîza avtêzê) û werin analîzkirin û pê re jî der heqê mezinahîya pirsgirêkê de agahî werin komkirin. Bi agahîyên hatî komkirin, dikare nexşeya tiryakê ya bajêr were çêkirin, bi vî awayî dikare li gorî texman zêdebûna bikaranîna tiryakê were pîvandin û dikare ji bo texmên ku bikaranîn lê zêde ne, çareserîyên radîkal werin bicîanîn.

Li gorî nirxandinên hatî kirin, tê famkirin ku bi taybetî cihên wekî avahîyên şemirandî, ji bo bikaranîna tiryakê, tên tercîhkirin. Lê belê, di civîna Navend 1ê de, hatibû gotin ku avahîyên şemirandî; ji bo mebestên din tên bikaranîn, ji bo ku avahîyên tescîlkirî û qeydkirî werin hilweşandin wekî alav tên bikaranîn û bi awayekî *de facto* ji bo veguherandina avahîyan tên bikaranîn, ji ber ku avahîyên şemirandî yên dagirkirî pirsgirêkên ewlehîyê çêdikin, ev yek di wê texmê de dibe sedema bertekan û ji ber vê rewşê jî bi awayekî ji ber xwe ve daxwaza veguherandinê tê kirin.

Hewldana ku tê dayîn da ku di ser meseleya tiryakê re encamên sîyasî werin bidestxistin jî wekî pirsgirêkekê hatiye derbirîn. Wekî di mînaka zarokên 12-13 salî de ku kum li ser serê wan e û li kuçeyan tên gerandin, 2 tercîh datînin ber zarokên ku diçin dibistana pêşî. An ew ê bi avanîya teşedarkirina sîyasî ya desthilatê re li hev bikin û li derveyî tiryakê û çilvirînên wekî wê bimînin an jî ew ê radestî çilvirînên çandî bibin...

Her wekî ev bûyer jî nîşan dide, rewşeke neçarîyê heye ku ji bo ku hilbijartinên krîtîk bikin zext li dayikan tê kirin. Gava zarokê xwe radestî avanîyên wekî medrese, terîq, qursa Quranê bike, wî ji talûkeya tiryakê diparêze. Lê belê, di heman demê de qebûl dike ku zarokê wê di demajoya teşedarkirina sîyasî de, ji alî çandî û zanavî ve jî were asîmîlekirin. Digel van hemû hûrgilîyan, divê meseleya alûdebûnê bi awayekî tevdeyî were nirxandin; naskirina zaroka ya madeyên hişbir, xwegihandina wan ya hişbirê û wekî encama van yekan jî sûckirina wan, divê ev hemû digel hev werin nirxandin...

2.4. Çavpêxistina Jinûve ya Pîlansazîyên Bajêr û Şûngehan

Di nirxandina têbinîyên civînê de, hatiye famkirin ku li Amedê, pirsgirêkên der heqê kesên berasteng de, hem ji nirxa navînî yên Tirkîyeyê wêdetir e, hem jî ji ber sosyolojîya bajêr, berbend jî hatine polînkirin. Têgiha berastengî: ji bilî berastengîya laşî, bihîstinî û dîtinî, bi taybetî ji bo zarokan, her wekî di mînaka SSPEyê de jî wisa ye, pirsgirêkên ji ber nexweşînê û pirsgirêkên ku di xwegihandina ziman û çandê de çêdibin jî wekî asteng hatine pênasekirin.

Di xebatekê de ku ji alî Wezareta Tenduristîyê ve hatiye kirin û bajar ji alî berastengîyê ve bi 5 kategorîyan hatine polînkirin, Amed, di navbera ji %7,86-%9,10an de û di nava bajarên kategorîya 3yan de cî digire. Di dawîya sala 2023yan de, hejmara şênîyên Amedê 1 milyon û 818 hezar e û li gorî vê polînkirinê, ji %8ê şênîyan berasteng in. Gava em vê li gorî hejmara şênîyan dihesibînin, em dizanin ku ji 140 hezarî zêdetir kesên berasteng hene. Ji bilî vê, Federasyona Pêkhateyên Ne-Berastengan, ku di civîna koma navendî de hatin nimandin, anî rojevê ku nexweşîna SSPEyê ku ji ber vîrûsa sorikê çêdibe û di zarokan de tê dîtin, nêrîn û xweytîkirina van nexweşan jî pirsgirêkek e.

Rêjeya kesên ku herî kêm ji beşekî laşê xwe berasteng in (şênîyê ku ji 3 salî û zêdetir e) (%)



Şekil 1.2.3 En az bir engeli olan nüfusun oranı (3 ve daha yukarı yaş) (%)

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Ji bo ku bajarekî were afirandin ku dostê jinan, zarokan, ciwanan û kesên ku hewceyî nêrîn û xweytîkirinên taybet e, serê pêşîn, divê pîlanên şûngehan û bajêr di ber çavan re werin derbaskirin. Divê sêwirandina şûngehan, honakkirina wan,

entegrasyona hemû beşên li bajêr, wekî polîtîkayeke makro were honakkirin.

Ji bo ku ji sêwirandina şûngehan re bibe mînak, pêşnîyazên ku di civînê de hatin kirin; divê tabelayên di muzeyan de bi qasî ku zarok karibin bibînin, bilind bin; divê mînakên 3 rehendî yên qadên civakî yên wekî sînema, şano, muze, fêrgeh, nexweşxane, stasyon û hwd., werin çêkirin û astengîyên li pêşîya xwegihandin û beşdarîlêkirinê de heyî werin rakirin û divê ji vê hêlê ve modêl werin çêkirin.

Beşdarek got, li gorî statîstîkên TÜİKê, li Amedê, 36 hezar û 634 kesên berasteng hene. Rêjeya berastengên li Tirkîyeyê wekî ji %6,9 hatibû daxuyandin. Di nav kategorîya Wezareta Tenduristîyê ku ji 5 koman pêk tê, Amed, di koma 3. (sêyem) de, yanê li cîhekî nêzî navînê ye. Di vê rewşê de, hejmara 36 hezar û 634, gava li şênîya 1 milyon û 800 hezarî tê rêjekirin, tê dîtin ku di navbera ji %2 û ji %2,5an de ye.

Dibe ku hejmarên hatî gotin, bajaraok ji derve hatibin hêlan û wisa hatibin hesibandin an jî dibe ku ne daneyên rojane bin. Loma jî, gava stratejîyên çareserîyê tên çêkirin, ger hejmara kesên berasteng di navbera 140 hezar û 150 hezarî de were ferzkirin û projeksîyon li gorî wê were çêkirin, hingê wê encamên kartêkertir werin bidestxistin.

Her wisa, li gorî daneyên Wezareta Tenduristîyê, nêzikî ji 10 kesên berasteng 1 jê, li malê, piştgirîya tenduristîyê lê tê kirin. Ev hejmar, hê jî li Tirkîyeyê 600 hezar e û li bajarên herêmê, ji %1ê hemû şênîyan e.

Hejmara berastengên ku di çarçoveya qanûna bi hejmara 2022yan mehane digirin û ji alîkarîya xweytîlêkirina li malê havildar dibin



Gava heman projeksîyon ji bo Amedê jî tê çêkirin, ji 10 kesên berasteng 1 jê, yanê nêzikî 14 hezar, 15 hezar kesên berasteng, ji alîkarîya tenduristîyê ya li malê havildar dibe. Ger ji alî birêvebirinên cihkî û ji alî STÖ (RCS) ve, li ser van malan û di qadê de, xebat werin kirin, wê ji alî tespîtkirina mezinbûna pirsgirêkê ve, ev xebat giring bin.

2.5. Sazîyên Jinan yên Di Dema Qeyûmê De Hatin Girtin û Ji Kar Hatin Xistin

Ji alî beşdaran ve hatiye gotin, li bajêr, meyla li ser tundûtûjîyê, bi taybetî jî tundûtûjîya li ser jinan zêdetir bûye û ev yek pirsgirêkeke giring e. Li gorî demên berê, sazîyên ji bo serîlêdan û starbûna jinên ku tûşî tundûtûjîya mêran tên, ne zêde ne, loma jî, jîyana wan jinan ne di ewlehîyê de ye û hebûna sazîyên wisa ji bo wan jinan pir giring e. Di dema qeyûmê de, navendên jinan û stargeha bo jinan hatin girtin an jî ji çalakbûnê hatin xistin, vê yekê kir ku pirsgirêka tundûtûjîya li hember jinan mezintir bibe.

Ne tenê tundûtûjîya fizîkî, rewşên wekî xizanîya zêde û pesta ku ji ber vê yekê çêdibe, tundûtûjîya psîkolojîk, hatina heremoyîkirinê jî, bi taybetî dibin ew sedem ku jîyana jinan dijwartir bibe. Ji ber ku şaredarîya qeyûmî, sazîyên ku di serdema berê de ji bo xurtkirina jinan hatibûn vekirin, girtin, vê yekê kir ku jin hê bêtir bêpejan bimînin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Beşdarekî got, yek ji pirsgirêkên sereke, helwest û ranêzikîyên têgihanî yên li hemberî jinan e û di dema qeyûmê de stargehên jinan hatine girtin û hebûna wan ji bo jinan pir giring e. Bi awayekî kevneşopî û bi awayekî *de facto*, qadên sîyasetê, aborîyê, civakî ji jinan re tên berbendkirin, bi vî awayî jî jin li derveyî qada civakî tên hêlan û di nav çar dîwaran de tên hepskirin û tê xwestin ku xizmetî mêran û zarokan bike.

Gava ev ranêzikîya kevneşopperest ji tundûtûjîyê piştê digire, pêwîstîyên jinan yên wekî starbûn û xwelêgirtinê, dibin pirsgirêkên ku bi lezgînî werin çareserkirin. Tevî ku ji alî jinan ve tundûtûjî pirsgirêkeke giring e jî, xizanî û bêparbûn jî hêmanên dîtir yên pestlêkirinê ne ku bi xurtî bandor li jinan dikin. Hat gotin, di demên berê de, di warê tevlêbûna jinan ya li bajêr, xweaşkerekirina wan de, şaredarî pir serketî bûne.

Li Şaredarîya Bajarê Mezin ya Amedê, Serokatîya Daîreya Jinan hat avakirin, di şaredarîyên bajarokan de jî gerînendetîya jinan û ya herî giring jî, bûtçe li ser hîma zayenda civakî hatin çêkirin û van yekan kir ku jin xurttir bibin û qada pirsgirêka jinan û pêwîstiya wan bi beşdarîlêkirinê hatin çareserkirin.

Hat got, çêkirina bûtçeyê pir giring e ji ber ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan, avakirina stargehan û berî stargehan dabînkirina ewlehîya wan, bûtçe tiştekî bivênevê ye. Beşdaran got, birêvebirinên cihkî dikarin têrî xwe bûtçeyê terxan

bikin, lê belê, qeyûm hatin nehatin, serê pêşîn hemû beş û sazîyên li ser jinan girtin. Tundûtûjîya mêran ya li hemberî jinan hê jî bi xurtî didome, loma jî, gava mekanîzmayên serîlêdanê tên girtin û ji kar tên xistin, ev yek dike ku jina ku tundûtûjî lê hatiye kirin, bêparastin bimîne. Divê mekanîzmayên berê yên ketî behsê, bi xurtî û bi awayekî ku karibin xebatên xwe bikin, ji nû ve werin avakirin...

Sedema tundûtûjîya li hemberî jinan, ew mêr in ku xweyî feraseteke civaka kevneşopîyê ne. Loma jî, ji bo ku hişmendîya ji bo zayenda civakî pêjnkar were avakirin, divê jin û mêr dest bidin hev û xebata veguherîna hişmendîyê bikin, divê ev veguherîn bi perwerdehîyê were destekkirin...

Divê di qada gelemperî de, ji bo ku jin û zarok karibin bi kar bînin, butonên ewlekarîyê hebin... Gava şaredarî karibin wan cihên ku jin di dema talûkeyê de serî lê bidin, kontrol bikin û karibin di bicîanînê de çalak bin, hingê wê ji bo bajarekî ku jîyan lê rihet û dadwer e, gavên giringtir tên avêtin. Her wekî di dema berî qeyûmê de jî wisa bû, divê bûtçeyên ku jin û zarokan jî berçav dike, werin çêkirin.

Li bajêr, jin henin ku ji ber ku xizan in, ji ber ku mêrê wan tiryakkêş in, diçin karên rojane dikin, karên paqijîya malan dikin û hewlê didin ku malbata xwe heyirî nehêlin. Di civînê de, Taxa BenûSenê wekî mînak hat gotin. Li vê taxê, jinên ku rojane diçin karên nav malan dikin, ji ber destkurtîyê nikarin heqê otobus û mînîbusên nav bajêr jî bidin û ev yek dibe sedem ku tundûtûjî ji nû ve were kirin. Xizanî herî zêde bandorê li ser jinan dike. Jina ku ji alî aborîyê ve bi destê mêr ve ye, tûşî tundûtûjîyê tê.

Giring e ku hem di ser birêvebirinên cihkî hem jî di ser dînamîkên bajêr e, qadên karpêdanê bo jinan were avakirin.

Di vê serdemê de ku di 31ê Adara 2024an de wê hilbijartin çêbibin, di serî de tundûtûjîya li dijî jinan, ji bo ku pirsgirêkên jinan, ji alî berendamên jin yên şaredarîyan ve, wekî helwestekê were qebûlkirin, divê komeke pestlêkirinê were avakirin, çalakîyên lobîyê werin kirin û hin soz û belên ji wan werin girtin. Digel wê, bal hat gotin, pêwîst e torên xebatê werin avakirin da ku ji karibin bi hevkarî bixebitin, hêza xwe bikin yek û hêza xwe ya birêxistinbûna ser-sîyasetê bidin der.

JÎYANA SOSYO-KULTURÎ Û POLÎTÎKA

Moderator: Reha Ruhavioğlu

3. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

3.1. Herifîna Sazîya Qeyûmê Çêkirî û Beşdarîtî

Beşdarên civînê, li serê hevfikir in ku tu rewabûneke sîyasî, hiqûqî û civakî ya sazîya qeyûmê tune ye. Beşdaran bal pêdan ku qeyûmavêtin, ji bo Kurdan ew kirin e ku heqê wan yê hilbijartin û hatina hilbijartinê winda dike. Her wisa, piştî qeyûmavêtinê, meclîsên şaredarîyan hatin feshkirin, desteyên wekî Konseya Bajêr ku beşdarîtîyê gengaz dikir, ji kar hatin xistin, pêwendîyên bi civaka sivîl re hatin birîn û ev pêkanîn xisarê digihînin avanîya organîk ya bajêr û bendan datîne navbera birêveberên ku ji derveyî bajêr tên û bajarîyan.

Bi kurtayî, sazîya qeyûmê, rejîmeke wisa dide der ku demokrasîya cihkî betal dike, li herêmê klîkeke navendperest çêdike, red dike ku potansîyela bajêr bi kêrî xwe bîne û bi destê birêveberên jidervehatî çavkanîyan dişîne derveyî bajêr û ev yek, bi tevî kesên ku desthilata bajêr destek dikin, li ser hemû alîyan bandoreke neyînî dike û îmajeke nexweş çêdike.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Divê hemû herifandinên mirovane, çandî û civakî ku rejîma qeyûmê li bajêr kiriye, bi awayekî objektîf li rastê werin danîn û divê pêjnkarîyek were berbelavkirin ku ev polîtîka di zemîneke rewatîyê de bi cî nabe. Bi mebesta ku rêz li vîna sîyasî ya bajêr were nîşandan, divê di asta sazî û kesayetîyên cihkî û navendî de xebat werin kirin.

Ji bo pêkhatina şaredarîyeke gelparêz, divê beşdarî li birêvebirinê were kirin; meclîsên taxan/texman bi awayekî piranîparêz werin avakirin, aktorên ku ji hev cuda difikirin tev li xebatên biryargirtinê bibin. Di hilbijatinê de, tercîha wan çi dibe bila bibe, divê hemû beşên civakê tev li birêvebirinê werin kirin; û divê keya, odeyên pîşeyan, rêxistinên kedê, sazîyên civaka sivîl, hengavên komele û hevwelatîyên ku dîtina wan ya dinyayî cuda ne, bi hevkarî bixebitin.

Ji hêla din ve, sazîyên ku ji ber polîtîkaya qeyûman pêwendîya wan ya bi birêvebirina cihkî re hatiye birîn û sazgehên serbixwe ku li dijî vê polîtîkayê radibin, her tim hewl dan ku ji bendewarîyên çandî û hunerî yên bajêr re bibin bersiv. Di nav

vê habîtata civaka sivîl de ku çi ji ber bendewarîyê çi jî ji ber şertûmercan çêbû, sazîyên çand û hunerî yên wekî Şanoya Bajêr ya Amedê, Ma Music, Zarok Ma, Wêjegeh Amed, Amidart, Moderm û sazîyên nû ku li ser jinan, zarokan û ciwanan xebatê dikin, ava bûn.

Ev sazîyên ku piranîya wan endamên Platforma Bajêr in, divê bi ezmûne, paşxane û zanînên xwe ve, bi birêvebirinên cihkî re hevkarî û pardarîyê bikin, bi roleke sehitîker rabin û bi ezmûneya xwe ya civaka sivîl, birêvebirina cihkî xurttir bikin. Ji vê hêlê ve, divê birêvebirinên cihkî û civaka sivîl, gavên zexmtirkirina zemîna hevkarîyê xurttir biavêjin.

3.2. Parastina Zanava Bajêr

Em dikarin zanava bajêr wiha pênase bikin; paşxaneya çandî ya şênber û neşênber ya hevpar ya mirovên ku di gera dîrokê de li wî bajarî bi hev re jîyane û hilberandine. Ji vî alîyî ve, "zanaveke bajêr" ya Amedê heye ku bi paşxaneya dîrokeke bi hezaran salan çêbûye û li gorî piranîya beşdaran, pêkanînên qeyûmê, li xwe dike nîyet û armanc ku vê zanava bajêr biçilvirîne. "Zanava bajêr" ya Amedê, zanaveke tirûşdar û heterojen e ku zanava Kurd, zanava komên din yên etnîk yên li bajêr, zanavên din yên bîrûbawerîyan, binzanavên çandên etnîkî û dînî di xwe de dihewîne. Digel ku polîtîkayên heyî têr nakin ku avanîya pirzanavî û pirçandî ya zanava bajrê were geşkirin, pêkanînên qeyûm jî vî reng û vê xuyanga pirzanavî û pirçandî ya zanava bajêr, tenê ji hêla turîstîkî ve bi pêş de tîne û pirîya heyî bi paş de dike. Birêvebirinên berîya qeyûmê jî xweşikî nikaribûn zanava bajêr ya pirîparêz biparêzin, birêvebirina qeyûm jî jihevcudahîyên heyî hê bêtir winda dike. Di pirtûka bajêr de ku ji alî birêvebirina qeyûmî ve hatiye amadekirin, ev zanava xweser ya Amedê xweşikî nade der. Wekî mînak, bi çend peyvan tenê behsa Ermenîyan dikin. Ji hêla din ve, "zanava sîyasî" ya bajêr, parçeyekî xurt yê zanava çandî ya bajrê e. Polîtîkayên qeyûm, bi gelek rê û navgînan êrîş dibe ser vê zanavê û dixwaze wê nexuyayî bike.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

"Zanava bajêr" ya Amedê, her çend ji ber polîtîkayên qeyûm hinekî ji hev sist bûbe jî, piranîya dînamîk û berxwedêr ya bajêr bi ser dikeve û xwe diparêze. Perestgehên wekî Surp Gragos, Dayik Meryem, Mor Petyun û Mizgefta Mezin, dibin stûnên sereke yên zanava bajêr ku temenê wê ji hezaran salan zêdetir e.

Ji ber tercîhên dînî, çandî û sîyasî yên birêvebirina qeyûmî, çavkanîyên şaredarîyê, bêtir ji bo polîtîkaya avakirina çandeke hêvişkar (mihafizekar) û zanavake bajêr ya hêvişkar tê mezaxtin. Digel wê jî, sazîyên sivîl, di nav van dijwarîyan de, ketin nav hewla parastina zanava çandî, zimanî û dînî ya bajêr ya pirîparêz û hilberînên sivîl kirin.

Sazîyên ku raya birêvebirina bajêr bi destê wan e, divê parastin û geşkirina avanîya bajêr ya pirzanavî û pirçandî wekî normekê û pratîkekê qebûl bikin û bajêr li gorî vê û li ser vê yekê bi rê ve bibin. Tê xwestin, bila dîroka çand û bîrûbawerîyên bajêr li gorî heqîqetê bê vegotin û polîtîkayeke dîrok-turîzmê ya wisa were meşandin ku karibe pirzanavî û pirçandîtîya bajêr bide der.

Di polîtîkayên ku bi zanava bajêr ve pêwendîdar in, divê sazî, kes û komên pêwendîdar karibin bibin çalak û ji alî parastina zanava bajêr ve, ev kes, kom û sazî di nav mekanîzmayeke şopgerandinê û rawêjkirinê de cî bigirin.

Ji mafên sereke yên mirovan e ku hemû gel, bîrûbawerî, mezheb û dîtinên li bajêr karibin xwe bi serbestî derbibirin. Loma jî, li ser hîma ku jihevcudabûn zengînî ye, bêyî ku ferqî têxin nava dîn, mezheb, dîtina sîyasî û felsefî, divê hemû gel û bîrûbawerî karibin bi serbestî xwe derbibirin.

3.3. Veguherîna Çalakîyên Çandî û Hunerî

Di nav avanîya Şaredarîya Bajarê Mezin ya Amedê û şaredarîyên bajarokan de, şanoya Kurdî, konservatuara muzîkê, qrêşên zarokan, navendên zarok û ciwanan, ji wan xizmetên giring bûn ku her çend ne ew qas berfireh bûn ku karibin "zanava bajêr" ya Amedê bidin der jî, hewcetîya beşeke mezin ya bajêr diqedandin. Wê gava ku birêvebirinên cihkî polîtîkayên xwe yên çandî dimeşînin hikûmeta navendî jî bi derfetên xwe ve polîtîkayeke çandî ya din dimeşîne. Bi vî awayî, li bajêr, du jîyanên çand û hunerî yên ji hev cuda ku li bin guhê hev nediqelibîn, li dar diketin. Bi hatina birêvebirina qeyûm re, hikûmeta navendî sazîyên çand û hunerî, yên jinan, yên zarokan û yên ku perwerdehîya zimanê dayikê didan, girt û hemû xebatkarên wan ji kar avêt. Bi vî awayî, jîyana çandî ku bi gelemperî bi derfetên şaredarîyê geş dibû, ji bo beşeke mezin ya Amedê hema bêje qet nema.

Navenda Çand û Kongreyê ku ji bo ku ji jîyana çandî ya geş ya Amedê re bibe bersiv hat avakirin, di dema qeyûmê de, bû navenda ku çalakîyên polîtîkayên hêvişkar (mihafizekar) yên desthilatdarîyê lê tên kirin. Çalakîyên çand û hunerî yên bi Kurdî hema bêje hat asta herî kêm. Bîlboardên bajêr, bûn panoyên reklamê yên nivîskar û axêverên ku Amed heta roja îro navê wan jî nizanibû. Derfetên şaredarîyê, ketin ber xizmeta kes û sazîyên ku li dorhêla desthilatdarîyê cî dane xwe û li gorî bêjara desthilatdarîyê hilberînana dikin.

Kurdî û çalakîyên çandî û hunerî yên bi Kurdî li derve jî berdewam kir. Sazîyên wekî Şanoya Bajêr ya Amedê û Ma Music, li texma Diclekent û Bulwara Mahabadê cî ji xwe re peyde kirin. Vê rewşê kir ku çalakîyên çand û hunerî yên bi Kurdî li van texman geşayî bide xwe û ji ber vê yekê, asta aborîyê û çand û hunera Kurdî bi hev re pêwendîyeke baş danî. Sazîyên alternatîf yên ku ji piştgirîya dewletî bêpar in, bi qasî ku karibin ji hewcetî û bendewarîyê re bibin bersiv, nikarin xizmeteke bêpere derpêşî texmên wekî Sûr û Baxlerê bikin ku ew texm ji hêla aborîyê ve di asteke pir nizm de ne.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Beşdaran xweş lê nanêrin ku hunermendên ji alî qeyûm ve ji kar hatin avêtin û li derveyî şaredarîyê sazîyên çand û hunerî yên wekî Şanoya Bajêr ya Amedê û Ma Music ava kirin, careke din jî vegerin şaredarîyê. Digel vê yekê jî, ew wisa difikirin ku divê ew kes di meşandina polîtîkayên çand û hunerî de, ku wê zanava bajêr bide ber çavan, bi awayekî xurt cî bigirin. Li gorî vê, divê birêvebirinên cihkî mekanîzmayên wisa saz bikin ku ev sazî karibin digel statuya xwe ya serbixwebûnê, tev li hilberandina çand û hunerê bibin.

Divê ji ber çavan neyê dûrxistin ku nêzikî 8 sal in xizmetên çand û hunerî yên şaredarîyê bi tevayî guherî, loma jî, divê jîyana sosyal û çandî ku heta roja îro hatiye paşguhkirin, were geşkirin. Digel vê yekê jî, divê neyê jibîrkirin ku pêwîst e çarçoveya hilberandinên çand û hunerî ji demên berê berfirehtir be.

Tê payîn ku Amed di warê çand û hunerê de, polîtîkaya xwe ya demdirêj dîyar bike û polîtîkayeke tevdeyîyê bimeşîne. Divê demajoya dîyarkirin, meşandin û şopandinê bi pardarî û hevkarîya sazîyên çandî, civaka sivîl û sazîyên din bikude. Dînamîkên sivîl yên bajêr, divê ji hêla polîtîkaya çandê ve, hem barê birêvebirên cihkî siviktir bikin hem jî li ser şopa wan biçin û binirxînin.

3.4. Rewşa Zimanê Dayikê û Polîtîkaya Zimanê Dayikê

Amed, navenda sîyaseta çand û zimanê dayikê ye. Ji hêlekê ve, di warê birêvebirina navendî de hilberandina çandî û hunerî qelstir dibe ji hêla din ve jî rêjeya bikaranîna zimanê dayikê kêmtir dibe. Li gorî daneyên Navenda Xebatên Kurdan ya li ser Amedê, ji % 30yê şênîyên mezin bi dê û bavê xwe re bi Kurdî diaxive û rêjeya kesên ku bi zarokan re bi Kurdî diaxivin, tenê ji %8,8 e. Rêjeya axaftina bi Kurdî ya di derdora hevalan de pir kêm e. Rêjeyên zimanzanînê û pêaxaftinê bo Kurdî de her ku diçe xerabtir dibe.

Qursên hînbûna Kurdî ku berê ji alî birêvebirinên cihkî ve hatibûn vekirin û qreşên Zarokistanê ji bo hînbûna zimên, cîyên jîyanî bûn. Ji hêla din ve, hilberandina çand û hunerî ya bi zimanê dayikê jî ji bo berbelavbûna zimên dibû destek. Lê belê, rejîma qeyûmê, kargînîya qrêşên Zarokistanê guherand û qrêşên ku zarokan dikaribû lê hînî Kurdî bibin, hatin girtin. Her wisa, guherîna di hilberandina çand û hunerê de çêdibe jî, bandoreke neyînî li bikaranîna zimên dike.

Ji hêlekê ve, rêjeyên zanîn û bikaranîna zimên kêmtir dibin, ji hêla din ve, tevgereke zimên radibe ku piraktor e û ji her alîyê ve tê destekkirin. Hejmara weşanxaneyên Kurdî, hilberandina agahîya akademîk, weşanên ku folklorê didin nasîn û sazîyên bi van xebatan re pêwendîdar zêdetir dibin. Li Amedê, daxwaza xizmetên dewletê yên bi Kurdî û perwerdehîya bi zimanê dayikê, bi rêjeyeke ji ser ji % 90î zêdetir tê destekkirin.

Li Ameda ku navenda Kurdîbûnê ye, birêvebirinên cihkî, heta niha li vî bajarî, ji bo Kurdî gelek xizmetên hêjayê gotinê kirin. Van xizmetan kir ku zimanê dayikê

di nav jîyana civakî de xuyanîtir bibe. Lê belê, îro ro, hem di xizmetên dewletî de xuyanîbûna Kurdî hindiktir bûye hem jî rêjeya zanîn û bikaranîna zimanê dayikê bi awayekî dramatîk nizmtir û kêmtir bûye.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Divê birêvebirina cihkî ya Amedê, rewşa Kurdî ku her ku diçe xerabtir dibe, wekî pirsgirêkên herî lezgîn qebûl bike û digel hevkarên xwe, polîtîkayeke tevdeyîparêz dîyar bike û gavek berî gavekê li dar bixe. Polîtîkaya zimên ya birêvebirinên cihkî û belgeyên polîtîkaya ku ji bo perwerdekirin û bikaranîna Kurdî tên amadekirin, divê bi rihetî û hêsanî werin bidestxistin.

Divê xebatên li Kurdistanê yên di warê sosyal, sîyasî û aborîyê de, bi Kurdî werin kirin, divê xebat bê kirin da ku Kurdî bibe zimanê bazarê, ji vî alîyî ve, han li sazî û pardar bê dayîn.

Divê ji bo zarokan, ji nû ve qrêşên ku bi zimanê dayikê xizmetê didin û navendên perwerdehîyê werin vekirin. Gava birêvebirinên cihkî van xizmetan didin, divê ji bîr nekin û qrêşên din, sazîyan û hwd., jî tev li wan xebatan bikin. Bi pêkanînên cur bi cur divê han bê dayîn ji bo ku qrêş û navendên zarokan yên lîstikê bi Kurdî bi kar bînin. Wekî mînak, şaredarî dikare piştgirîya personel, kelûmel û hwd., bike ji bo wan qrêşên ku soz û belên didin ku ew ê mufredata şaredarîyê bi cî bînin.

Divê han were dayîn da ku sazîyên wekî DTSO, Baro û Odeya Bijîşkan ku nîvenîv sazîyên dewletî ne û digel sazîyên civaka sivîl yên eleqedar, qrêşên ku bi Kurdî xizmetê dikin, vekin.

Divê li parkan, ji bo zarokan, çalakî û şahî werin çêkirin. Digel xebatên ji bo xuyanîkirina Kurdî divê xebatên ku bi Kurdî tên kirin jî werin pesinandin û qedrê wê were parastin.

Divê di birêvebirinên cihkî de, bi hişmendîya xizmeta bi zimanê dayikê kar were kirin û kar bi wan kesan bê dayîn ku ew ê karibin bi zimanê dayikê xizmetê bikin.

Divê birêvebirinên cihkî, bi sazîyên ku bi Kurdî weşanê dikin re hevkarîyê bikin. Divê ji bo zarokan pirtûkên çîrçîrok û çîrokan yên pirzimanî werin peydekirin û bêpere werin belavkirin. Divê çalakî werin çêkirin da ku zarok bi zimanê dayikê biaxivin û divê han bi wan bê dayîn. Divê xebata ji bo berbelavbûna bikaranîna zimanê dayikê were geşkirin.

Der heqê derfetên şaredarîyê de jî; li ser zimanê dayikê, ji bo ku dersên zimanê dayikê yên vebijarkî bi xwe re derfeta perwerdehîya pirzimanî çêke, divê her sal kampanya werin çêkirin, xizmetên bîlboardê û hwd., bo van kampanyayan werin dayîn. Divê ji bo xwendkarên ku dersên zimanê Kurdî tercîh dikin, kampanyayên handanê werin çêkirin û piştgirîya materyal û kelmelan li mamosteyên branşê bê kirin.

Divê birêvebirinên cihkî, xebatên wisa bike ku prestîja Kurdî hem li Amedê hem li herêmê hem jî li Tirkîyeyê zêdetir bibe.

3.5. Perwerdehî

Amed, di hemû daneyan de ku bi perwerdehîyê re eleqedar in, li Tirkîyeyê, di rêzên dawîyê de cî digire. Li gorî Endeksa Jîyana Li Bajaran ya TÜİKê, Amed, di rêjeya fêrgehên berî xwendinê di rêza 63yan de, di navînîya Puana Azmûna bo Ketina Lîseyan di rêza 64an de, di navînîya puana ezmûna bo ketina zanîngehan di rêza 61ê de, li gorî rêjeya derçûyîyên fakulte û dibistana bilind de jî di rêza 53yan de ye. Amed, di daneyên pêkêfxweşbûnê yên ji xizmetên perwerdehîyên yên dewletê dide li Tirkîyeyê di rêza 68an de ye. Bi wateyeke din em ji perwerdehîyê ne kêfxweş in.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Di perwerdehîyê de, egera herî giring ya ku bandorê li serketinê dike, xwarin û xwedîbûna baş e. Asta sosyo-ekonomîk ya malbatê, hem bi xwedîbûnê re hem jî bi perwerdehîyê re ji nêzik ve eleqedar e. Nexwe, divê em li serê li hev bikin ku perwerdehî ne tenê çalakîyeke di nav fêrgehê de ye. Ger em ji vê bidin ser rê, em ê karibin bêjin; divê birêvebirinên cihkî, pîlankirina demajoyeke dirêj bidin destpêkirin da ku kalîteya perwerdehîya li Amedê zêdetir bibe.

Li gorî denayên PISAyê, zarokên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde nabin, her çend di heman polê de bin jî, li gorî zarokên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde dibin, salek an jî sal û nîvek li paş dimînin. Ji ber vê yekê, divê were dîtin ku perwerdehîya pirzimanî ku li ser perwerdehîya zimanê dayikê tê danîn, bi awayekî erênî bandorê li kalîteya perwerdehîyê jî dike û ev yek hem heqek e hem jî daxwazek e.

Divê birêvebirinên cihkî, ji bo ku kalîteya perwerdehîya bajêr zêdetir bibe, bi kesên pispor û sazîyên eleqedar re hevkarîyê bikin, pîlanên stratejîyê amade bikin û gavên vê stratejîyê jî bi wan kes, sazî û hevkaran re werin avêtin.

Divê hewcetîyên giring yên wekî têkoşîna bi xizanîyê re û xwedîbûna li dibistanê, ji alî şaredarîyan ve werin qedandin. Divê şaredarî, li gorî hewcetîyê, ji fêrgehên herî hewce dest pê bikin û bi pêkanînên pîlot vê xizmetê berbelavtir bikin. Li bajêr, li taxên ku rewşa wan ya aborîyê qels in, qursên destekkirinê berbelavtir bin, divê di van qursan de desteka xwarin û lîstikê jî were dayîn. Der heqê piştgirîya burs û qeydkirinê de, ya ku wê ji bo xwendekarên zanîngehê bê dayîn, divê bi dînamîkên bajêr re xebat bê kirin û çi qas gengaz be ew qas xwendekar werin piştgirîkirin.

3.6. Tenduristî

Amed, di kêfxweşbûna ji xizmetên tenduristîyê di rêza 68an, di kêfxweşbûna ji tenduristîya xwe di rêza 76an, di leza mirina pitikan jî di rêza 15an de ye. Tevî ku polîtîkaya tenduristîyê ya gelemperî ev qas qels e jî, hewcetî û daxwazeke giring heye ji bo xizmeta tenduristîya bi zimanê dayikê.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Mafê tenduristîyê, yek ji mafên sereke yên dewletî ye. Divê wekî rêgezekê were qebûlkirin û ji bo hemû hevwelatîyan xizmeta tenduristîyê bêpere, wekhev û bi zimanê dayikê be û divê ev rêgez bibe polîtîkayeke giştî. Divê xizmetên tenduristîyê yên parastin û pêşîlêgirtinê û xizmetên giştî yên ji bo tenduristîya gel, di nav peywirên birêvebirinên cihkî de werin qebûlkirin.

Digel vê yekê, xurtkirina hişmendîya tenduristîyê û xwendin û nivîsîna bajarekî berpirsîyeke sereke ya dewletî ye. Birêvebirinên cihkî, ew sazîyên sereke ne ku rol û berpirsîya wan heye di vî barî de.

Ji bo ku li nexweşxaneyan, bi zimanê dayikê xizmet were dayîn, divê mekanîzmayek were sazkirin da ku tê de piştgirîya personelan, perwerdehî û handan jî hebe.

Divê li ser pirsgirêkên tenduristîya civakê, xebatên birêkûpêk werin kirin û sazîyên tenduristîyê yên elqedar, ode û rêxistinên civaka sivîl û sendîka xebatên hevkar bikin.

REWŞA ABORÎ Û BIPÊŞKETINA ÇOLTERÎ

Moderator: Mehmet Aslan

4. PIRSGIRÊK Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERÎYÊ

4.1. Divê Ji Bo Amedê Mîxwera Bipêşketinê ya Rast Çi Be

Civîna navend4 bi axaftina destpêkirinê ya Serokê DİTAMê Mesut Azizoğlu dest pê kir. Azîzoğlu got, armanca civînên ku bi 4 sernavan tên çêkirin ew e ku em dixwazin bandorê li demajoya biryargirtinê bikin. Gava mirov Amedê û herêmên ku Kurd lê dijî bi herêmên din yên Tirkîyeyê re dide ber hev, mirov dibîne ku bi awayekî pêşqebûlî 100 sal in polîtîkayeke bi zanîn û bi hişmendî tê meşandin û bi birêvebirinên qeyûmî yên piştî sala 2015an jî, birêvebirinên herêmî ji gel dûr ketin û pirsgirêkên li Amedê xuyanîtir bûn. Moderatorê civînê jî got, di warê ekonomîyê de, bi tevayî serdemeke nû dest pê kiriye, ya kevn û ya nû pir bi dijwarî pev diçin û ne hêsan e mirov ekonomîyê tenê di ser David Ricardo, Adam Smith, Karl Marx re fam bike, êdî gelek çetin e ku mirov karibe bi teorîya ked-nirxê hin tiştan rave û şirove bike, di ser sermîyana entellektuel re gelek veguherîn çêbûne û êdî ciwanên 20 salî pere û serwetên mezin qazanc dikin.

Wekî mînak, ciwanên Boğaziçiyê, platformeke lîstikê ya bi navê Peak Games saz kirin û platformeke din ya bi navê Zynga ku navenda wê California ye, platforma ciwanên Boğaziçiyê bi 1,8 milyar dolarî kirî û ev pere, mêjera herî bilind bû ku heta niha fîrmayeke bîyan ji bo şîrketeke teknolojîyên ya li Tirkîyeyê dida. Yemek Sepeti, di sala 2015an de, bi 589 milyon dolarî bo fîrmaya Delivery Hero ya Elmanan hatibû firotan. Qeraseyê e-bazirganîyê ya Çînî, Alibaba, ji bo Trendyolê 728 milyon dolar dabû, lê ji bo Peakê bi tevayî 1,8 milyon dolar hat dayîn. Di van rojan de ku têgih û rêbazên pereqazanckirinê guherîne, jîrahîya çêkirî di nav demeke kin de bû parçeyekî jîyana rojane, divê bipêşketina aborîyî li ser zemîneke rast were danîn û gengeşî li serê were kirin.

Ji bo ku sektora sanayîyê encamên kartêker li ser bipêşketina bajêr çêke, divê were analîzkirin ka sîteya sanayîyê yê 2yan, herêma sanîyîya organîze ya tekstîlê, KSS û bi awayekî seretayî qadên ku ji derveyî OSBê çêbûne, çawa dikarin hê kartêker û berdar bin. An jî, li ser paradîgmaya ku der heqê sektora sanayîyê de hatiye danîn, divê were nirxandin gelo bipêşketineke bi sanayîyê ve girêdayî tiştekî bivênevê ye an na. Ji bo sala 2022yan, gava em bi awayekî sektorî bala xwe

didin Hilberandina Neteweyî ya Brût (HNB-GSYH), di HNBê ya Tirkîyeyê de para sanayîyê ji %26 e lê para Amed û Rihayê ji %13 e. Amed, ji alî nirxa hilberandina sanîyîya çêkirinê ve di nava 81 bajaran de di rêza 46, Riha jî di rêza 38an de ye.

Her du bajarên ku herêma TRC2yê pêk tînin, tevî ku di çandinîyê de xweyî avanîyeke hevrikîker de ne jî, xuya ye di sanayîyê de binesazîyeke wan ya hêjayî gotinê tune. Gava mirov di ser van daneyan re berê xwe didiyê, bi tevî ku ranêzikîya bipêşketin û mezinbûnê ku di ser sanayîyê re populertir e jî, nehatiye analîzkirin ka potansîyelên bajêr li gorî vê yekê ne an na û ev yek jî pirsgirêkeke mezin e. Loma jî, divê çareserî di ser bersivên ku ji bo pirsa "Gelo ji bo Amedê, divê mîxwera bipêşketinê ya rast çi be" re werin peydekirin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Bersivên ku ji bo pirsa "Gelo ji bo Amedê, divê mîxwera bipêşketinê ya rast çi be" tên dayîn, tevî ku mîxwera bipêşketin bi kitekitî tên gengeşîkirin jî, hat dîtin ku di navenda gengeşîyê de GAP heye. Nêzikî 100 sal berê, Amed, ji alî hejmara kargehên tescîlkirî ve li pey Stenbol û Bursayê, di rêza 3yan de bû, lê roja îro ji vê yekê gelek dûr ketiye û hat nirxandin ku sedema vê yekê ew e ku herêm bi taybetî ji par re hatiye hiştin. Ji bo ku bajar karibe vegere rojên xwe yên berê, divê modêlên ekonomîk yên rast werin bicîanîn.

Çaxeke nû ya ji bo gera bazirganîyê dest pê kir. Li ser vê yekê, divê xebatên ji bo hilberandina teknolojîya navînî û bipêşketî werin kirin. Gelo di demajoya hilberandina teknolojîyên navînî û bipêşketî de, awantajên bajêr hene? Heke hebe, gelo em dikarin van awantajan bi çi awayî û rast dabeşînin? Bi taybetî ji alî sermîyana beşerî ve, awantaj û potansîyelên giring yên bajêr hene.

Gava em ji hêla şûnê ve jî berê xwe didin Amedê, em dibînin xweyî awantajên veguhastinê an jî yên lojîstîkê ye, bi taybetî, tê dîtin ku gava sektora çandinîyê bi binesazîya lojîstîkê ve were entegrekirin, wê bibe navendeke hêzê ya giring.

Ji bilî awantajên lojîstîk, qadeke din jî ku ew ê karibe bibe dînamoya bipêşketinê, hilberandin û şixulandina berên çandinîyê ye. Ji bo ku encamên tê xwestin ji vê qadê were bidestxistin, divê entegrasyona rast bi GAPê re were kirin û ji bo ku encamên rast ji çandinîyê û ji GAPê werin bidestxistin jî, divê tevdehîkirin were temamkirin.

Nêzikî ji %20ê çandinîya organîk, bi taybetî jî, pembûya organîk ya dinyayê, li herêmê tê hilberandin. Gengaz e ku bi derfetên avdanê yên bendavên Silvan û Dicle Kralkızıyê, hilberandina pembûya organîk bibe hêzeke çandinîyê ya giring. Hûrgilîyeke din ya giring jî, zanava bajêr ya "navenda tenduristîyê" ye...

Li Amedê, gelek nexweşxaneyên taybet hene ku bûne marqeyên giring û li Rihayê jî, ji alî marqeyên neteweyî ve, nexweşxaneyên taybet tune ne.

Digel vê yekê jî, şaxên gelek fêrgehên taybet hene li bajêr û ev yek bi awayekî neyekser dike ku di karpêdana 'berstûka spî' de zêdebûneke hêja çêbibe.

4.2. Pirsgirêkên Di Sektora Çandinîyê De

Divê çarçoveya giştî ya sektora çandinîyê were lêkolan, hevkêşa çandinîya kevneşopî û ya modern bi hev re werin nirxandin. Li hemû Tirkîyeyê, bi jimareyên 2020î, wekî nirxa hilberandina çandeyî; Riha di nava 81 bajaran di rêza 7an, Amed jî di rêza 13an de ye. Tê dîtin ku di vî warî de, her du bajarên ku herêma TRC2yê pêk tînin, serwer in. Loma jî, divê sanîyîyîbûna li ser hîma çandinîyê li ser mîxwera GAPê were nirxandin û divê pêkanînên "tevdeyîkirinê" werin ronîkirin ku li ser bingeha GAPê û li ser erdên çandinîyê yên di çolterê de, qadên nû yên milkdarîyê destnîşan dike û di avanîya sosyalî de pestê çêdike, tew ji ber wê pevçûnên giran jî diqewimin. Di heman çarçoveyê de, ji bo ku projeya neqed ya bi navê GAP bibe xweyî fonksîyonekê, divê li ser mijara ka wê bajar çawa bibe alî û wê mekanîzmayên lobî û pestlêkirinê çawa werin sazkirin, rê û rêbaz û polîtîka werin dîyarkirin.

Nêrîna dewletê ya li GAPê jî yek ji pirsgirêkên giring e. Her du pêkhateyên sereke yên projeyê, yek jê enerjî ye ya din jî avdan e. Lê belê, gava em bala xwe didin pêkanîna vê projeyê, em dibînin, hilberandina enerjîyê bi awayekî beloq hatiye pêşînîkirin û beşa avdanê hatiye paşguhkirin û tevî ku dahata ku ji enerjîyê tê bidestxistin lêçûna projeya GAPê zêde zêde diqedîne jî, em dibînin ku ji ber ku dewlet wan wekî lêçûn û barekî zêde qebûl dike, mêjera erdên ku dikarin werin avdan misêwa tên guherandin. Di pîlana çalakîya GAPê ya sala 2008an de erdên ji bo avdanê armanckirî 1,8 milyon hektar e, lê bi guherandinên ku hatine kirin, mezinahîya erdên ji bo avdanê hatiye armanckirin bo 1,35 milyon hektarê hatiye daxistin. Wekî din jî, armanca avadanê ya Bendava Silvanê ku ji bo Amedê yek ji pêkhateya giring ya GAPê ye, 235 hezar hektar e, lê belê, hê jî di armanca avdanê de tu çalakî nehatiye kirin û ev yek jî pirsgirêkek mezin e.

Tevî ku tê gotin, GAP wê ji bo bipêşketina herêmê û ya Amedê tevkarîyekê bike jî, fikirek jî heye ku dibêje, proje wê pirsgirêkên ekolojîk biafirîne. Di vê çarçoveyê de, hin ji pirsgirêkên ku bi girêdayî GAPê ve hatine dîyarkirin, ev in; dev ji cureyên endemîk hatiye berdan û ji hêla tovên hawirdeyê ve pabendî çêbûye, der heqê bikaranîna av û enerjîyê de pir zêde lêçûn heye, ev demajo bûne sedem ku di genetîka tov û riwêkan de guherîn çêbibin, rêbazên avdana qaçaxî berbelav bûye, çavkanîyên ava binerdê bêpîvan tên bikaranîn, qadên mêrgan hatine tengkirin û vê yekê pest li ser ajalkarîyê çêkiriye, bi tevî pircureyîya ber û berheman, hê jî demajoya derbasbûna bo makîneyîbûn û sanîyîya çandinîyê temam nebûye, bi taybetî, ji ber ku di çandinîyê de ked û karkerîya erzan tê tercîhkirin mêjokîya kedê asayî bûye û ji ber transferên karkerîya erzan, koçkirina navxweyî lez girtiye.

Mijareke din jî ku wekî pirsgirêk tê derbirîn, pêkanînên ji bo tevdehîkirinê ye. Hatiye gotin, tevdehîkirin bûye rêya bêmilkkirinê, kargehên biçûk yên malbatî li derveyî qada hilberandina çandinîyê hêlaye û hilberînerên mezin hatine destekkirin, hilberînerên biçûk û cotkar jî bêerd hatine hêlan û ew bûne hêza kar û ev hemû wekî "pirsgirêk" hatine pênasekirin.

Tevî ku bi GAPê re bazareke mezin çêbûye û derfetên jî çêbûne, pirsgirêk jî pê re çêbûne. Hin pirsgirêkên makro ku berê di qadên çandinîyê de peyde nedibûn, bandorgirtina ji avhewayê wekî pirsgirêkên layekî hatine gengeşîkirin. Ji bilî bandorgirtina ji avhewayê, ji ber ku bi desteka dewletê tovên hawirde, bi taybetî jî tovên Îsraîlê, hatine destekkirin û vê yekê kiriye ku riwêkên çandî leqayî erozyona genetîk bibin. Her wisan, digel desteka ku dewlet dide tovên hawirde, desteka ku dide pircureyîyên cihkî roj bi roj kêmtir dibe.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Tevî ku bawerîyeke giştî heye ku dibêje, GAP navenda bipêşketinê ye jî, tirûşek jî heye li dijî GAPê. Kesên ku tirûşê lê dikin, hincetên wan hene ku di nava xwe de hevgir û rast in. Her wisa, kesên ku piştgirîya GAPê dikin jî hincetên wan hene ku di nava xwe de hevgir û rast in. Heke ji bo ku hilberandina çandinîya bi bihayê lêzêdekirî GAP pêşmerceke giring be, divê tirûşa ku li dijî projeyê çêbûye were birêvebirin. Ji ber ku xwedîtîlêkirineke vebir tune ye, ev yek rê nade ku li bajarên herêmê ji bo temamkirina projeyê daxwazeke xurt jî çêbibe. Yek ji sedema ku nahêle daxwazeke xurt çêbibe jî ew e ku pêkanînên tevdeyîkirinê hem di asta ku tê xwestin de bi cî nayê hem jî ji ber entegrasyona erdan avanîya milkdarîyê diguhere. Piştî ku parselên biçûk bên "tevdeyîkirin" û entegrekirin û li parselên mezin bên veguherandin wê ev yek bike ku kargînîya makîneyên çandinîyê zêdetir bibe û sîstemên avdanê çêtir werin bicîanîn.

Di tabloya jêrîn de ku li gorî daneyên Wezareta Çandinîyê hatiye çêkirin, berbelavbûna erdan ya bajarê Amedê xuya dike. Qada bi qasî 235 hezar hektar ku wê bi projeya Farqînê ji bo avdanê were vekirin, ji %38ê tevayîya erdên Amedê pêk tîne, loma jî, tablo ji vê hêlê ve giring e.

BERBELAVIYA ERDAN YA BAJARÊ AMEDÊ

CURE	MÊJER (HA)	%
Tevdeyîya Qada Çandinîyê	624.933	40,18
Çêregeh-Mêrg	136.590	8,78
Daristan	323.460	20,79
Qada ji bo Çandinîyê ne Kêrhatî ye	470.544	30,25
TEVDE	**1.555.527**	**100**

Berbelaviya Erdan Ya Bajarê Amedê Mêjer (Ha)



Heke em bên ser pirsa gelo razemenîyên li herêmê tên kirin bandoreke çawa li potansîyela me ya hilberandinê dike, divê mirov GAPê tenê wekî projeya avdanê nenirxîne. Ne tenê di warê enerjî û avdanê de, bi qada xwe ya sanayî û turîzmê jî, projeyeke entegre ye ku bandorê li jîyana sosyal jî dike. Digel ku alîyên wê yên rexnekirinê hene jî, pîlaneke bipêşketînê ye ku hê jî dikude. Bi taybetî, razemenîyên ku ji hêla hilberandina çandinîyê ya herêmê ve tên kirin jî hêdî hêdî entegreyî projeyê dibin. Wisa xuya ye ku xebatên li ser Bendava Silvanê ber bi dawîbûnê ve diçe. Beyarkirina erd ya avdanê û rewşên wisa, wekî bandorên layekî didin der. Gava mirov bi awayekî akademîk lê dinihêre, xebatên giring tên kirin û li hemberî rewşên wekî bixwêbûnê jî bergirî tên kirin. Ji bo ku GAP karibe bigihîje encamên tên xwestin, divê di navbera pêkhateyên cihkî de, çandeke hevkarîkirinê hebe. Divê di navbera hilberîner û sanayîkar de pêwendîyeke yekser were danîn. Divê ji alî Wezareta Çandinîyê ve, bi taybetî razemenîyên ku bi rêya TKDKê tên kirin, bi awayekî ku hevkarî û entegrasyonê pêk bîne, were pîlankirin. Gava em li daxuyanên DSİyê dinêrin, proje bi pêş dikeve û rêjeya temambûna Bendava Silvanê, ji %95 e û tê hêvîkirin ku proje îsal were temamkirin.

Ji bo ku GAP ji hêla sanayîya çandinîyê ve, bigihîje encamên tê xwestin, di nava pêşnîyazên çareserîyê yên giring de ye ku tê gotin; divê bi taybetî di bazarên çandinîyê de çanda entegrasyon, hevkarî û pisporbûnê were bipêşxistin. Her wekî di daneyên sala 2020î ya Rêxistina Çandinîyê ya Dinyayê FAOyê de jî xuya dike, tevî ku avhewayeke sar lê heye jî, ji %44ê hilberandina nîskan ya tevdehîya dinyayê li Kanadayê tê hilberandin û ev yek serwerîya hevrikîkirinê ye ku bi saya hevkarî û pisporbûnê çêdibe.

Nîsk: Di Hilberandina Sala 2020î De Parên Welatan



Hat gotin, gava çareserîyên li ser projeya GAPê tên temamkirin, divê zanîngeh bi awayekî çalak tev lê bibin û çandinî bi xebat û pêkanînên zanistî werin destekkirin. Bi vekolînên ku di asta zanîngehan de hatine kirin, bandorên erênî yên nexşa hilberandinê ya riwekî ya bi GAPê ve hatiye lêkolînkirin. Hatiye derbirîn ku wekî hilberandina riwekî, GAP di warê bipêşxistina tovên xwe de nabe berbend, berevajîya wê taybetîyê wê yên destekker zêdetir in û mirov dikare biçe qadê, vekolînên bi hûrgilî bike û bibîne ka 8 bendavên li Amedê derfetên çandinîyê yên çawa çêdikin.

Heke der heqê çandinî an jî sanayîya çandinîyê de bipêşketin û veguherînek çêbibe, divê havil ji akademîyê were girtin û ev yek wekî pêşmerc were qebûlkirin. Li dinyayê pêşînîyên çandinî bilezûbez diguherin, çandinîya ekonomîk, roj pê de dibe pêşînîyeke giring. Dinya bi ku ve diçe? Di çandinîya bêerd de çi pêşketin çêdibin? Pêkanînên ajalkarîyê yên ku bi ranêzikîyên vedîtinî tê bipêşxistin, derfetên çandinîya bi aqilane, avdana bi aqilane çi ne? Di demên ku di avhewayê de guherînên mezin çêdibin, xebatên veçêkirina tovên ku li ber avhewayê, li ber ziwatîyê li ber xwe didin, di çi astê de ne?

Bersivên ku bo van pirsan tên dayîn û xebatên ku ji vî alîyî ve bên kirin, wê bikin ku binesazîya bipêşketina çandinîyê ya li ser hîma GAPê ava bibe. Divê modêlên hilberandina çandinîyê yên li ser hewzayan ku ji alî Wezareta Çandinîyê ve tê şopandin û ji bo bicîanîna wê qanûnname hat derxistin, di çarçoveya GAPê de were fikirandin û ji bo desteya berhema çandinî ya paşê jî xebatê zanistî werin kirin.

Bi taybetî vekolînên spesîfîk ku zanîngehê di hin mijaran de kiriye, aşkere bûye ku Amed bêtir hevrikîker e. Ji berhemên çandeyî, ji nîsk û ji genimê bo xurekê nêzikî heft cureyên endemîk hatine bidestxistin, di çarçoveya rezvanîyê di hilberandina organîk û şixulandinê de jî, ji hêla bikaranîna "*öküzgözü*" û "*boğazkere*"yê ve xebatên ku hatine kirin, divê hewldanên hêjayî balpêdanê werin dîtin.

Di civînê de, ji hêla Amedê ve, nirxandina potansîyelên enerjîya jeotermal weka fersendeke din hatiye nirxandin. 4000 bîrên petrolê hene li dorhêla cihoka esasî ya ya 212 kîlometreyî ku bendava avdanê ya Dicle Kralkızıyê ji wir dibihure, ev bîrên petrolê herî kêm 3000 metre tên kûrkirin, gava petrol jê dernekeve an jî rezerv hindik were qebûlkirin, bîr tê girtin; lê belê ava germ ji 2000 bîrên ku hatine girtin, derketiye û rezerva germahîyê jî ji bo serakarîyê fersendeke giring e. Heke bîrên ku tê de ava germ heye û hatine girtin, ji nû ve werin vekirin û di serayê û çandinîya binober de werin bikaranîn, wê ev yek ji bo Amedê bibe fersendeke giring ya bihayê lêzêdekirî.

Divê sanayîya çandeyî çêbibe û ne tenê di qada neteweyî de, di qada navneteweyî de jî zanaveke çandinîyê ya hevrikîker were geşkirin û divê li ser bazarê û bihadîyarkirinê jî bibe xweyîgotin. Di vê wateyê de, ji bo ku derfetên GAPê ji alî bihadîyarkirinê ve jî bibe hêzeke hevrikîker, yek ji amrazên giring çêkirina depoyên bi lîsans e. Ji ber ku li Amedê, der heqê dexl û zadê de, depoyên bi lîsans berbelav in, ev yek awantaja dîyarkirin û kontrolkirina bihayê jî çêdike. 13 depoyên bi lîsans hene ku hê likar in û kapasîteya her yek ji wan 30 hezar ton e. Bi tevî yên ku niha dişixulin, destûra depoyên bi lîsans hatiye girtin ku bi tevayî dikarin 870.000 ton dexl û zad di xwe de bihewînin. Tevî ku der heqê dexl û zadê de hêzeke hevrikîker çêbûye û digel ku pembûyeke bi kalîteya bilind tê hilberandin jî, ji bo pembûyê depoyên bi lîsans tune ye û hatiye derbirîn ku ev yek pirsgirêkeke giring e.

Di vî barî de, sazîyên pêwendîdar, xebatên xwe yên di asta fizibîlîteyê de temam kirine. Ji bo depoyeke bi lîsansa pembûyê ku nêzikî 11 milyon Euro lê diçe, lêgerînên fînansmana navneteweyî didome. Depoyên bi lîsans, êdî di warê bazarê berhemên çandinîyê de wekî borsayê kar dikin. Loma jî, gava depoya bi lîsans hebe, pembûyên ku li gorî kalîteyên xwe hatine dabeşandin, radestî depoyê tên kirin. Ji alîyekî dinyayê, kelûmelpeydekerek jî dikare wê pembûyê ji depoya we bikire. Bihayê wê jî li gorî bazara navneteweyî tê dîyarkirin. Ji ber ku bihayên navneteweyî di ser armanca bihaya neteweyî ya cotkar in, cotkar dikare bihayekî baş ya pê qayil e, dîyar bike. Wekî din jî, bazar, di warê derpêşkirinê de berhemê dixe garantîyê. Tevî ku Amed di warê genimê ji bo miqarneyê de heta tu neêjî bes hevrikîker e jî, biha ji yên Konyayê kêmtir in. Gava depoyên bi lîsans hebin, ew cudahîya bihayan namîne. Sedema ku cudahîyên bihayan namîne û berhem li ser bihayên navneteweyî tên firotin, ew e ku berhem dikarin bi demeke zêde di depoyên bi lîsans de werin stokkirin û her wiha awantajên lojîstîk yên vê yekê jî hene. Gava wisa dibe, sertîfîkayên berhemên ku hatine depokirin, di demên ku biha di bazarê de diçe asta herî jor, dikeve tedawûlê û ev yek ji bo hilberîner awantajên giring çêdike.

4.3. Pirsgirêkên Sektorî

Divê were gengeşîkirin ku wê sektora turîzmê, ku binpêkhateya herî giring ya sektora xizmetê ye, çawa dikare ji bo bajêr bibe dînamîka xurt ya bipêşketinê. Tabloya li jêr, dikare ji bo gengeşîyên di vî warî de tên kirin, veguhere yek ji argumanan:



Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Gava em bala xwe didin para sektoran ya di nava Hilberandina Neteweyî ya Brût de heyî, tê dîtin ku Amed, bajarek e ku xizmetê dide. Li gorî jimareyên TÜİKê yên sala 2022yan ku belavbûna sektorî ya Hilberandina Neteweyî ya Brûtê nîşan dide, para sektora xizmetê ji %56 e.

HNB, Belavbûna Sektorî (2022) TI-Hezar)



Gava em berê xwe didin tabloya ku jimareyên Hilberandina Neteweyî ya Brût wekî dolar hatine hesibandin, em ê bibînin ku Amed, yekeyeke ekonomîk e ku nêzikî 8 milyar dolarî mal hilberandiye û xizmet daye. Meseleyeke hîmî heye ku jimare nîşanî me didin û em dikarin wê ji bo ekonomîya Amedê pênase bikin. Tê dîtin ku di salên 2012, 2011, 2012 û 2013yan de demajoya aştîyê hebû û vê rewşê bandora xwe bi awayekî pozîtîf daye der. Amed, di sala 2013yan de, bi 10 milyar dolarî ji Hilberandina Neteweyî ya Brût radibhure û digihîje asta zêdebûneke rekor. Di sala 2014an de ku ji alî demajoya aştîyê ve, hin paşvekişîna berbiçav tên dîtin, ekonomî derbejêr diçe û Hilberandina Neteweyî ya Brût ji 7 milyar dolarî jî kêmtir dibe. Gava em ji vî alîyî ve li meseleyê dinihêrin, em dibînin ku demajoyên sîyasî bandoreke mezin li ser ekonomîya Amedê dikin û di demên pevçûnê de, ekonomîya bajêr derbejêr diçe.

AMED-HNB-USD/Hezar



Di civînê de, yek ji mijarên ku herî zêde hat gengeşîkirin, ji bo gihîştina asta rihetîya civakî, ji hêla lojîstîkê ve, analîzkirina Amedê ye. Heke Amed, ji hêla bihayê lêzêdekirî ve ku sektora xizmetan diafirîne/wê biafirîne, were nirxandin, dibe ku ev yek ronîyekê bide ser bajêr. Berî 15 salan, DTSO û Şaredarîya Bajarê Mezin ya Amedê, projeya wê çêkir û Ajansa Bipêşketin Qerejdaxê ava kir û bi fînansa ku ji vê projeyê hat bidestxistin, fîzîbîlîte û binesazîya projeya Gundê/Herêma lojîstîk hat avakirin û dibe ku ev yek bibe hêmaneke giring ya bipêşketina bajrê. Amed xwedî destînasyoneke bi awantaj e û di bazara Rojhilata Navîn de şûneke xwe ya navendî heye û ev hemû ew nîşane ne ku giringîya xebatên lojîstîk didin der. Amed, dikare li ser avanîya hevrikîker ya ku berê wê bi hêla sanayîya çandeyîyê ye, bibe navendeke giring ya lojîstîk. Gava bajar bibe navendeke lojîstîk, wê ev yek bibe sedem ku bibe navendeke stratejîk ku kontrola zincîreya peydekirina kelûmelan jî. Gava xizmetên bi bihayên lêzêdekirî yên wekî depokirin, veguhastin, venêrîn û çavnêrî, zincîra sar, depokarîya bi lîsans, qadên stokkirinê, karên sîgorta û gumrikê û hinekî jî xizmetên pakêtkirin û ambalajkirinê, di navendên lojîstîk de bên dayîn, wê ev yek bajêr mîna marqayekê bi pêş de bîne. Ji hêla herêmên lojîstîkê ve, pêşnîyaz tê kirin ku bajarê Verona yê Îtalyayê, bi taybetî, ji bo modêlê were nirxandin. Ji ber ku Verona, navenda lojîstîka hundirî (lojîstîka bejayî) ye û herêmek e ku berhemên wekî mermer, madenkarî û berhemên çandeyî lê tên birêvebirin, veguhastin û peydekirin, ev yek dike ku ji bo Amedê bibe mînakek.

Du pêkhateyên sereke yên sektora xizmetê turîzm û hinarde ye û gava di ser van her duyan re em lê binêrin, bi taybetî awantaja bi danberhevî ya Amedê ya li ser Kurdistana Başûr, dibe ku bibe sedem ku liveke giring bide xwe. Hinardeya sala 2023yan ya Amedê ketiye binê 250 milyon dolarî lê di sala 2021ê de bûye 300 milyon dolarî. Bi danberhevîyekê em bala xwe bidin vê jimareyê; HNB ya Tirkîyeyê nêzikî 900 milyar dolarî ye, hawirdya wê jî nêzikî li derdora 250 milyar dolarî ye. Gava li rêjeyê tê xistin, tê dîtin ku ji %30yê HNB ya Tirkîyeyê ji hinardeyê çêdibe. Gava em bi heman korelasyonê bala xwe bidinê, divîya hawirdeya Amedê bibûya 2,5 milyar dolarî ku HNB ya wê 8 milyar dolarî ye. Lê belê, Amed, 10 car di binê jimareya hinardeyê de dimîne. Bajarê Amedê, ji alî sektora hinardeyê ve bi hêsanî dikare xwe bigihîne welatên wekî Kurdistana Başûr û Çîn, loma jî divê serê pêşîn ev welat ji nêzik ve werin analîzkirin.

Yek ji mijarên giring ku di civînê de hat behskirin ev bû; jimareyên hinardeyê yên Amedê, ji ber awantajên avanîya lojîstîk ya li Xabûrê li wê derê tê bi gumrikkirin loma jî hinardeya Amedê, di envantera Mêrdîn û Şirnexê de tê nivîsîn. Xebatên li ser meseleya, divê binesazîya lojîstîk ya ji bo hinardeyê li bajêr were avakirin û hinarde ne li ser cîyê ku li wir gumrikkirin tê kirin lê divê wekî jêderka hilberandinê di envanterê de were nivîsîn, temam bûn û ji îsal û şûnde, wê jimareyên hinardeyê li ser bajarê ku lê hatiye hilberandin werin qeydkirin. Pêşbînîyek li ser vê guherînê heye ku dibêje, wê bi taybetî di jimareyên sala 2024an de, zêdebûneke mezin çêbibe.

Bazirganîya ku bi Kurdistana Başûr re tê kirin, hem wekî pirsgirêkek hem jî wekî fersendekê hatiye pênasekirin. Li gorî derbirîna fîrmayên ku tenê hinardeyê dikin, ji ber dijwarîyên ku ji mewzuata hinardeyê û burokrasîya gumrikê ya li ser sînor, pest li ser hinarde çêdibe, bi taybetî jî, ji ber ku di bazirganîya derveyî ya bi Iraq/Bexdayê re di ser rêya behrê re tê kirin, loma jî dijwarî çêdibe ku hinarde xwe di ser Xabûrê re bigihîne Iraqê. Hat derbirîn ku hengavên li ser van mijaran û çalakîyên lobîyê bi encam bûne û dîsa wê ev yek bi awayekî erênî di jimareyên sala 2024an de bide der û bi taybetî, bi Entab û Mêrdînê re hevrikîyeke giring ya hinardeyê li dar e.

Tevî ku bajarekî wekî Entab heye û xweyî awantajên hevrikîkirin û hilberandinê ye jî, gelek xebat hatine kirin da ku di xeta Hewlêr, Silêmanî û Amedê de bazirganî bi pêş bikeve û ji bo ku hevkarîya kar û hêzê were kirin û wê encamên vê xebatê di siberojê de bi awayekî şênber werin dîtin. Xebatên lobîyê yên ku Amed dike ne tenê ji bo zêdebûn û lezgirtina hinardeyê ye, di heman demê de, hewl tê dayîn da ku hevrikîya Hewlêr û Silêmanîyê li hevkarîyê were veguherandin. Hevrikîya di navbera Hewlêr û Silêmanî de heyî, dike ku di navbera du bajaran de mekanîzmayên hevkarîyê saz nebin û bi taybetî jî dibe sedem ku Îran bazara Silêmanî di destê xwe de bihêle.

Ne tenê Îran, di van salên dawîyê de, Ûrdin û Libnan jî bûne partnerên çalak yên bazara Kurdistanê, loma jî, divê li ser portfoyên bazirganîyê yên van her du welatan û pircureyîya berhemên wan xebat werin kirin. Gava mirov ji alî beşên hinardeyê bala xwe didiyê, mirov dibîne veguhastinên herî giring ji berhemên giran yên wekî mermer pêk tên. Der heqê mermerê de, ji ber ku bi salan in ev kar tên kirin, pirsgirêkên giring çênabin, lê digel vê yekê, pêwîstî pê heye ku di sektora xurek û kîmyayê de dijwarî werin birêvebirin. Ji bilî vê, der heqê hesin û metalên ji bilî hezin de, hatiye dîtin ku di hinardeyê de pêşketin çêbûne. Krîterên ku di xurek û kîmyayê de hatine anîn, ji hêlekê ve jî bûne ew astengên ku ji derveyî tarîfeyê ne. Ji ber karên teskirin û kalîbrasyonê yên li derîyên li ser sînor burokrasî û lêçûn zêdetir dibin, ev yek dibe sedem ku bazirganîya derveyî welat di ser behrê re were kirin. Tercîhên di vî warî de ji alî hikûmeta Bexdayê ve tên kirin û ji bo heman berheman daxwazeke wisa ji Îranê nayê kirin; sedema vê yekê jî ew e ku her du welat wekî sîyasî nêzikî hev in... Ji bo çareserîya vê pirsgirêkê, divê di ser hikûmetan re an jî di ser rêyên bazirganîyê re, rêbazên pêwendîdanîna bi Bexdayê re were peydekirin.

4.4. Pirsgirêkên Di Sektora Sanayîyê De

Tevî ku di demên dawîyê de para sanayîyê ya di nava HNB ya Amedê de zêdetir bûye jî, ev zêdebûn nedi asta tê xwestin de ye. Li tabloya li jêr, li gorî daneyê dahatinê ya TÜİKê, ji %13ê dahatina ku bajêr bi dest dixe, li ser sanayîyê ye. Amed, ji alî cografîk û lojîstîkê ve navendeke giring e. Pirsgirêkên ku nahêlin potansîyela xwe bi tevayî li kar bixe, ji alî beşdarên civînê ve bi awayekî kitekitî hatiye analîzkirin.

BAJAR(2022)	Çandinî	Sanayî	Sanayîya Hilberînê	Avahîkarî	Xizmet	Tevde
Amed-TL	19.867.217	16.174.140	8.343.101	9.989.402	69.250.395	123.624.255
%	16,07%	13,08%	6,75%	8,08%	56,02%	100,00%

Hatiye derbirîn ku sedema sereke ya di sanayîyê de pêngaveke tê xwestin nayê avêtin ew e ku binesazîya sanayîyê têrî nake û di vî warî de, bi taybetî ranêzikîya neyînî ya birêvebirina navendî wekî bendek e. Binesazîya sanayîyê tenê nayê wateya rêya bejayî, veguhastina hewayî, xeta trênê û gihîştina keştîgehê, ev hemû jî hêmanên pir giring in; lê belê "çêkirina parselên sanayîyê" giringîyeke xwe ya jîyanî heye û pê re jî, ji bo ku polîtîkayên handanê yên ji bo herêmê bi awayekî erênî bi encam bibin, serê pêşîn divê ji bo razemendên ku ji derveyî bajêr tên, cî werin terxankirin. Ji ber ranêzikîya neyînî ya birêvebirina navendî û ji ber ku şaredarî kirin parçeyekî birêvebirina navendî, dibe sedem ku ji derveyî vîna bajêr û li ser bajêr biryar werin girtin. Erdên ku divîya wekî parselên sanayîyê bi Karacadağ OSBê ve bihata kirin, kirin qada TOKİyê û ev yek mînakek e ji bo ranêzikîyên neyînî. Vê gavê Karacadağ OSB, xweyî 178 parselên sanayîyê ne û ji bo razemenîyê 300 serîlêdan kiriye; ev yek ji alî beşdaran ve wekî daxwaz û eleqeyeke zindî hatiye nirxandin, lê belê tevî ku birêvebirina navendî hay ji vê eleqeya zindî heye jî, dixwaze qadên sanayîyê bike qadên nişîngehê û ev yek ne ji bo siberoja bajêr e lê ji bo rant û berjewendîyan e.

Bal pê hatiye dayîn, sedema ku ji razemenîyên sanayîyê havil nayên girtin, pêkanînên handanê ne; tevî ku hrêma 6an, di handanê de wekî qada pêşîn hatiye destnîşankirin jî, bi hin ranêzikî û pêkanînan handan ji mebestên xwe hatine averêkirin. Di vê deqbendê de; razemenîyên stratejîk yên wekî hilberandina dermanan, li ku derê çêbibe jî, ji handana herêma 6an havil digire, loma jî, ger derman li bajarên wekî Stenbol, Enqere û hwd., werin çêkirin jî, handanê ew digirin û herêm bi tevayî ji derveyî vebijêrkê tê hêlan.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Li jorê, hatibû pêşnîyazkirin ku divê derbejorçûna ku di sektora turîzmê de ji bo Mêrdînê çêbûye were analîzkirin û ev rewş wekî rol modêl were lêkolînkirin. Di warê sanayîyê de jî, giring e ku bal li ser mînakên Entab û Batmanê bin. Di nav dahata sala 2022yan de, para sanayîyê ya Entabê ji %45 e ya Batmanê jî ji %26 e. Gava hevberî tê kirin, li gorî navînîya Tirkîyeyê, Entab ji %60, Batman jî ji %35 li xwe zêde kiriye. Mirov dikare modêla sanayîyê ya Entabê, ku wekî Çîna biçûk tê binavkirin, lêkolîn bike. Lê belê, tê pêşnîyazkirin ku Batman ji hêla demografîyê ve wekî Amedê ye û di van demên dawîyê, di warê sanayîyê de pir xweş li xwe zêde kiriye, loma jî divê serê pêşî ev serketina Batmanê were lêkolînkirin.

Li gorî hesabên dahatê yên sala 2022yan, Batmana ku hejmara şênîyên wê 600 hezar e û dahata ku ji, sanayîyê bi dest xistiye, li gorî sala 2021ê, 3 car li xwe zêde

kiriye û ji 6 milyar TLyê bûye 18 milyar TL û serketineke baş daye der û di nava heman serdemê de, ji dahata sanayîyê ya Ameda ku hejmara şênîyên wê 1 milyon 800 hezar e, bihurîye. Ranêzikîyeke din ya ji bo çareserîyê ew e ku ji bo ku handanên ji bo herêma 6an ji mebesta xwe neyê averêkirin, dikare stratejî werin dîyarkirin û çalakîyên lobîyê bên kirin.

Digel OSByan, ji bo ku KSS jî karibin destekkirinên fînansmanî yên wekî KOSGEBê bi dest bixin û bi pêş bikevin, divê polîtîkayên çalak werin meşandin. Her wekî, wan erdan ku wekî parselên sanayîyê hatibûn terxankirin lê belê birêvebiran xwest ku wekî qada TOKİyê werin bikaranîn, lê bi çalakî û stratejîyan ew erd, car din, wekî qada sanayîyê hatin bidestxistin, divê ranêzikîyên biryardar û tirûşdar yên wek wê werin nîşandan.

4.5. Pirsgirêkên Di Ranêzikîyên Aborîya Nû De

Ji bilî ranêzikîyên klasîk, giring e ku em di ser têgihên nû re jî gengeşî li ser bajêr bikin. Di salên destpêka 1980yî de, Alvin Tpffler dibêje, "İnternet, ne tenê navgînek e, lê ekosîstemek e." Em niha hem di nava wê ekosîstemê de dijîn hem jî bûne parçeyekî wê ekosîstema ku di wan salan de hatiye texmînkirin. Gelo em dikarin vê ekosîstemê bi çi rengî biguherînin da ku ji bo bajarê me bibe tiştekî wisa ku nirxeke bi bandor diafirîne? Ev pirs heq dike ku em hûrgerîyê li serê bikin.

Têgiheke pir xurt ya wekî "civaka zanînê" tev li wan ferazîyan bû ku em di ser têgihên civaka çandinîyê û civaka sanayîyê re dikin. Ranêzikîyên tûj yên ku mal û cihê kar ji hev cihê dikin, êdî ne têbor in. Dinyayeke nû heye li ber me. Em bi sîstema jîrahîya çêkirî yên wisa re bûne parçeyek ji gerdûnekê ku ew sîstem azmûna derçûnê ya hiqûqê ya zanîngeha Harvardê bi pileyeke jortir didin. Internet bû toreke wisa ya otobanê ku ji hemû malan derbas dibe û em jî entegreyî wê bûne. Divê di vê civînê de gengeşîkirina tiştên nû, wekî encameke giring ya civînê were nirxandin.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Gava jimareyên HNBê yên Amedê hê bi kitekitî tê analîzkirin, tê dîtin ku bi taybetî di dahatên li ser zanîn, ragihandin û nivîsbarîyê de zêdebûneke xuya bi ber çavan dikeve. Gava em bala xwe dibin ser "zanîn û ragihandin", "fînans û çalakîyên sîgortayê" û "çalakîyên xeyrîmenqul"ê ku yek ji binhêmanên HNBê ne, em dibînin Amed, bi awayekî aşkere ji bajarên herêmê cuda dibe, tew jixwe gava bi jimareyên hemû Tirkîyeyê re tê hevberkirin jî, xuya dibe ku wekî rêjeyî zêdebûnên giring çêbûne. Ev geşedan didin xuyakirin ku Amed, wê hê zûtir li sepandinên wekî teknolojîya komputerê, bazirganîya li ser internetê û sepandinên din entegre bibe. Gava ev potansîyela ku di çapana xwe de geşe dide xwe were destekkirin û ji welatên wekî Hîndistanê, ku bernamenivîs dişînin hemû derên dinyayê, pisporên nivîsbarîyê werin anîn, dibe ku ji bo Amedê bibe sedema bipêşketineke pir baş.

Hat derbirîn ku KOSGEB, bi taybetî der heqê destekkirina teknolojîyê de hin navgînên nû afirandine, li ser navê destekkirinên cuda 13 beş hene û di van demên dawîyê de, polîtîkayên xwe yên destekkirinê li gorî hilberandina asta teknolojîk ji nû ve bi rêk û pêk kiriye. Berê destekkirinê, ji qadên teknolojîya nizm bi hêla qadên teknolojîya navincî û jorîn ve bûye. Zêdetir jî berê xwe daye alîyê hilberandina makîneyan, elektrîk, elektronîk, nivîsbarî, kîmya, berhemên dermangerîyê, berhemên tibê, berhemên aromatîk yên tibî, hilberandina dermanan û hwd., ku wekî qadên teknolojîya bilind tên binavkirin.

Li jêr, dahatên "zanîn û ragihandin"ê hatiye dabeşkirin ku ji daneyên TÜİKê hatine girtin. wisa xuya dike, Amed di vî warî de heta tu bêjî bes hevrikîker e. Bipêşvebirina vê potansîyelê û destekkirina fîrmayên ku di warê zanîn û ragihandinê de bihayê lêzêdekirinê çêdikin, giring e. Gava dahatên zanîn û ragihandinê bi awayekî jimareyî tên analîzkirin, bihayê lêzêdekirinê ku Amed diafirîne, 2 car zêdetir e ji tevdehîya Riha û Mêrdînê û ji %20î zêdetirî Entabê ye. Heke bajarekî wekî Entabê ku navenda sanayî û bazirganîyê ye û razemenîyeke giring bo vedîtinê (inovation) dike û bihayê lêzêdekirina wê li gorî Amedê hindik e, nexwe ev yek nîşaneya hevrikîkerîya Amedê ye.

ZANÎN RAGIHANDIN

Sal	Amed	Entab	Riha	Mêrdîn
2004	144.933,00	80.572,00	61.353,00	14.598,00
2005	181.830,00	100.739,00	79.018,00	18.490,00
2006	218.349,00	119.129,00	84.707,00	20.994,00
2007	257.909,00	141.803,00	99.234,00	24.444,00
2008	276.380,00	156.049,00	103.949,00	27.694,00
2009	288.505,00	154.678,00	115.544,00	27.948,00
2010	313.196,00	143.924,00	127.616,00	32.143,00
2011	305.798,00	140.280,00	114.507,00	37.935,00
2012	270.936,00	154.834,00	100.524,00	27.891,00
2013	275.437,00	151.327,00	106.177,00	31.190,00
2014	287.222,00	140.109,00	88.483,00	29.115,00
2015	309.121,00	161.834,00	98.679,00	32.789,00
2016	332.772,00	180.358,00	124.295,00	35.395,00
2017	386.369,00	211.153,00	120.139,00	45.023,00
2018	437.670,00	240.234,00	152.018,00	48.652,00
2019	529.422,00	248.966,00	169.012,00	58.801,00
2020	644.714,00	289.661,00	154.332,00	46.074,00
2021	1.102.773,00	425.817,00	241.514,00	66.969,00
2022	1.209.063,00	955.083,00	483.076,00	103.446,00

4.6. Lidervehêlana Şaredarîyan ya Ji Qada Aborîyê

Ne tenê di civîna navend 4 de ku li ser aborîyê ye, di 3 civînên dîtir de jî, yek ji pirsgirêkên giring ku hat bilêvkirin ew e ku; şaredarî bi pêkanînên qeyûm bi tevayî ji kar hatiye xistin û bûye parçeyekî birêvebirina navendî û ji derveyî qada sosyalî, sîyasî û aborîyî hatiye hêlan. Ji hêlekê ve hewl tê dayîn ji bo ku dînamîkên hur yên bajarekî li tevgerê bê xistin, ji hêla din ve, qada aborî li birêvebirina navendî û li dewletê tê radestkirin û loma jî, gelek dijwar e ku dînamîkên cihkî di şertûmercên birêvebirina pevçûnî de li tevgerê were xistin.

Digel ranêzikîyên ku peywirekê li birêvebirinên cihkî bar dike, dîtina ku dibêje; "peywirên şaredarîyan ya ji bo bipêşxistina ekonomîk" tune ye, loma jî ne rast e ku wateyên giran lê werin barkirin, kargînîyên sereke yên şaredarîyan, zengîntirkirina avanîya çandî û sosyalî ya bajêr e û hewldanên bipêşketinê ji karên hikûmeta navendî ye; wekî dîtineke dijber hatiye gengeşîkirin. Beşdarekî din jî dîyar kiriye ku gelek pêkanînên ji bo bajêr ji hêla şaredarîyan ve tên kirin, "bajarekî bêşaredarî sêwî ye" û ew ê ji hêzeke pir mezin bêpar bimîne û gava bê qebûlkirin ku ev hêz destkarî li aborîyê neke, wê ev yek were wateya ku pêkanînên birêvebirina navendî tên qebûlkirin.

Hatiye dîyarkirin; Şaredarîya Stenbolê 17 kargehên xwe yên aborîyî hene, ev kargeh malên erdhejê çêdikin, berheman dikirin û destekê didin kooperatîfan, şaredarîya Îzmîrê jî tevkarîyê li bipêşketina kooperatîfên jinan dike. Sedema qeyûmavêtina ser şaredarîyan, her wekî dewlet dibêje, ji hinceta "têkilîya rêxistinî" wêdetir e û dixwaze di ser şaredarîyan re nehêle dînamîzma ekonomîk ku di kakilê bajêr de heye çêbibe û "asîmîlasyona aborîyî" li xwe dike armanc.

Daxwaz, Bendewarî û Pêşnîyazên Çareserîyê

Hat gotin, şaredarî berpirs in ji birêvebirina bajaran û divê ji alî ekonomîyê ve bi bajêr re bibin ye û çalakîyên di vî warî de li gorî qanûnê ye, herçî şaredarîya ku çalakîya ekonomîyê nakin, peywira xwe jî bi cih nayînin. Di vê çarçoveyê de, hat gotin; Şaredarîya Stenbolê 17 kargehên xwe yên aborîyî hene, ev kargeh malên erdhejê çêdikin, berheman dikirin û destekê didin kooperatîfan, şaredarîya Îzmîrê jî tevkarîyê li bipêşketina kooperatîfên jinan dike. Sedema qeyûmavêtina ser şaredarîyan, her wekî dewlet dibêje, ji hinceta "têkilîya rêxistinî" wêdetir e û dixwaze di ser şaredarîyan re nehêle dînamîzma ekonomîk ku di kakilê bajêr de heye çêbibe û "asîmîlasyona aborîyî" li xwe dike armanc.

Piranîya beşdarên civînê, li ser wê bawerîyê mane ku divê şaredarî çalakîyên aborîyê bikin. Qanûna Şaredarîyan ya bi hejmara 5393yan jî aşkere destnîşan kiriye ku şaredarî dikarin kargehên di nav bûtçeyan de ava bikin, şîrketan ava bikin an jî di nav şîrketekê de çalakîyan bikin û tev li jîyana ekonomîk bibin. Ji bo ku qadeke tevgerînê ji bo şaredarîyan were çêkirin, di xalbenda 18an ya heman qanûnê de, tê gotin, ji peywirên meclîsa şaredarîyan e ku;

"*Bi kargeha di nava bûtçeyê de, li ser xalbenda 6762yan Qanûna Bazirganîyê ya Tirkan dikare hevparî û hevkarîyan ava bike, ji hevkarîyê derkeve, ji bo zêdekirina sermîyanê û avakirina hevparîya razemenîya xeyrîmenqulê biryarê bide*" û bi vî awayî tê aşkerekirin ku heke pêwîst bike, şaredarî wê karibin di warê ekonomîyê de, di ser kargehan re çalakîyan bikin. Lê belê, ji bo ku di nava bûtçeyê de kargeh were avakirin, biryara dawî ji Wezareta Hawirdor û Şarevanîyê re hatiye hêlan û di vî warî de înîsîyatîf maye bi destê birêvebirina navendî. Di çarçoveya van gengeşîyan de, derbirana herî şênber ya ku ji alî beşdaran ve hatiye gotin, hevoka "asîmîlasyona ekonomîk" e.

‘DI XIZMETÊN CIHKÎ DE ÇI JI DESTÊ AMEDÊ DIÇE’

Moderator: Sedat Yurtdaş- Cîgirê Serokê DİTAMê

Em wekî DİTAMê, digel avanîya civaka sivîl û nêzikî 80ê sazgehan, nexşerêyek û ajandayeke ku em ê digel raya giştî bişopînin çêkir. Em hay jê hene ku me xebateke wisa kiriye ku ew ê ronîyê bide ser tespîtkirin û çareserkirina pirsgirêkan, loma jî her çend me kurteya xebatê nivîsîbe jî, ji ber ku mijar piralî ye, pirsgirêk pir in û ranêzikîyên ji bo çareserîyê bi hûrgerî tê kirin, derpêşî bi dirêjayî hatin nivîsîn.

Şaredarê Bajarê Mezin yê Îzmîrê Tunç Soyer ku yek ji mêvanên me yên biqedr e, şaredarek e ku berê jî hatibû Amedê. Wekî din jî, Îzmîr bajarekî metropolî ye ku gelek taybetîyên wê hene û Tunç Soyer şaredarê wê ye. Ji bo ku li ser ezmûneyên xwe û li ser tiştên ku li vê derê hatin gotin, em gotinê dispêrin Birêz Tunç Soyer.

5. Ezmûneya Îzmîrê ya Di Birêvebirinên Cihkî De

Tunç Soyer- Şaredarê Bajarê Mezin yê Îzmîrê

Serê pêşîn ez spasîya xwe li we dikim. Ez dixwazim bêjim, civîneke hejmetkar e û wisa dest bi axaftinê dikim. Di her pêşkêşîyê de min dît ka çendî kedeke safî hatiye dayîn. Ez dixwazim spasîya xwe li her hosteyek ku pêşkêş kir û li pisporan bikin.

Gava pêşnîyaz li min hatibû kirin, min ji xwe re gotibû, heywax, ka ez çi dizanim pirsgirêkên Amedê çi ne, ez ê çi bêjim ji wan re. Ez qilqilîbûm ku bibim ew kes ku nizane mala dawetê li ku ye radihêje kevçîyê. Paşê, bi her axaftinê re hat famkirin ku ji min tê xwestin ku ez ji alî rojavayê ve li van demajoyan binihêrim û binirxînim. Loma jî, ez ji xwe re fikirîm, ez dikarim behs bikim ka me li Îzmîrê, li pêşberî pirsgirêkên hevreng çi çareserî peyde kirin û ez ê karibim hin parvekirinan bikim ku ew ê bestê bidin demajoya ku li vê derê tê meşandin û belkî jî karibin bibin mînak û modêl.

Serê pêşîn ez vê bêjim: Ez wisa difikirim ku di nava Amed û Îzmîrê de pêwendîyeke xurt heye. Îzmîr Ameda rojavayê ye; Amed jî Îzmîrî rojhilatê ye û di nava her du bajaran de tiştên hevpar gelek in. Her du bajar jî naxwazin li ber hêza desthilatê çok daynin. Her du bajar jî ji ber vê sedemê berdêlan didin. Û her du bajar jî qayîlî nadin vê berdêlê. Her du bajar jî, bajarên wê çandê ne ku li ser pirrengî, pirdengî û pirnefesîyê teşe girtiye. Li her du bajaran jî nanakirin û dijberî çandeke xurt e. Li her du bajaran jî bingeheke hilbijêran ya pir rexnegir heye. Û her du bajar jî, ji bo

bajarên din yên li Tirkîyeyê, ew bajar in ku meraqa wan tê kirin û bi çavekî hêvîdar li wan tê nihêrtin. Loma jî, ez wisa bawer dikim, divê hevparîyên di nava van her du bajaran de heyî bi pêwendîyên nêzik werin xurtkirin.

Ez pêşî dixwazim der heqê demajoya qeyûmê de çend tiştan bêjim. Di serdema qeyûman de, ez ne şaş bim, qeyûmê pêşî avêtibûn ser (şaredarîya) Sûrê. Ez jî wê çaxê şaredarê Seferihisarê bûm û bi Şaredarîya Sûrê re pêwendîya bajarên dest-birakîyê danîbû û roja ku qeyûm avêtibûn serê, min li meydana Konakê daxuyanîya çapemenîyê dabû. Min di wê daxuyanîya çapemenîyê de ev gotibû: 'Meseleya qeyûmê, qeyûmavêtin biryareke sîyasî ye lê rewabûna wê ya hiqûqî jî dikeve ber gengeşîyê.' Ji ber ku her pergala qanûnî dibe ku rewabûneke wê ya hiqûqî hebe. Li vê derê bipergalkirineke qanûnî heye lê bi ya min rewabûna wê ya hiqûqî tune. Ji ber ku li gorî rewabûna hiqûqî, gava we şaredarek ji kar avêt divê hûn ji meclîsa şaredarîyê kesek di şûna şaredar de hilbijêrin. Heke hûn vê nakin, nexwe hûn rewabûna hiqûqî ji navê hildidin. Bi kurtayî, ez wisa difikirim ku meseleya qeyûmê, têkoşîneke sîyasî jê re divê lê di heman demê de têkoşîneke hiqûqî jî jê re divê. Û sed korayî, ez wisa bawer dikim ku ev têkoşîn têrî xwe nehatiye kirin.

Bi kurtayî, ez dibînim, meseleya qeyûmê, li Tirkîyeyê, li ser rewabûna hiqûqî meseleyeke li ber gengeşîyê ye. Ji ber ku wisa ye, em dibînin pirsgirêkên giran li bajar û bajarokên ku qeyûm avêtine wan deran, çêdibin. Bi taybetî li Amedê, di dawîya demajoya qeyûman de, dikarim bêjim; em nikarin tiştên ku qewimîne tenê bi nirxên ekonomîyê derbibirin. Di pêşkêşîyan de pir xweş hat gotin. Bajarek, deh sal berê qewareya wî ya ekonomîyê 10 milyar dolar e lê ji %30yê wê ji dest çûye û bûye 7 milyar û kisûr; ev yek jî bi me dide zanîn ku her kesê ku li vî bajarî dijî, di jîyana xwe ya rojane de bi awayekî neyînî bandor ji vê yekê girtiye. Di axaftinan de jî pir xweş hat gotin; ne tenê ji alî nirxên ekonomîyê ve, ji alî jîyana çandî û sosyalî ve, ji alî jîyana rojane ya jinan, zarokan, ciwanan ve, ji her alîyê ve bûye sedem ku gelek tiştên giran û mezin ji dest biçin.

Baş e, wekî encam, wê ev çîrok çawa were çareserkirin? Dîmeneke wisa heye û ev dîmen, dîmeneke pir giran e û wisa xuya dike ku wê wisa jî bikude. Baş e divê mirov çi bike? Bi ya min, gelê Amedê, hûn, li ser vê yekê çareserîyeke pir hêja dibînin. Ev çareserî jî, ew çareserî ye ku di ser civaka sivîl re teşe digire. Encamên ku ji ber neçalakbûna şaredarîyê çêdibin, hûn diqilqilin, difikirin û dibêjin, 'em wekî civaka sivîl dikarin çawa tije bikin vê valahîyê? Em dikarin çawa ji navê rakin?' Li vê derê xebatên pir giring tên kirin. Ev hevdîtinên li ser aqilê hevpar, bi rastî jî pir hêja ne. Bi vê hevdîtina aqilê hevpar, hem der heqê tespîtkirina pirsgirêkan hem jî der heqê çareserîyên li ser wê de, pir aqil derketiye rastê û bi van aqilên pir re jî gelek alîyên hevpar hatine qefaltin.

Divê ev yek were kudandin. Gelo ji bo mezinkirina wê gengaz e? Û çawa? Gelo em ê karibin vê bi çi awayî berbelavtir bikin û divê gavên çawa werin avêtin û rahêlanên çawa werin kirin ku bandorê li mekanîzmayên biryardayînê bike? Divê li ser van werin sekinandin. Ev yek jî di dawîyê de min tîne ser pênaseya demokrasîyê.

Ez wisa difikirim ku kêmanîya herî mezin tunebûna demokrasî ye û ji ber ku demokrasî tune ye an jî ji ber van valahîyên di demokrasîyê de heyî, ev tişt diqewimin.

Demokrasî, her wekî em hemû pê dizanin, ne ew tişt e ku mirov pênc salan carekê here ser sindoqê. Demokrasî awayekî jîyînê ye û em dizanin ku ev yek, yek ji vedîtinên herî mezin yên mirovahîyê ye ku li dinyayê kiriye. A rast, em pê dizanin, îro ro, hemû desthilatên otorîter û populîst yên li dinyayê ji bo ku ji demokrasîyê dûr bikevin, wekî manîvela tên bikaranîn. Baş e, wê çaxê divê çi û çawa bê kirin? Em dikarin li dijî van desthilatên totalîter û populîst, demokrasîyê çawa bi pêş xînin û bi taybetî jî em dikarin li herêman demokrasîyê bi çi awayî berbelavtir bikin? Divê em li ser vê yekê bixebitin. Divê serê pêşîn em qebûl bikin ku tiştên ku li vê derê diqewimin, ev demajoyên ku li hemû dinyayê li dar in, ne ji ber qelsîyên demokrasîyê diqewimin. Divê em bala xwe bibin serê, belkî jî di sepandina li ser bicîanîna demokrasîyê de, hin pirsgirêk hene.

Loma jî, divê em hin qadên demokrasîyê vekin. Wekî mînak, demokrasîya ekolojîk, yanê heta îro, mirovan tenê li ser maseyê hişê xwe dida ser xwezayê lê êdî em hatin qonaxeke wisa ku divê em xwezayê li ser maseyê bidin rûniştandin. Demokrasî digel xwezayê, bi xwezayê re li hevkirî, belkî jî wekî çawa em behsa mafên mirovan dikin, em hatine qonaxeke wisa ku divê em behsa mafên xwezayê jî bikin. Wekî çawa em serwerîya hiqûqê ji bo mirovan difikirin, divê êdî em serwerîya hiqûqa xwezayê jî daynin ser maseyê. Bi heman awayî, divê em li ser demokrasîya ekonomîk, yanê divê em li ser wan modêlan bixebitin da ku gel bibe kirdeya hilberandinê.

Helbet demokrasîya sosyal, wekî xebateke wisa xuya dike ku em ê karibin pêkanînên demokrasîyê li zemînê berbelav bikin, em ê pêkanînên demokrasîyê yên ku piştgirîya kedê, piştgirîya hilberandinê dikin, bi pêş xînin û ev xebat hemû, herî zêde dikarin bi pêşengîya civaka sivîl werin kirin.

Li Îzmîrê tiştek hebû ku me ew wekî 'çanda çerxdar' bi nav dikir. Ez dixwazim behsa wê bikim ji we re. Ez wisa difikirim 3 wateyên çandê hene. Ya yekem, li ser navê çandê, em dikarin kategorîyeke wekî wêje, huner û muzîkê bêjin. Ya duyem, em dikarin bêjin, çand, tevdehîya hemû nirxan e ku li qadeke cografîk û di dem û çaxeke dîyar de komî ser hev bûne. Ev pênaseya çandê, arkeolojîyê jî, dîrokê jî li xwe digire. Wekî din jî, çand tê wateya 'asayîya jîyananê.' Yanê çanda kuvarkê. Ji bo çewlikên ku lewrekê xweyî dikin, tê gotin, masîyê çandê. Ji bo kuvarkê tê gotin, kuvarka çandê. Çima? Ji ber ku şertûmercên lêhatî hatine amadekirin da ku ew karibe bijî û li wê derê kuvark tê danîn, li wê derê masî tê xweyîkirin. Ji bo asayîya jîyana wan jî çand tê gotin. Bi kurtayî, em ji bo sernava sêyem ya çandê dikarin bêjin; asayîya jîyanê, an jî navbereke şertûmercên lêhatî yên jîyanê. ME ji vê pênaseya çandê, ji van sernavên çandê da ser rê û tiştekî wekî çanda çerxdar pênase kir.

Çanda çerxdar, pênaseyeke wisa ye ku li ser çar stûnan hatiye danîn. Ya yekem; lihevkirina bi xwezayê re, ya duyem; lihevkirina bi hev re, ya sêyem; lihevkirina bi borîroja me re, ya çarem; lihevkirina bi guherînê re. Pênaseyeke çandê ye ku li ser van çar stûnan hatiye danîn û di ser lihevkirinê re hatiye pênasekirin.

Me di Şaredarîya Seferihisar de pênaseya vê çanda çerxdar dabû destpêkirin û me di Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê de jî kudand. Me çawa kudand? Qasek berê behsa pîlaneke stratejî hati kirin. Ji serî de em lê fikirîbûn ku divê du sernavên stratejîk hebin. Ya yekem, divê tiştê ku hûn dikin, gerdûnî be. Yanê, heke hûn tenê di bin banê xwe de û bi dînamîkên xwe re pîlaneke stratejîk destnîlan bikin, hûn ê kêmanîyeke giring bihêlin. Divê hûn bizanin ku pîlana stratejî di heman demê de bi awayekî gerdûnî jî têbor e. Ji bo wê jî, armancên bipêşketinê yên kudbar ya Neteweyên Yekbûyî ji bo me kaxizekî berbiçav yê turnusolê bû. Her wekî hûn dizanin Neteweyên Yekbûyî, her 15 salan carekê armancên xwe yên bipêşketinê dadixuyîne. Di navbera salê 2000-2015an de, bi navê 'Armancên Bipêşketina Hezar Salan' 8 armanc hatibû destnîşankirin. Di navbera salên 2015-2030yî de jî Neteweyên Yekbûyî 17 armancên bipêşketinê yên kudbar destnîşan kirin.

17 armancên ku wê heta bi 2030yî bikudin, di heman demê de, wekî armancên ku ji bo hemû mirovatîyê divê werin pêkanîn hatiye gotin. Em jî, wekî Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê, me armancên NYê, wekî derzaneka pîlana xwe ya stratejîk qebûl kir. Gava em ji dînamîkên taybet, ji hewcetî û kêmanîyên taybet yên Îzmîrê bidin rê gelo em ê li ser navê çanda çerxdar dikarin çi tev li vê bikin? Me bala xwe da ser vê yekê û di encamê de pîlana stratejîk ku me danî rastê, ji hêlekê ve, xweyî rehendeke gerdûnî bû. Bi armancên bipêşketina stratejîk yên Neteweyên Yekbûyî re li hev dikir. Ji hêlekê ve jî, dînamîk, hewcetî û kêmanîyên hundirî yên Îzmîrê li xwe digirt. Me ji vê derê da ser rê û bi sernavê çanda çerxdar, armanên lihevkirî dîyar kirin. Me xwest bila tiştê ku em dikin hem bi armancên bipêşketina kudbar re hem jî bi têgiha çanda çerxdar re li hev bike. Me hemû gavên xwe sehîtî kir ka bi wan re li hev dikin an na, heke ne lihevkirî bûya, me dev jê berdida.

Her wisa, ez wisa difikirim ku pîlana stratejî ji bo Amedê jî pir giring e. Ev xebat, ev hevdîtinên li ser aqilê hevpar, tespîtkirina pirsgirêkên ku li vê derê didin der, pêşnîyazên bo çareserîyê, divê hemû di nav pîlaneke stratejîk de cî bigirin. Ev pîlana stratejîk, şaredarîyek hebe jî tunebe jî, ji bo sazîyên civakî dikare bibe nexşerêyeke ku dikare were şopandin û sehîtîkirin.

Bi kurtayî, pêwîst e ev xebat veguhere ser pîlaneke stratejîk. Ez wisa difikirim ku ev pîlan di heman demê de, ji bo her kesî wê bibe pîlaneke ku dikare were sehîtîkirin û şopandin. Ev e tiştê ku bo cara pêşî dixwazim bêjim.

Meseleya civaka sivîl, belkî jî pêngaveke wisa ye ku Amedê dike cîyekî tirûşdar. We daye ser rêwîtîyeke hêja ji bo ku hûn valahîya ji ber van demajoyan çêdibe, tije bikin. Divê ev yek were mezinkirin û berbelavtirkirin. Dijberîya sivîl ya civakî, belkî jî divê em wê biguherînin dijberîya yekgirtî ya civakî, banê wê berfirehtir bikin û hê zêde sazîyên sivîl tev li wê bikin...

Bi taybetî ez dixwazim bala we bibim ser van çar sernavan. Jin, perwerdehî, hawirdor û bobelat. Ev çar sernav, ne tenê li Amedê, li hemû Tirkîyeyê, ji bo sazîyên civaka sivîl û li pêşîya partîyên sîyasî û mekanîzmayên sîyasî ne û rêber in ji bo wan... Belkî jî wê gengaz be em li ser van her çar sernavan xebatê geştir bikin û hemû

hevparan di bin banê van her çar sernavan de bînin cem hev, bi wan re banê heyî berfirehtir bikin, qadên xebatê yên hevpar biafirînin û mezin bikin.

Wekî mînak, behsa meseleya erdhejê û meseleyên bobelatên din tê kirin. Vê gavê, ji ber vê krîza avhewayî ya gerdûnî, em hemû hay jê hene ku êdî encamên krîzê bandorên xwe tenê li cografyayên ji me dûr, nake. Hat asteke wisa ku bandorê li jîyana rojane ya me hemûyan dike. Lehîyên mezin radibin, şewatên mezin çêdibin, bobelatên giran diqewimin û ev hemû encamên krîza avhewayê ya gerdûnî ne. Ji ber ku em dizanin, krîza avhewayê ya gerdûnî, tê wê wateyê ku em êdî di gêrestêrkeke nexweş de dijîn. Di gêrestêrkekê de ku xweşîya wê ji dest çûye, tu jîndar nikare bi xweşîya xwe bijî. Loma jî, em bêgav in li dijî vê yekê bajarekî tirûşdar, gundekî tirûşdar, taxeke tirûşdar, welatekî tirûşdar ava bikin.

Belkî jî divê em vê yekê wekî armanca xwe ya pêşî destnîşan bikin. Dîsa ez ji derveyî têkilîya hikûmet-şaredarîyê dibêjim. Em bêjin, em ew mirov in ku li bajêr dijin. Divê xema pêşî ya mirovên ku li vî bajarî dijîn, afirandina bajarekî tirûşdar be. Ji bo ku em bibin ew bajarê tirûşdar, wekî mînak, divê em dilyarên bobelatan pêk bînin. Me ev li Îzmîrê kir. Li Îzmîrê 1293 tax hene. Di van 1293 taxan de, me digel keyayên taxan, tîmên ji 10 kesan pêkhatî, çêkirin. Paşê me ew perwerde kirin û wan jî dest pê kir şênîyên taxê perwerde kir. Bi vî awayî, di esasa xwe de, gava li taxeke ji van 1293 taxan bobelatek çêbibe, em êdî dizanin ka wê taxên li dorhêla wê taxê çi bikin û keya û şênîyên wê taxê çi bikin.

Sê rehendên van meseleyên bobelatan hene. Yek jê berîya wê, yek jê di dema wê de, yek jê piştî wê. Em wisa fikirîn ku divê tişt hebin ku em di van her sêyan de jî bikin û me li ser wan her sêyan amadekarîyên xwe kirin. Me xebatek li ser tespîtkirina xetên fayê kirin. Xebateke ku wekî xebata dabeşkirina mîkro tê binavkirin. Me bi 10 zanîngehan re li hev kirin. ji van 10 zanîngehan, bi 84 akademîsyenan re, me hewl da ku bi kareyên 200 metre li 200 metreyî, fotografan bigirin. Çima? Ji ber ku vekolînên ji bo tespîtkirina xeta fayê yên MTAyê kiriye, di salên 1970yî de mane û ne rojane ne.

Me biryar da ku divê em serê pêşîn wan bikin agahîyên rojane. Piştî wê jî, ji bo ku qarneya ewlekarîyê ya avahîyan tespît bikin me bi Odeya Endezyarên Înşaatê re li hev kir û me bi endezyarên ciwan re, qarneya ewlekarîyê ya 100 hezar avahîyê çêkir. Piştî wê jî, xebata ku me di bilyarên bobelatan re kiribû, li 1293 taxan belav kir û em li ser xebitîn ka divê di gava erdhejê de, di gava bobelatê de çi bikin. Wekî mînak, me ji bo gundên daristanan tankêr kirîn. Me pergalên biçûk danîn ser wan tankêran da ku karibin ava fişarlêkirî bipijiqînin. Me ew radestî keyayan kirin. Bi vî awayî, bi dehan şewat, berî ku berbelav û mezin bibin, di wê gavê de, bi destlêwerdana wan dilyarên bobelatan, hatin vemirandin.

Bi taybetî, di wan bajaran de ku kêmanîyên şaredarîyan hene, divê civaka sivîl bi zanîngehan re, bi odeyên pîşeyê re hevkarîyeke baş çêke. Ji ber ku ji bo ku civaka sivîl pê rabe, agahîyên zanistî pêwîst in. Di heman demê de, bi odeyên pîşeyê re hevkarî pêwîst e ji bo ku ew zanîn were pêkanîn. Ev hevkarî wê derfetê çêkin da

ku platform û sazîyên civaka sivîl, çareserîyên wan peydekirî, li ser hîmeke zanistî daynin, wê veava bikin û nexşerêyan li ser wan agahîyan çêkin û wê bi cî bînin.

Loma jî, pêşnîyaza min ya yekem pîlana stratejîk bû. Pêşnîyaza min ya duyem, heke em bi awayekî şênber derbibirin, divê bi zanîngehan û bi odeyên pîşeyan re hevkarîyeke xurt were kirin. Protokol û hevpeymanî werin çêkirin, hewcetî bi wan heye. Ji ber ku di her qada jîyanê de civaka sivîl hewceyî agahîya zanistî ye. Ne tenê civaka sivîl, di esasa xwe de, hewcetîya şaredarîyê jî heye. Lê li cîyekî ku lê kêmanîya şaredarîyê heye, ev hewcetî pir mezin e. Loma jî, pêşnîyaza min ya duyem ya berbiçav ev e; divê teqez bi zanîngeh û odeyên pîşeyê re têkilîyên xurt werin danîn û werin kudandin.

Ez yek du pêşnîyazên biçûk yên berbiçav bêjim. Belkî em ê karibin piştre, bi pirsên ku wê bên kirin, di kûr de biçin. Mehmet Aslan, li ser demokrasîya ekonomîk, pir xwe derbirand. Kêmanîyên di meseleya tevdehîkirinê de, serwerîyên danberhevî yên der heqê hilberandina çandeyî de, wî yek bi yek ew jî pênase kirin. Wekî mînak, meseleya nîskan. Nîsk, tiştekî pir bi qîmet e, mesela ez xeyalekê dikim; divê li Amedê aşxaneyên nîskan hebin. Dibe ku nîsk bibe navgîneke baş da ku Amed bibe marqe û biçe ser têgihaneke dîtir.

Hat behskirin, gava em dibêjin Amed, dibe ku nîsk an jî heft cureyên genimên endemîk bên bîra me. Nanên ku bi van geniman tên çêkirin... Wekî mînak, tu kes bi van nizane lê gava pê bizanibin jî wê her kes fam bike çendî hêja û giring in. Dibe ku li ser van xebat werin kirin an jî dibe ku li ser pembûya organîk jî xebat were kirin. Divê van qadên ku yên serwerîya hevberîyê ne rast werin tespîtkirin û pêngav werin avêtin da ku ev qad di raya gîştî de bibin nêrînên pozîtîf û ji bo Amedê bibin pêngavên bipêşveçûnê, bipêşketinê. Divê em nehêlin ev fût biçe.

Wekî din jî, tespîteke pir balkêş heye. Cudatîya wê ya li dinyaya ragihandina agahîyê û nivîsbarîyê, serwerîya wê ya danberhevî... Bi ya min mînakên wê yên li dinyayê yên pir xweş hene. Li Îrlandayê, li Hîndistanê, encamên weisa deranîn ku ekonomîyên welatan guherandin. Belkî jî wê seqaya ku ji ber vê jêparbûnê û ji ber kêmanîya şaredarîyê çêbû û xwe bi xwe tirûşdarî afirand, ev encam jî deranî. Loma jî, çêtir e mirov li ser vê bixebite. Nexwe, van ciwanan, van zarokan, ji bo ku dekevin derveyî vê jîyana çewsîner û sînorker, zext li şîyanên xwe kirine û karibûne tiştên xweş daynin rastê. Nexwe, mirovên aqil, sazîyên civaka sivîl yên Amdeê, hûn bixwe, divê li ser bifikirin ka der heqê ciwanan de dikarin çi bikin. Ez wisa difikirim ku ev tişt dikarin bibin ew pêngavên ku asoyê firehtir dikin, hişê mirovan vedikin.

"Bajarekî bêşaredarî sêwî ye" Belê tespîteke felaket e lê belê divê ev yek nebe bêhêvîtî. Em baş dizanin ka zarokên sêwî dikarin çi bikin. Belê, bajarekî bêşaredarî sêwî ye lê belê dikare ruhekî dîtir ya tirûşdarîyê jî çêke. Jixwe hûn bi wî ruhî dijîn. Ne hewce ye ez bêjim lê belê divê ev yek nebe bêhêvîtî.

Her wekî min di serî de jî got, di rastîya xwe de, hemû bajarên li Tirkîyeyê, bi meraq şopa du bajaran digerînin; yek jê Amed, yê din jî Îzmîr e. Bi tevî her tiştî jî, hûn wekî

Amed, divê hûn vê hêvîyê mezintir bikin. Ji ber ku em, mirovên ku li derveyî Amedê dijîn, em li Amedê dinêrin û li hêvîyê digerin. Ev ne tenê tiştekî bi we re eleqedar e. Kirinên we êdî ji bo me jî encamên ku hêvîyê kêm dikin an jî zêde dikin, didin der. Bi kurtayî, "bajarekî bêşaredarî sêwî ye" lê belê ev yek ne dawîya dinyayê ye. Berevajîya wê, divê em berê xwe bidinê ka ji vê rewşê dikare tiştekî çawa yê nû biafire, ew tişt dikare çawa were mezinkirin, divê em bala xwe bidin ser vê yekê. Bi destûra we ez ê di vê qonaxê de axaftina xwe bibim serî. Heke pirsên we hebin ez hewla bersivandina wan bidim.

Sedat Yurtdaş

Birêz şaredar, gelek spas bo we. Axaftineke danberheva Amed û Îzmîrê bû; hem ji hêla alîyên wan yên hevpar ve hem jî nîşan dida her du bajaran di borîrojê de tevkarîyeke çawa li hev kirine û ew ê siberojê de karibin tevkarîyeke çaw ali hev bikin. Bi pirs û şiroveyên ku wê paşê bên kirin, wê ev mijar berfirehtir bibe.

A niha, ez gotinê dispêrim yek ji şaredarên berê yên Şaredarîya Bajarê Mezin ya Amedê, Birêz Feridun Çelik. Digel van axaftinan, wî bi xwe jî piştî ezmûneyên ku lê qewimîbûn, pêngaveke pir giring avêtibû, bi destûra we ez ê wê bînim bîrê. Bi rastî jî, paqijkirin û vekirina derdora sûran, demajoyeke wisa bû ku bi dîyaloga bi gel re dabû destpêkirin û tevî ku bicîanîna wê ne gengaz dihat xuyakirin jî, hat bicîanîn. Wekî din jî, hem ji bo binerdê hem jî ji bo sererdê razemenî kir, ev jî zêde nehat famkirin. A rast, ji ber ku dizanim nehat famkirin, min xwest bînim bîra we jî. Ez axaftinê dirêj nakim, birêz şaredar, gotin ya we ye.

6. Ezmûneya Şaredarîya Bajarê Mezin ya Amedê ya Di Birêvebirinên Cihkî De: 1999-2004

Şaredarê Bajarê Mezin yê Amedê yê Berê Feridun Çelik

Serê pêşîn, rêz û silav li beşdaran. Demeke pir zêde tê re derbas bû. Nêzikî 20 sal in di ser dema şaredarîya min re bihurî. Bi rastî jî, sala 1999an ji bo me demajoyeke pir çetin bû. Her wisa, em ji alî azmûna demokrasîyê ve ketibûn nav demeke giring. Wê hingê, gelek hevalên li vê derê wê bi bîr bînin, di sala 1994an de, sed korayî, ji ber hincetên sîyasî, ji ber êrîşkirin û çewisandinên giran, xwedîyên esasî yên vî bajarî nikaribûn xwe di şaredarîyan de temsîl bikin. Ji ber ku di wê demê de, mebûsê me Sedat Yurtdaş jî hebû, me digel birêveberîya partîyê, biryara boykotê girtibû. Her wiha, li hemberî vîna gel, wê hingê, me jî şaştî kiribû.

Demajoya ku divîya di sala 1994an de dest pê bikira sed korayî di sala 1999an de dest pê kir. Helbet gelek heval seqaya sala 1999an dizane. Belkî ji ber temenê xwe, ji ber nifşbûnê hin heval nikarin bînin bîra xwe, lê şansekî me jî çênebû ku em soz û belênên xwe yên li ser birêvebirinên cihkî ji gelê xwe re bêjin. Destûr nehat dayîn da ku em mitîngekê jî çêkin.

Di şertûmercên wiha de jî, gelê me, bi rastî jî, bi fîdakarîyeke mezin, piştgirî da me. Bendewarîya civaka me, bendewarîya herêmê, bi taybetî li ser çareserîya meseleya Kurdan bû. Ji vî alîyî ve jî, wateya soz û belênên me yên ku me yê li ser birêvebirinên herêmî, li ser xizmetên cihkî ku me yê bikira, nedigiha gel. Lê helbet gava em hatin ser birêveberîya cihkî, me amadekarîya vê yekê kiribû. Em bi sloganeke wekî "Em ê xwe jî bajarê xwe jî bi rê ve bibin" hatin. Bi rastî jî, ev slogan pir watedar bû. Bi ya min, hevokeke wisa bû ku dikaribû bibe dînamîka hîmî ya demokrasîyê. Li ser vê wateyê jî, bi fîdakarîyeke mezin, bi tevkarî û piştgirîya gelê me, şaredarîya Amedê, di navbera salên 1999-2004an di dîroka Tirkîyeyê de, rûpeleke dîtir vekir; hem di warê çand hem jî di warê hunerê hem jî di warê parastina şûngehên dîrokî û bikaranîna wan hem jî di warê çareserkirina pirsgirêkên binesazîyê de...

Helbet, demajoya sîyasî û seqaya çêbûyî jî bandora xwe li van yekan kir. Bi taybetî, agirbesta ku di sala 1999an de hat kirin û xebatên ji bo demajoya aştîyê, kiri ku bipêşketin çêbibin der heqê ka siberojeke nû ya li Tirkîyeyê, wê karibe di ser cihkîbûn û herêmîbûnê re, siberojeke nû ji bo demokratîkbûna Tirkîyeyê ava bike û têkilîyên cihkî û navendî dikarin bi çi awayî werin sazkirin, pêşketinên li ser van yekan dan der. Di vê wateyê de, gelek hevdîtinên me çêbûn bi hikûmeta navendî ya wê demê re. Me bi Serokkomar Birêz Süleyman Demirel re hevdîtin kir. Hin hevdîtinên me digel û bi çavdêrîya hikûmetê jî çêbûn. Bifikirin, di wê demê de, Bahçeli serdanek bo Amedê kir û di wê demê de seqayeke sîyasî ya cuda çêbû û vê seqayê, bi rastî jî, nîşan da ku gengaz e ku hin tişt ji nû ve werin avakirin. Di vê wateyê de, em jî, wekî birêveberên cihkî, awantajeke me çêbû. Me şans bi dest xistin û me di demeke zû de gelek projeyên xwe bi cih anîn.

Bi rastî jî, di vî warî de, piştgirîya gelê me pir mezin bû. Me di xebatên binesazîyê de, 3 meh, 5 meh, kuçeyên bajêr serûbinê hev kir, lê nankirinek, dijberîyeke pir biçûk jî ji gelê me negihîşt me û berevajîya wê wan piştgirî da me. Ji ber ku binesazî ew war bû ku pir bi problem bû û pirsgirêkên gel zêdetir dikirin. Bi rastî jî, gel, xwedîtî li xizmetên ku wê demê hatin kirin, kir. Nirxên me yên herî mezin û giring, Sûrên me, Keleha Amedê, hatibû dagirkirin. Dagirkirineke ecêb mezin hebû. Divîya ev der bihata paqijkirin.

Ez dikarim wiha bêjim: Di salên xwendina zanîngehê de, xeyala min bû. Gava ez û hevalêkî em digerîyan, min jê re wiha got: 'Heke ez bibim şaredar'... Hevalê min avahîyên li hember nîşan da û got, 'Ez ê van avahîyên tepkirî ji vir rakim.' Min jî got, 'Heke ez jî bibim şaredar, karê pêşî ku ez ê bikim, ez ê her tiştî ji ber û ji bin Sûran rakim.' Erê, li min bû qismet û em di vê yekê de bi ser ketin. Gava em bi ser diketin, tevkarîya ji %90ê civakê û rêxistinên civaka sivîl pir mezin bû. Di wê demê de, tesîseke pir xweş ya Cemîyeta Rojnamegeran hebû li bin sûran. A rast, pir zêde eleqeya xwe bi sûran jî nedikir. Lê serê pêşîn wan destê xwe kir bin bar û bi vê piştevanîyê me serketinên mezin bi dest xistin. Di vê wateyê de, ji salên 1990î û şûnde, rêxistinên civaka sivîl û sîyaset, di warê sîyasetê de, di warê birêvebirinên cihkî de, pir xweş hevkarî kirin.

Helbet piştî sala 1999an, hewldanên xurtkirinê hê bêtir çêbûn. Yek ji van, xebata Yerel Gündem 21(Rojeva Cihkî ya 21) bû. Ev xebat bi awayekî beşkî bi ser ketin. Piştî dema min, HEP, HADEP û bi navên piştî wê, partîyên ku berdewama tevgereke sîyasî bûn û her roj bi darazandin û girtinê re rû bi rû diman û hevalên me xebat berdewam kir. Heta bi sala 2016an, bi rastî jî, li vî bajarî, der heqê guherîn, nûbûn û vekirina qadan de ku wê dînamîkên bajêr karibin tev lê bibin, bipêşketinên baş û bêhempa çêbûn. Sed korayî, sîstema qeyûmê ya piştî sala 2016an, di sala 2019an de hevalê me Selçuk Mızraklı, ji bo demeke pir hindik, ji bo 4 mehan, hat ser birêvebirinê û jixwe di vê demê de tiştekî ku bê kirin jî tune.

Qeyûmavêtin, bi tevayî bû pêkanînek ku hemû nirxên bajêr, bîr û hafizeya wî û her tiştê wî serûbinê hev kir. Ev away pêkanîn, mînaka wê li tu dera dinyayê tune ye. Du serdem, sê serdem? Armanc çi ye? Birêz Tunç Soyer jî armanc destnîşan kir. Heke di vî warî de sûcekî serokan, şaredaran hebe hûn ê wan bigirin û darazînin. Meclîs heye. Meclîs wê di nava xwe de serokê xwe hilbijêre. Lê belê, ev bajar, bi awayekî ku mînaka wê li tu dera dinyayê tune ye, dûçarî sîstemeke teşabetî, dûçarî sîstema qeyûmê bû. Ev heşt sal in, sed korayî, ev bajêr, bi vê ferasetê tê birêvebirin. Ev bajar vê heq nake. A rast, me ji 10 milyar dolaran ku Mehmet Aslan jî behs jê kir, fam kir kua aştî çendî watedar e.

Gelo karmendekî dewletê dikare dest bide ruhê vî bajarî? Gelo gengaz e ku zimanê van kuçeyan bizanibe, bîr û hafizeya kuçeyan, dîroka wan bizanibe? Ne gengaz e. Sed korayî, em di pergaleke wisa de dest bi demajoyeke nû dikin. Em ne bêhêvî ne. Ev tirûşdarî her tim li Amedê hebû û wê her tim jî hebe. Heke di serdema din de jî tewesûlî tiştekî wiha bê kirin jî, ev bajar xweyî wê hêzê û wan derfetan e ku karibe xwe bi rê ve bibe. Jixwe civaka li vê derê nîşaneya wê yekê ye. Hêza me heye ku em çarçoveyeke 10 car ji vê mezintir daynin.

Ez bi vê hîs û fikiran, car din spasîya xwe dibêjim ji we re. Heke pirsên we hebin, ez ê hewlê bidim ku bibersivînim. Spas.

Sedat Yurtdaş

Gelek spas, Birêz Serok. A niha jî, ez dixwazim ji bo her du pêşkêşîyan jî, dîtinên beşdarên hêja hîn bibim. Gava tê gotin, Diyarbekira Qedîm, gelek nivîskar hene, lê hevalê me Şeyhmus Diken, der heqê çand û Diyarbekir de, an jî der heqê mijarên din jî de, serê pêşîn tê bîra mirov. Gelek nivîskarên Kurdî û entellektuelên Kurd jî hene lê bila Lal Laleş xwe amade bike, em li benda tevkarîyên wî ne jî.

7. Tevkarî û Pirsyar

Şeyhmus Diken

Ez dibêjim, spas bo serok Tunç jî serok Feridun jî. Min di navbera salên 1999-2004an de şêwirmendîya çand û hunerê ya serok Feridun kir. Lê belê, piştî 25 salan jî, min şêweirmendîya neyekser ya serok Tunç kir. Bi vî awayî; li Îzmîrê, ez şêwirmendê fuara pirtûkan ya Îzmîrê ya 1. û 2. Bûm. Ez ji Amedê çûm û min şêwirmendî jê re kir. Wekî din jî me di pêşaneya Ahmet Güneştekin de hev dîtibû. Ez wekî vexwendîyê pîreka eta Ayşe û Tunç Beg tev li Sempozyuma Yaşar Kemal bûm ku 3 roj berdewam kirin.

Li vê derê tiştekî balkêş û dîrokî heye, xuyakirinek heye. Serok Feridun, di sala 1999an de, yanê bi temamî berîya 25 salan, Serokê Şaredarîyê bû û bi rastî jî, her wekî wî behs jê kir, demeke pir dijwar bû. Dem pir dijwar bû û Feridun Çelik piştî demeke kurt ku wek serok hatibû hilbijartin, hatibû girtin. Ew 4 rojan girtî ma. A rast, wan digot qey ew ê bi demeke zêde wî di hepsê de bihêlin. Lê belê, xwedîtîlêkirineke ecêb çêbû li bajêr. Li pêşî girtîgehê, bi hezaran mirov li hev civîyan û bertekên xwe nîşan da. Piştî çar rojan Feridun Çelik wekî qehremanekî ji hepsê derket. Serok jî qasek berê awayê xwedîtîlêkirinê behs kir. A rast, xwedîtîlêkirina bajêr û gel tiştekî wiha bû. Lê çi qewimî? Ka hûn li bêbextîya felekê, gava qeyûm hat avêtin, me nekarî heman eleqe ji bo Doxtor Selçuk Mızraklı nîşan bidin. Xwedîtîlêkirineke pir qels hebû. Ev yek ji ber polîtîkaya çewisandinê bû ku pir dijwar û bi tundûtûjî bû.

Alîyekî her du serokên me, hem yê Feridun Çelik hem jî yê birêz Tunç. Soyer heye ku li wir digihîjin hev û min jî eleqedar dike. Ew alî ev e ku; her du jî der heqê polîtîkayên çandê de bi zanavên xwe yên marqeyî tevdigerin. Serok Feridun, wisa kir ku ji hêla dîrokî û çandî ve xwedîyên wan sûran, pişta xwe bidin kevirê bazaltê û wê mirêsdarîyê bibînin. Ev zanaveke marqe bû.

Ya duyan, tiştekî nekirî bû. Di dema Feridun Çelik de, li vî bajarî, festîvalên çand û hunerê hatin kirib. Wê bê bîra serok Feridun, mufetîş hatibû ji bo lêpirsînê. Ji ber ku di koordînasyonê de bûm, gazî min jî kirin. Wan pirsî û got, 'Erê, me fam kir hûn bi duzimanî çêdikin. Baş e, ev Suryanîkî, Ermenîkî, Erebî, Îngilîzî ev ziman ji ku hatin, we çima hewcetî bi wan dît?' Min wiha bersivand. 'Birêz mifetîş, ev pirs pirseke pir xerab û ne di cih de ye. Ger şaredarîyek, ji bajarê xwe ya ku ji çandên wî yên dîrokê were... Ji ber ku berîya 150 salan, li vî bajarê, du şaredarî hebûye. Tiştekî wisa bifikirin ku Sûrê ji navê dike du par. Li hêleke wê şaredarê Ermenî, li hêla din jî şaredarê Kurd. Em behsa bajarekî wisa pirzimanî û pirzanavî dikin. Heke şaredarek, birêveberîya şaredarîyekê, li bajarekî wisa, şarevanîyeke pirzimanî nekin, wê hingê divê hesa ji wan bê pirsîn.' Wekî encam, hewcetî bi lêpirsînê nedîtin, spas kirin, me çayek jî da wan û ew bi rê kirin. Wê hingê, mifetîşên milkîyeyê yên wisa hebûn.

A niha, piştî gelek salan, li Îzmîrê, birêz Serok Tunç Soyer, ket xema afirandina zanaveke wek ya vê derê û pir tiştên xweş kirin. Ji ber wê jî, ez gotina birêz Tunç

Soyer ya; Îzmîr Ameda li rojhilatê ye, Amed jî ya li rojavayê ye, wekî tespîteke pir di cih de û pir baş dibînim. Divê em ji vê derê silavekê bişînin ji bo Abdullah Demirbaş jî ji ber ku Şaredarîya Sûrê bi şaredarîya Seferihisar re wekî şaredarîyên destbirak nirxand. Gotineke xweş ya Serokê şoreşa Gineyê, Amilcar Cabrul heye. Wiha dibêje; "Serhildana neteweyî bi hebûna çandî dest pê dike." Aha em îro, li vê derê, ji ber wê hebûnîya çandî digel hev in. Ya min ne pirs bû, lê bû tevkarîyekê. Ez jî yek ji avakarên DİTAMê me û ez vê hevdîtinê wekî hevdîtineke dîrokî qebûl dikim.

Lal Laleş-Nivîskar

Merheba ji we hemûyan re. Gelek caran li Kurdistanê û li gelek bajarên Tirkîyeyê min xwe bi du zimanan derbirand. Gava li Îzmîrê jî biaxivim, li Wanê jî biaxivim, ez fikirên xwe li gorî bendewarîyên guhdaran nabêjim û lê nafikirim ka ew ê çi bêjin. Ez li gorî bawerî û wijdanê xwe dibêjim fikirên xwe. Bi bawerîya min, berî her tiştî, divê bajaek zimanê xwe, di nava civakîbûna xwe de biaxive. Gava em berê xwe didin Amedê, 30 sal in ez li vî bajarî dijîm. Li Tirkîyeyê pir hindik kes bi zimanê xwe difikire. Fikir, dawîya dawî, bi gotinan, bi danûstandina fikiran, bi hevokan çêdibe. Mirov xwe bi gotin û hevokên xwe ve derdibirin. Mirovên ku bi zimanê xwe difikirin nikarin li her derê biaxivin û tu kes tu tiştekî ji wan napirse. Dibe ku di nava wan de çend mînak û rewşên îstîsnayî hebin. Lê bi piranî rêxistinên civaka sivîl, sazîyên fermî û sazgehên fermî vî tiştî napirsin. Heke rewşenbîrek, nivîskarek an jî mirovek xwe bi zimanê dayika xwe derbibire, pirs çi dibe bila bibe, jîyana me tenê ji meseleya Kurd pêk nayê. Pirsgirêka vî bajarî ne tenê Kurdî ye. Pirsgirêkên ekolojîk, pirsgirêkên civakî û gelek pirsgirêkên wî hene. Ji ber ku li vê derê wekî kêmanîyekê dida der min xwest balê bibim serê.

Tiştekî din jî, bi ya min heta niha Kurdan behsa pirsgirêkên esasî nekir. Em bêjin, kesek tê girtin, wî diavêjin hepsê û ceza lê dibirin. Em jî di ser van kesan re hevokên xwe saz dikin. A rast, tiştê ku divî em karibin bêjin, wekî mînak, divê meseleya makeqanûnê be. Divê em bêjin, ev meseleya makeqanûnê, ne tiştekî rewiştî ye, ne mirovane ye û divê ew were guherandin. Lê em dibêjin, ka nizanim filankes ji hepsê berdin... Meseleya me ne kes in. A rast, tiştên ku divê werin guherandin, rewşa demokrasîyê ye ku em tê de ne. Pirî caran, em di ser kesan re meseleyan gengeşî dikin, em behsa pirsgirêkên esasî nakin.

Tiştekî din jî, mesela em di ser meseleya perwerdehîyê re diaxivin. Her kesê li vê derê perwerdehîya bi zimanê dayikê dixwaze. Lê ji bo ku Kurdî, di dibistanên dewletê de, wekî derseke vebijarkî were dayîn, hewcetî bi vê heye. A rast, ev yek ji bo zarokên vî bajarî tiştekî baş e. em çi qas vê meseleyê gengeşî bikin jî, pirî caran, ji ber ku dîtinên me yên sîyasî, ji ber fikirên me yên li dijî hev, em rastîyê û heqîqetê ji bîr dikin. Em eksê û dijberîyê li hev dikin. Berdêla vê yekê, ji bo vî bajarî, van zarokan û vî zimanî pir giran dibe.

Mesela ez behsa çandê bikim. Ez ê pir aşkere bêjim. Hevalên me yên nivîskar ku

bi zimanê Tirkî dinivîsin, ji alî her kesî ve tên nasîn, tên zanîn, tew di nava wan de xwînerên wan jî hene. Êdî bes e, divê em heqîqetê ji hev re bêjin. Ka bifikirin, ji wê dema ku şaredarîyên li vî bajarî ket destê şênîyên vî bajarî, ji Feridun Çelik heta roja îro, kîngê çalakîyeke wêjeyî hat kirin, kesên ku li Tirkîyeyê wekî nivîskar hatin nîşandan, 'di nava wan de İskender Pala jî heye, Orhan Pamuk jî heye, kesên ku fikirên wan cuda ne jî hene di nava wan de', li vî bajarî, wan bi zimanê xwe got fikirên xwe. Ev kesên ku hatin vî bajarî, gava li vê derê, axaftinên xwe dikin, her wisa, gava li Bodrumê, li Îzmîrê, li Stenbolê, çalakîyeke wêjeyî were kirin, zimanên wekî Rûmî, Kurdî, Lazî û yên din jî xweyîmaf in ku fikirên xwe bêjin. Çi nivîskarên li vê derê, li sazîyên sivîlê yên li vê derê, çi komeleyên nivîskaran, di nava wan de PEN, TYS jî hene. Ew li ser vê yekê nafikirin: Çima nivîskarekî rûm bi zimanê xwe yê dayikê helbestan naxwîne? Çima nivîskarekî Kurd bi zimanê dayika xwe helbestan naxwîne? Heke em wekî nivîskar, rewşenbîr û ramanweran vê yekê bi lêv nekin, em vê neparêzin, em ji pirtûkxaneya şaredarîyekê, ya dewletekê pirsa vê yekê nekin, wê hingê, tenê wê bibe, xebatên wî yên wêjeyî hêja ne lê alîyên wî yên rewşenbîrî bi problem in. Divê em di meseleya entellektuel de bi wijdan bin. Divê em ji rengên dinyayê yên wekî Noam Chomsky, Jean Paul Sartre hin tiştan hildin.

Bi ya min, hemû rewşenbîr û ramanwerên Tirkîyeyê denydarî Amedê ne. Divê em bi awayekî aşkere vê yekê ji wan re bêjin. Ev gotin, ne tenê pirsgirêka tevgera azadîya Kurdan e. Ev meselseya AKP, CHP û MHPê ye jî. Kî dibe bila bibe, hemin ku em li Tirkîyeyê bi hev re dijîn, ev problema her kesî ye. Ev problema nivîskarekî dîndar e jî ya nivîskarekî sosyalîst e jî. Ji ber ku ev yek meseleyeke rewiştî ye. Divê em di vê meseleyê de etîkê ji bîr nekin. Piştî ku ez ev qasî bi Kurdî axivîm, ger ez niha bi Tirkî biaxivim, wê bibe ecêbek. Spas.

Sedat Yurtdaş

Em spas dikin. Ez niha ji warê çand û wêjeyê berê xwe didim ekonomîyê û realîteyê, di vî warî de, gotinê dispêrim Serokê Odeya Sanayî û Bazirganîyê Birêz Mehmet Kaya ku di heman demê de serokê avakar yê DİTAMê ye jî.

Mehmet Kaya- Serokê Odeya Sanayî û Bazirganîyê ya Amedê

Serê pêşîn ez dibêjim, spas ji DİTAMê re. Bi rastî jî, li paşperdeya xebata ku îro me kir, a rasttir, di demajoya komxebatê de, Mehmet Aslan, ku vê pêlê di heman demê de, wekî şêwirmendê odeya me yê li Enqereyê dixebite, di warê ekonomîyê de, xebateke baş kir. Pêşkêşî, xebateke têr û tije bû. Berîya hilbijartinan, behsa mijarên wisa kir ku ev bajar carinan di bin giranîya tundûtûjîyê carina jî di bin giranîya sîyasetê de dima û me ew mijar diavêtin paşguhên xwe, an jî destûr bo wan sernavan nedihat dayîn ku li ser birêvebirina bajêr, ekonomîya bajêr û bûyîna navenda dilkêşîyê ye. Lê di dawîyê de, em kîjan hejmarê qebûl bikin jî, bi wateya Hilberandina Neteweyî ya Brûtê, hem di warê kalîteya jîyînê hem jî para ku tê gir-

tin, li Tirkîyeyê, 20 bajarên dawî hemû bajarên Kurdan in. Amed jî yek ji wan e. Divê ev rewş ji alî hemû hêlan ve were gengeşîkirin û di rojevê de were hêlan. Di wê wateyê de em spasîya xwe li DİTAMê dikin. Em jî, wekî rewşeke asayî, giringiyê didin van xebatan.

Bi rastî jî, gava em bixwazin ji hêlekê ve bi bajarekî bigirin û bixwazin wî bi rê ve bibin, em dibînin ka şaredarî çendî giring in. Qeyûmavêtin, ji demokrasîyê zêdetir, xisarê digihîne jîyana bajêr, bipêşketina bajêr û çavkanîyên bajêr. Bi awayekî wisa xisarên mezin digihînin van tiştan ku şûnvegerandin û ewizîya wan jî nayên vegerandin. Ji ber ku hin welat û bajar hene ku em hevrikîyê bi wan re dikin, em nikarin derba ku pêkanîna qeyûmê li bajêr dixe, wisa bi hêsanî valahî û kêmanîya ku çêdibin, temam bikin. Ez a niha dikarim di warê şaşpêkanîn, di warê karên derengmayî de 100 mînakan bidim. Ev bajar, di 5 salan de bi 4 qeyûman r xebitî. Yek jê hilbijartî heye, ew jî 4 meh, Selçuk Mızraklı. Çar qeyûm hatin peywirdarkirin. Gava hûn ji qeyûm re dibêjin, Fîsqeya, ji bo ku hûn karibin pê bidin famkirin ku ew der deverek e, divê hûn sê caran dubare bikin.

Wekî din jî, kîjan jê tê, bi xwe re serokê daîreyan jî tîne. Her du şaredar ji me çêtir dizanin ka ev tê çi wateyê. Ji ber ku serokên daîreyan, ew ên ku tên ji derve tên, ev yek jî dibe pirsgirêkeke din. Bi rastî jî, xisara ku qeyûmavêtinê da bajêr, ew çend mezin e ku jixwe ez qet behsa gendelîyan nakim, jixwe gelek caran behsa wan tê kirin. Divê em xisara ku qeyûman daye bajêr, di van civînan de û bi awayekî rast gengeşî bikin û daynin rastê. Hûn sêwî ne, lê wekî çawa gava destê we yê rastê tunebe destê çepê hê xurttir dibe, hêzeke wek wisa çêdibe.

Spasîyeke me ya wiha heye ji bo serok Tunç. Vê pêlê, di sîyasetê de, gava hevokên wekî, xerabûna hevkarîyên berê tê bikaranîn, erê ha, bi rastî jî, heke hûn avanîyeke wisa bin ku we li xwe kiribe armanc ku Tirkîyeyê demokratîze bikin, ne tenê seroktîya şaredarîyan, bazarîyên meclîsê, we çi qas têkilî bi avanîyên wan bajaran re danî ku ji 2016an, 2017an bi vir ve ye qeyûm li ser şaredarîya wan hatiye avêtin. Beşek ji şaredarîyan, bi desteka Kurdan hat bidestxistin. Heke hûn ê demokrasîyê bikin hevpar, hûn ê nikaribin bi bajarên ku qeyûm avêtine serê re têkilîyê daynin? Me gelek zor da vê yekê lê sed korayî, tenê li Îzmîrê derîyekî wisa li me vebû. Mesela em fuarên hevpar çêdikin. Ev ne tenê wisa berjwendîyên biçûk yên beranberî hev e. Heke şaredarî tunebin jî, me dikaribû bi sazîyên li wê derê, bi STÖyan re, têkilîyên wekî wan têkilîyan danîya. Vê pêlê, me bi Hewlêrê re biryara çêkirina fuareke hevpar girt. Jixwe hevpeymanên me yên li ser çêkirina fuarên hevpar heye bi İSFAŞê re. Divê em çalakîyên çandî jî bêjin. Divê têkilîyên sîyasî rast werin birêvebirin. A niha, hûn nikarin şaredarîyeke ku vê yekê dike, bidin domandin. Lê heke ev yek tê paşçavkirin û demajo nayê domandin, a rast, pirsgirêka esasî li wê derê ye. CHP çi qas têkilî datîne bi Kurdan re? Ma nikaribû danîya?

Bi rastî jî, gava em bi sîyasetê diaxivin, civak ji me re dibêje, xwe ji paş CHPê bidin alî. Ev pir hatin gotin. Gava Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kılıçdaroğlu, ji bo civîna DİTAMê hat Amedê, ev hat bilêvkirin. Di civînê de hat gotin, têkilîyeke rast day-

nin bi civaka sivîl ya Amedê re. Çi heyf ku bi cî nehat. Îro roj jî, di demokratîkbûna Tirkîyeyê de, rewşeke parçeparçeyî çêbû ku mirov ji hev bawer nakin.

Em bi rastî jî, spasîya xwe li serokTunç dikin. Em wekî DTSO (Odeya Sanayî û Bazirganîyê ya Amedê-OSBA), herî zêde bi Serok Tunç re rihet dixebitin, bi hev re kar dikin û wî jî derî li me vekir, du caran hat herêmê û her tim jî li ser vê derê difikire û dibêje, gelo ez dikarim çi bikim li vê derê; ev yek giring e. Ev hevkarî ne tenê arizî DTSOyê ye. Nûnerên civakên sivîl jî dîtyarên vê yekê ne. Mînaka "Gelo ez dikarim bi çi awayî bi Kurdan re têkilîyê daynim" ku divê CHP li xwe bike mînak, ew awayê têkilî ye ku Şaredarîya Bajarê Mezin ya CHPyî bi Amedê re danîye. Gava ev yek çênebin, bi awayekî ji ber xwe ve, belawelatîyên sîyasî çêdibin. Spas dikim.

Sedat Yurtdaş

A niha, hevalên li salonê, yên ku dixwazin pirsan bikin, kerem kin, hûn dikarin bipirsin.

Ercan Akto-Serokê Federasyona Pêkhateyên Ne-Berastengan

Pêşkêşîyên di civînê de hatin kirin, bi temamî pir baş û bi kitekit bûn. Ji bo hemû sazîyên ku ji demokrasîyê bawer dikin û bi demokrasî têkoşînê didin, yek ji pirsgirêkên herî giring jî pirsgirêka berastengan e. Ji wan mirovan re ku organeke wan kêm e, berasteng tê gotin. Gava di demokrasîyan de organek kêm be, divê ji wê demokrasîyê bê tê gotin; demokrasîya berasteng. Ji vê û şûnde, ji STÖyên cihkî heta bi şaredarên cihkî, em hêvî dikin ew ê di hemû pîlanên xwe de, demokrasîyeke ne-berasteng û demokrasîyeke ku berasteng û nexweşên domdar jî tê de hebin, bimeşînin. Ji vê û şûnde em bajarekî ne-berasteng dixwazin.

Mahmut Özkeskin-Sekreterê Odeya Pîlankarên Bajêr yê Amedê

Ez berî her tiştî Tunç Beg dişopînim. Ji ber ku min li Îzmîrê xwend, ez li Zanîngeha 9 Eylülê ji beşa Pîlankirina Herêmên derçûm. Di demên dawîyê de, bi qasî ku mi şopand, xebateke we çêbûbû li ser kontrolkirina ava nava bajarê Îzmîrê. Kîjan beşa wê qedîya, çi kêm man? Min dixwest wê hîn bibim. Ya duyan, gelo hûn dikarin demajoya 1994an hinekî berfirehtir bêjin? Çima wê çaxê gel neçû ser sindoqê? Spas dikim.

Sedat Yurtdaş

Spas dikim. Nexwe ez pirsa 1994an bibersivînim. Wê çaxê, ez li meclîsa partîyê endam bûm. Neyînîyeke dîtir hebû an na, nayê bîra min. A rast, min dengê xwe li ser fikira ketina hilbijartinan da. Lê belê, li Amedê, gef li berendamê me yê seroktîyê

hat xwarin û e what girtin. Loma jî, di meyla giştî de, biryar hat girtin ku em nekevin hilbijartinan û protesto bikin. Me li Enqereyê, di kent otêlê de civîna xwe kiribû. Biryareke wisa ya helwesteke polîtîk hat girtin û çi heyf ku bi min jî jidestçûnek bû. A rast, bi kîjan hincetan dibe bila bibe, me potansîyeleke mezin ya wekî Amedê ji dest xwe berda. Ez dibêjim qey gava serok jî behs dikir, heman dîtin got.

Wekî din kesek dixwaze pirsê bike?

Suzan İşbilen- Komeleya Jinan ya Rosa

Ji destpêka civînê bi vir ve ye behsa demokrasîyê tê kirin lê belê rastîyek e ku demokrasî bêyî jinan nabe. Loma jî, peywira temamkirina vî parçeyê kêm, wekî seroka komeleyeke jinan, li ser min e. Ji ber ku piştî qeyûmavêtinê, pirsa "Di Xizmetên Cihkî de Çi Ji Destê Amedê Çû" pir giring e. Ji her alîyî ve ji destê Amedê çû. Bi pêkanînên qeyûm re, herî pir jî, jin ji destê Amedê çû. Em tev li civîna koma navend ya li ser jinan bûbûn û me gotibû, qeyûm hat nehat, cara pêşî çi beş û sazî hebe ku li ser jinan e, xizmetî jinan dike û jinan ji tundûtûjîyê diparêze, ew sazî girtin û betal kirin. Jixwe êdî divê em ji şaredarîyên desthilatê re ku bi qeyûman tên birêvebirin, nebêjin şaredarî. Ji ber ku ne ji armancên wan e ku xizmetî gel bikin. Ew wekî sazîyeke wîlayetê kar dikin û bûne sazîyeke burokratîk. Bi vî awayî, em dikarin bêjin, herî zêde jin ji destê bajar çû.

Bi rastî jî, tundûtûjîya li dijî jinan heta tu bêjî bes zêdetir bû. Bi taybetî qeyûm û xizanîya ku ji ber çaresernekirina meseleya Kurd zêdetir dibe, dibin sedem ku tundûtûjî zêdetir bibe. Tunç Soyer, li ser navê serokîya şaredarîyê, şarevanîyeke pir baş dike di demokrasîyê de. Ez ji ber van xizmetên wî spasîya xwe dibêjim jê re. Mesela, min di dema seroktîya Feridun Çelik de, li vê derê mamostetî dikir û dema ku me ew şaredarî bi dest xistibû jî, hatibûm sirgûnkirin. Min ancax dikaribû xizmetên şaredarîyê ji çapemenîyê û ji cihên cuda bişopanda. Bi rastî jî, şarevanîya pêşî em hemû kelecanî kiribû. Bi rastî jî keda wan pir mezin e. Ji ber keda wî jî spasîya xwe li serok Feridun dikim.

Li ser qeyûmavêtinê pir tişt tê gotin. DEM Partî li ser nehatina qeyûm, hevpeymanî çêkir. Lê belê, desthilat pêkanînên wisa anî ku wê şaredar tenê li wê derê rûnê, xizmetên din bi tevayî di destê desthilatê de ye. Ji ber vê yekê, di 26ê Sibatê 2024an de, hevberendamên şaredarîyê yên DEM Partîyê, civîneke wan ya bi navê 'divê hevkarîya şaredarî û STÖyan çawa be' hebû bi STÖyan re. Civîneke pir baş û kêrdar bû. Me li wê derê ev pêşnîyaz kiribû. Qeyûm bi rastî jî rûxandineke pir mezin kir û di destê hevberendaman de gopaleke bisêhr tune. Ew ê hema bi hatina xwe re nikaribe hemû pirsgirêkan çareser bike, jixwe derfet û mercên çareserkirinê jî tune. Jixwe li her derê wiha dinivîse: 'Ji şaredarîya Sûrê nizanim çi ber firotanê ye.' ŞAredarî hemû milkên gel firotin. Qadên xizmetkirinê yên şaredaran û hevşaredaran pir zêde teng û dijwar kir. Bi saya vê civînê her kesî encamên qeyûmavêtinê pir xweş got. Min xwest bidim zanîn, demokrasî bêyî jinan nabe û jin jî hene li vê derê, loma axivîm. Spas dikim.

Duygu Berakatoğlu-Pîskologa Klînîk/Sekretera Giştî ya DİTAVê

Li ser warê min, pirsên min hene ji her du serokan. Serok Tunç, di nava şaredarîyê û di birêvebirina cihkî de xeteke destekê ya psîkolojîk vekiribû. Gelo ji vir havileke çawa wergirtin? Qebûla mirovan çawa bû? Ez dixwazim vê bipirsim.

Di dema Serok Feridun de, ciwanên ku me ew wekî 'balîcî' bi nav dikirin, yanê yên ku tîner dikişandin û meseleyên çîrûxişkirinê pir zêde bû, paşê bi xebatên şaredarîyê kêmbûneke hêjayî gotinê pêk hat. A niha jî, em dizanin, metamfetamîn pir berbelav e. Wê hingê, we çawa kir, bi çi rêbazê serederî bi tiryakkêşîyê re kir û demajo çawa bi pêş de çû? Qet nebe, ji bo ku tev li têbinîyan bibe, ger hûn hinek agahî bidin, ez ê kêfxweş bibim.

Ji bo vê civînê jî spasîya xwe li DİTAMê dikim.

Barış Aşar-Birêveberê Giştî yê Gazeteduvar

Cara pêşî, di salên 1983-84an de, gava karkerekî Kurd yê pastaxaneya Bodrumê telefonî malbata xwe kir, wê gavê min dengê Kurdî bihîst. Karkerê Kurd dixwaze bi malbata xwe re biaxive û bi Kurdî diaxive. Kêlîya ku min Kurdî nas kir di heman demê de kêlîya naskirina min ya karkerê Kurd bû jî. Paşê, di hemû zarokatîya xwe de, di karkerên înşaatê û di xebatkarên sektora turîzmê de, li her derê rastî hêza karkirinê ya Kurdan hatim.

Lal Laleş got, 'Em nikarin herin fuarên pirtûkan yên li Îzmîrê û Bodrumê.' Beleê sedema wê ev e: Kurdî. Zimanê wî kesî ye ku xebitiye, xweydan daye û serûsincê wî qirêjî ye. Îro ro, li rojavayê, li gelek cihan Erebî çawa tê dîtin, wê hingê ji bo Kurdî jî rewşeke wisa hebû. Serok Tunç jî dizane, ew jî ji Egeyê ye, ez jî dizanim ku hê jî ew têgihîştin li dar e. Tiştên ku divê di vî warî de bên kirin ji peywira wê derê ye lê bi ya min ji peywira vê derê ye jî ji ber ku kêmanîya ku min di xebatê de dît, a rast ev e; ka di qada kedê de çi diqewime.

Me tengasîya di zimanê dayikê, di dîrokê û di hebûna dîrokî de dît lê di rastîya xwe de, cihê ku hemû tişt lê dixitimin, qadên xebatê ne. Jîyan, şertûmercên xebitînê yên wî karkerî ye ku nîskan hildiberîne. Pirs ev in; gelo qeyûm bandoreke çawa lê kir? An jî, gelo sanayîya heyî çawa dikare bigere? Karkerê ku li wir dixebite, çawa dikare xebata xwe bikudîne? Qeyûm bandoreke çawa li jîyana wî kir, bandoreke çawa li jîyana karkerekî li şaredarîyê kir? A rast min dixwest van jî bibînim. Min divê bêjim, ez vê yekê wekî kêmanîyekê qebûl dikim ku mirov dikare paşê temam bike.

Pirseke min heye ji Serok Tunç. Wî behsa wê pêwendîyê kir ku di serdema wî de di navbera Amed û Îzmîrê de hatiye danîn. Mehmet Kaya jî behs jê kir. Piştî vê, piştî we, garantîyeke çawa heye der heqê wê derê de?

Cihan Ay-Endamên DİTAM YK û Parêzer

Pirsa min jî ji Serok Tunç e. Li vê derê, der heqê hevkarîya di navbera birêvebirinên cihkî û sazîyên navendî de, pir zêde şayîş hene. Gelo, ev şayîş li ser meseleya etnîk tê famkirin? Gelo li Îzmîrê, di navbera şaredarîyan û wezaretên navendê, gerînendetîya bajêr de hevkarî, piştevanî û xebateke koordînekirî heye? Em bi gilî û gazinc in ku li Amedê tiştekî wisa hema bêje qet tune. Gelo li wê derê jî heman rewş li dar e?

Serhat Kaygısız-Weqfa Mezopotamyayê

Em weqfek in ku bi taybetî xebatên li ser zimên dimeşînin. Pirsa min, li ser zimên e û serê pêşîn ji Tunç Beg e û paşê jî ji Serok Feridun e. Ez jî demekê li Îzmîrê jîyam. Îzmîr bajarek e ku pir zêde Kurd lê dijîn. Ez dixwazim bizanibim, şaredarî di vê meseleyê de çi xebat kirine. Gelo xebatên li ser ziman tên kirin? Li Stenbolê, pir hindik be jî, li bajarekî ku ji 20 milyonî zêdetir mirov lê dijîn, hindik be jî hin sazî û hin der hatin vekirin. Lê ez dixwazim vê jî bêjim. Tevî ku ji bo zimanên din ew qas cî tê dayîn jî, gelo ji bo mirovên ji gelên din ku li Îzmîrê dijîn, derfetên wisa hatin çêkirin?

Pirsa min a din jî li ser hevpêwendîyê ye. Ji ber ku ez derçûyê Fakulteya Ragihandinê me, min xwest vê bêjim. Ji bo Feridun Beg dipirsim. Di warê hevpêwendîyê de, hin astengîyên me çêbûn bi civaka sala 1994an re. A niha jî problemên giring hene. Gava hûn ji tevgera sîyasî ya Kurdan lê binihêrin ku hûn jê hatine, gelo problema hevpêwendîya bi civakê re hê jî heye?

Sedat Yurtdaş

Ji bo birêz Serok dibêjim. Weqfa Mezopotamyayê, weqfek e ku ji bo ku zanîngehek were avakirin ku Kurdî jî tê de zimanê perwerdehîyê be hat sazkirin û ez jî hem endamekî wê yê avakar im hem jî wekî endamê desteya mutevelliyê me. A niha, wekî sazîyeke ku xebatên giring yên çand û zimanî dike û digel hemû dijwarîyan karên giring dike.

Öztekin Çaçan-Weqfa İsmail Beşikçi

Ez ne li ser navê sazîyê, lê li ser navê şexsê xwe li vê derê me. Ez dixwazim ji Mehmet Aslan bipirsim. Li Amedê, qadek heye der heqê karkerîya tekstîlê de ku divê pir li serê were sekinandin û lêkolîn li serê were kirin. Jixwe, potansîyela herî mezin ya Amedê ne tenê çandinî ye. Em hemû wê dizanin. Lê belê, ji ber ku sanîyîya tekstîl û hilbernadinê, qadeke karpêdanê ya pir berbelav e, wekî çavnêrîya kesaneyî dibêjim. Temenê kesên ku di sektora tekstîlê de dixebitin, bi gelemperî di navbera 16 û 25an de ye û ev kes, bi rastî jî bi mûçeyeke pir hindik dixebitin, bi qasî mûçeye herîkêm. Li cîyên ku ew lê dixebitin, misêwa stran tên lêdan. Ji bo ku dengûdorên zêde yên makîneyan werin tepisandin misêwa kilam tê lêxistin.. Ban-

dora tenduristîyê û hwd., ya vê yekê heye. Mirovên li vê qadê ne, têgihaneke wisa heye ku hê kes hînî wê nebûye. Hema bêje der heqê meseleya Kurdan de li tu tiştî nafikirin. Ez ji ber axaftinên wan yên bi hev re û hwd., vê dibêjim. Tiştekî bi navê qalibên berxwarinê yên fortek heye. Mesela, kesê xebatkar, bi mûçeya kêm dixebite û bi wî perê, pêlaveke marqeyî ya wekî Nike an jî tiştekî jê lukstir, telefona destan ya modêla wê bilind dikire. An jî tiştên dîtir yên cuda dikin. Tiştekî pir balkêş e.

Bi taybetî, li kargehên tekstîlê yên li devera Bismilê min ev dît. Malbat, hema bêje zarokên xwe bi kirê didin wan deran. Zarokên xwe tînin datînin ber derîyê kargehê û dibêjin, tu yê mûçeya wî an jî wê bidî min. Li Amedê, tekstîl yek ji qadên karpêdanê ya berbelav e û ez wisa difikirim ku dramek diqewime di vê sektorê de û wê ev yek bibe sedema gelek tiştan û wê gelek tiştan biguherîne. Wekî dawî dibêjim, divê şaredarî di vî warî de xebatan bikin. Spas.

Saliha Zorlu-Birêvebera Eğitim-Senê ya Şaxa 1ê

Min ê du tişt bipirsîyana. Do li DEM Partîyê jî xebateke wisa hebû. Xebateke bi STÖyan re û li ser çawabûna xebatê ya di serdema nû de bû. Min li wir jî pêşnîyaz kir. Li Tirkîyeyê, çend mînak hene der heqê birêvebirinên demokratîk, şefaf û başdar û bûtçeyên wan de: wekî li Bursayê Şaredarîya Nilüfer û Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê. Gelo bi rastî jî derfetên vê hene? Bûtçekirineke şefaf û beşdar pir giring e. Em bûtçeyeke wisa dixwazin ku divê wekhevîya zayenda civakî bide ber çavan. Em dikarin vê jî tev lê bikin. Gelo derfeta bûtçeyeke wisa heye ku hem şefaf be, hem beşdar be, hem demokratîk be hem jî li ser wekhevîya zayenda civakî pêjnkar be? Bi rastî jî, gelo pêkanînên di vî warî de hene? Ezmûneyên we çi ne di vî warî de?

Ya duyem, krîzeke avhewayê heye. Di heman demê de jî şerekî dinyayî heye û em tê de ne. Tevgereke koçkirinê heye ku ji alî rastgiran ve wekî cîguhastina mezin tê binavkirin. A niha, li her derê dinyayê şênî dilivin. Ji ber vê yekê, li cîyên ku koçkirin lê zêde livdar e an jî li cîyê koçkirinê, li cîyê ku koçber lê disekinin, krîzeke çandî jî çêdibe. Di heman demê de, pirsgirêkên sosyal û polîtîk, yên wekî pêpeskirina mafê perwerdehîyê, mafê tenduristîyê û tundûtûjîya li dijî jinan, çêdike.

Wekî mînak, Îzmîr der heqê koçkirinê de ezmûneyeke xwe heye. Di salên 1990î de, şênîyên Kurd koç kirin çûn Îzmîrê. Li Îzmîrê, pêpeskirinên mafê perwerdehîyê pir zêde qewimîn. Dîsa li Îzmîrê û li herêma Egeyê ku pir zêde karkerên demsalî diçinê, pêpeskirina perwerdehîyê û tenduristîyê heye. Jixwe perwerdehîyeke pirzimanî li Tirkîyeyê tune. Li herêma me, şênîyeke koçber li Amedê jî heye. Şênîyeke Sûrîyan û hwd., ya koçkirî heye. Bi ya min şaredarîyên me, bi taybetî, divê êdî bernameya xizmetên perwerdehî û tenduristîyê jî bike da ku karibe xizmetî şênîya koçber jî bike. Ez ezmûneya we ya di vî warî de meraq dikim. Spas dikim.

Remzi Azizoğlu- MED-DER

Ez dixwazim vê bêjim. Ez wisa difikirim ku hûn neheqî li Hülya Alökmenê dikin. Divîya we navê wê jî hildaya. Ew jî hevşaredara me bû û a niha di girtîgehê de ye.

Karê şaredarîyê ne tenê ji bo wê xizmetê ye ku jîyana me hêsantir dike. Karê şaredarîyê ji bo jîyaneke xweş û aştîyane jî tê kirin. Ev jî ancax dikare bi kesayetîyeke xurt were bicîanîn. Ev feraseta dagirker, kesayeta me jî çilvirandiye. Her kes bi ser neketiye ku kesayetiya xwe bi temamî ava bike. Ji ber hindê jî, divê şaredarîyên me xebatên ji bo xurtkirina kesayetî, hişmendî û xwebûna me bike. Ev dê çawa çêbe? Ev wê bi bihevrebûna me, bi xurtkirina ziman, dîrok û çanda xwe çêbe. Divê şaredarî di xebatên xwe de giranîyê bidin ser vê yekê. Ev yek ji bo xurtbûna kesayetîya me û hişmendîya me ye. Jixwe li Amedê, sazîyên civaka sivîl yên serketî hene ku di vî warî de dixebitin. Em ê jî li ser vê mijarê, tevkarîyên xwe lê bikin. Spas dikim.

Abdüllatif Meşe-Serokê Komeleya Pisporên Xizmeta Sosyalî ya Şaxa Amedê.

Ev 5 sal in ez di warê tiryakkêşîyê de dixebitim. Loma jî, ez dixwazim, hem di warê hişbir û tiryakan hem jî di warê ciwanan de çend agahîyan bidim serokan û pirsekê bikim. Di rûniştina yekem de, ez bi Meral Özdemir re, li ser tiryak û ciwanan axivîbûm. Ez dixwazim der heqê rewşên di wî warî de hin tiştan bêjim. Bûyerên ku tên cem me, ji ber ku em li ser herêmêm Doğu û Güneydoğu Anadoluyê dixebitin, ez ê li ser bûyerên ecêb ku ji bajarên din tên, çend tiştan bêjim. Helbet ez ê vê yekê bi şaredarîyan ve girê bidim û bipirsim.

Di civîn û raporên me yên bi navê 'Tora Zarokan' ya di sala 2018an de, min li ser bajarekî ku dostê zarokan e, raporek nivîsîbû. Helbet, ji ber ku qeyûm hat avêtin ev rapor li kar neket û wisa ma. Ez dixwazim ji Serok Tunç bipirsim; Gelo xebatên li Îzmîrê yên li ser bajarê dostê zarokan di çi qonaxê de ye, gelo hê jî çalak e, ew bi ser ketin?

Wekî din jî, di warê tiryakkêşî û alûdetîya hişbiran de çend tiştan bêjim. Xebatên ku şaredarîyên berê ji bo zarok û ciwanan dikirin, berbiçav bûn. Festîvalên ciwanan, xebatên dîtir an jî xebatên sazîyan jî tê de. Sed korayî, a niha, tu xebteke tune ji bo zarok û ciwanan. Wekî mînak, berîya 15 salan, em der heqê ciwanan de, me digot, '*gümbür gümbür* tên' lê belê, êdî ez derbirîna '*gümbür gümbür*' bi kar nayînim û wisa difikirim ku '*gindor mindor*' tên. Sed korayî, ciwan, bi awayekî ku serqûnkî bigindirin dijîn.

A niha, tiryakkêşî û alûdetîya bo hişbirê heta tu bêjî bes zêde bûye. Bi taybetî bikaranîna dermanan, wekî mînak, li gorî 10 salên dawîyê li Tirkîyeyê ji %70 zêdetir bûye, bikaranîna hişbiran jî ji %200î zêdetir bûye. Li ser vî warî tu xebat nayên kirin.

Bi taybetî, bûyerên (waqayên) ku ji bajarên din tên, rewşên sîyasî û leşkerî jî hene tê de. Gelo xebateke we ya di warê alûdetîyê de heye? Sed korayî, li vê derê, xebateke wisa tune, ciwan di rewşeke pir xerab de ne. Spas dikim.

Mehmet Aslan-Ekonomîst

Pirsa der heqê karpêdana qeydnekirî de, bi taybetî, di sektora tekstîlê de, we pirsa karpêdana qeydnekirî kir. Pirseke giring we problemeke giring e. Li Tirkîyeyê, rêjeya karpêdana qeydnekirî ya li rêjeya karpêdana qeydkirî hê jî di ser ji %30yî re ye û hê jê kêmtir nebû. Wezareta Xebitînê li xwe dike armanc ku rêjeya karpêdana qeydnekirî bîne binîya ji %30yî û hê negihîşt armanca xwe. Di sala 2023yan de, rêjeya karpêdana qeydnekirî ya li karpêdana qeydkirî %32 ye. Ev rêjeyeke pir bilind e. Di sektora tekstîlê de bilindtir e. Em di civîna koma navendî de, meseleya karpêdana qeydnekirî, di warê tekstîlê de lê jê bêtir di warê çandinîyê de gengeşî kir. Wekî din jî, ev rewş ranêzikîyeke sîstematîk û polîtîk li xwe digire. Çima ranêzikîyeke sîstematîk û polîtîk?

Ji bo ku bi kêrî têderxistinê were, du tiştan bêjim: Ya yekem, mebûsekî nêzikî desthilatê, endamê desthilatê, bi taybetî der heqê akincîyên Sûrî de, daxuyanîyeke ecêb kiribû û gotibû; 'Belê, bertek ji bo vê yekê hene, lê belê, gava em tavilê mirovan bişînin, bi taybetî, di sektora tekstîlê de, wê astengîyên pir mezin çêbibin.'

Mijara din jî, ji alî ranêzikîya dewletê ya li karpêdana qeydnekirî ye. Ji hêlekê ve karpêdaneke qeydnekirî ya bi rêjeya ji %30 heye, ji hêla din ve jî, armancek heye ku dixwaze wê bîne binîya ji %30yî. Ji alîyekî din ve jî, der heqê handanê de jî pêkanîneke balkêş heye. Piranîya bajarên herêmê ku Amed jî tê deye, di handanê de, di rêza 6an de ye. Di handanê de; destekên ji bo prîmên personel û SGKyê wiha tên hesibandin. Dibe ku di nav sektorên we de tekstîl hebe, tiştekî din hebe. Heke hûn ji handanê havilê digirin, dewlet kesên bi berstûka şîn, bi berstûka spî ji hev cuda nake. Dibêje, hejmara hemû personelên xwe û daneyên SGKyê tev li sîstemê bike. Ez ê tenê wan di ser mûçeya herîkêm re destek bikim. Desteka prîmê ku em pir zêde li serê diaxivin, tenê desteka mûçeya herîkêm e. Heke endezyarê bi berstûka spî hebe, mûçeya herî kêm 17 hezar û 2 lîre ye. Hûn 50 hezarî, 60 hezarî didin endezyar lê dewlet dibêje wê jî 17 hezarî bihesibîne. Handan û desteka SGKyê di ser wê re tên dayîn. Belê gava em ji hêla sektorîyê ve lê dinêrin, di sanayîyê de karpêdana qeydnekirî bilind e, di çandinîyê de karpêdana qeydnekirî bilind e, di sektora xizmetê de karpêdana qeydnekirî bilind e.

Tiştekî din jî, di nava Hilberandina Nav Welêt ya Brûtê (HNT) de, para dahatê, ev 10 sal in, bi awayekî pir bi îstîkrar, derbejêr diçe. Li gorî xebateke ku min kir, ji rêjeya ji %32yan di nava hilberandina nav welêt ya brûtê de, para mûçeyan ji %32yan anîne ser ji %24an. Gava hûn ji %32yan bînin ser ji %24an, divê em behsa jidestçûyîyeke net ya bi rêjeya ji %25an bikin. Ev yek ji bo me pirsgirêkeke giring e. Amed jî yek ji sektorên tekstîlê ya hevrikîker e. Li Batmanê jî der heqê tekstîlê de xebateke, binesazîyeke, karpêdaneke pir mezin heye. Di karpêdana sektora tekstîlê de, meseleya temen, yek ji wan mijaran e ku hatiye paşguhkirin. Meseleya xebitîna bi

prîm yek ji wan meseleyan e ku hatiye paşguhkirin. Divê stratejîyeke me, sekneke me ya etîkî hebe li ser vê yekê. Divê ranêzikîyeke me ya manîfestoyî hebe ji bo karpêdanê û jîyana xebatê. Ev hemû mane ji biryardarîya hemû alîyan lê hûn heq in, pirsgirêkeke pir mezin heye. Li fabrîkayeke tekstîlê ku min serdan lê kiribû, tiştên ku we got, bala min jî çûbû serê. Muzîk ji bo tepisandina dengê amrazan bû, ev konfeksîyon bû. Xebatkar bi piranî jin bûn. Yên temenbiçûk jî hebûn. Problemek, tespîtek. Hûn heq in.

Feridun Çelik- Şaredarê Bajarê Mezin yê Amedê yê Berê

Di sala 1999an, di wê dema ku em jê hatin, bi rastî jî, avanîyeke pir xurt ya rêxistinkî hebû di nava civaka me de. Ev hêz, piştî ku me birêvebirinên cihkî bi dest xistin, çalaktir bû. Di wê demê de, li hin navendan, qadên ku wê karibin xwedîtî li jin û zarokan bikin, hatin vekirin. Bi projeyê wekî malên tendûran, malên beravê, bi lez û bez, em ketin nava wan avanîyan. Wekî din jî, ji hêla sîyasî ve, di ser organên partîyê, di ser komîsyonên û yekîneyên me yên taxan re, me di nava civakê de destkarî li bûyerên wisa kirin û kesên ku pêwîstîya tedawîkirinê hebûn jî, me ew şandin navendaên tenduristîyê û bi lezekê tedawîya wan dest pê kir. Ji bilî wê jî, me hewl da bi rêbazên qanehkirinê jî van xebatan bimeşînin. Lê belê, bû ew pirsgirêk ku her tim berdewam dike. Hê jî berdewam dike û ew ê bike jî. Sed korayî, rasteqînîyeke civakî ye.

Hêza dewletê di destekî de gihandine hev. Çendê wî alî gava ez li Edeneyê bûm, li Edeneyê qeymeqam, walî û gerînendeyê ewlekarîyê, li dijî tiryakê dimeşîyan. Bi rastî jî, em bi halê xwe yê dilsoj, dikenin. Ev rewş nayê qebûlkirin. Mixabin çavên xwe jî jê re digirin. Em di nav bûrokrasîya dewletê de gelek tiştên neyînî dibihîsin. Bi rastî jî yek ji qada têkoşînê ya giringtir divê ev qad be. Di vî warî de berpirsîyên mezin yên birêvebirinên cihkî hene. Di vî warî de, li Amedê, festîvala zarokan ya yekem me çêkir. Digel şaredarîya Sûrê, festîvala zarokan ya yekem hat çêkirin. Wê demê, hewldaneke me çêbû ji bo ku jîyana zarokan têkeve nav seqayeke din, bi taybetî jî, malbatên xizan ku nikarin bigihîjin gelek deran, me hewl da bi van festîvalan wan jî bigihîjînin dinyayên cuda.

Helbet divê em vê jî bêjin. Ameda roja îro ne Ameda sala 1999an e. Gava me li Amedê desthilat bi dest xist, hejmara şênîyan 800 hezarî bû. Îro, digel koçkirinên hundirî, hejmara şênîyên bajêr digihîje 2 milyonî. Koçkirin jî, sed korayî, di avanîya civakî û demografîk de, dibe sedemên gelek probleman. Tew jixwe ev tiryakkêşî û tiştên wek wê, ez wisa difikirim ku bandora koçberîyên derveyî jî heye li serê. Spas dikim.

Sedat Yurtdaş

Spas birêz Serok. A niha, pir pirs jê hatin kirin û ji bo ku perspektîfa îro jî binirxîne, gotinê dispêrim birêz Tunç Soyer.

Tunç Soyer- Şaredarê Bajarê Mezin yê Îzmîrê

Serê pêşîn vê bêjim, tiştên ku der heqê zarokan û meseleya tiryakkêşîyê de hatin gotin, gelek tişt anîn bîra min. Ez dixwazim wê parve bikim. Di salên 1750yî de, Thomas Hobbes dibêje: 'Di civakên otorîter de tirs ji du alîyan ve mezin dibe. Tirsa kesên ku ditirsin xezeba desthilatê li wan bibare û tirsa kesên ku ditirsin desthilata wan ji destê wan biçe.' Ev her du tirs hev xwedî dikin, mezin dikin û civakê dirizînin; di civakê de her tişt dirize. A rast, yek ji encamên wê rizînê ye ku zarok û ciwan dest bi tiryakkêşî û bikaranîna hişbiran dikin. Kêmbûna dilnizmîyê û piştevanîyê jî heye û em dikarin gelek tiştên wek vê bêjin. Bi dehan tiştên ku wê rizînê nîşanî me didin, her roj di jîyana me de ne. Nirx û xûypakî roj bi roj ji tune dibin. Destpêkirina tiryakkêşîya zarokan, yek ji delîl û nîşaneka dawî ya wê rizînê ye.

Loma jî, a rasti divê mirov li ser wê çîrokê serê xwe biêşîne ku ew ê pêşî li vê rizînê bigire. Divê mirov ne bi kermêşan re lê divê bi lîtavê re bilebike. Ji ber hindê jî, pir tişt hen bo kirinê lê a rast, ew hemû jî divê bi hev re bê kirin. Ne şaredarî ne civaka sivîl ne jî dewlet dikare bi tena serê xwe tiştekî bike.

Lê me bala xwe da serê ka em dikarin çi bikin. Me ji mafên zarokan dabû ser rê û gava ez li şaredarîya Seferihisarê bûm, me pêşî Şaredarîya Zarokan ya Siberî ava kiribû. Ev şaredarîya siberî, platformeke wisa bû ku ew ê bikira ku zarok ji ber zarokbûna xwe xweytî li mafên xwe bikirana. Nîyeta me ew bû û me wisa dest pê kir. Bi rastî jî, bi hilbijartinê hatin, rojeva xwe dîyar kirin, li hev civîyan, biryarên ku girtin, ji meclîsa Şaredarîya Seferihisarê re gotin. Meclîsa Şaredarîya Seferihisarê, ji bo wan bûtçe terxan kir. Wan ew bûtçe, li ser xebatên xwe, bi dilê xwe mezaxt. Ev xebat, piştre li Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê berbelavtir bû. Armanc ew bû ku ev zarok, ne tenê wekî mezinên siberoja vî bajarî, wekî hevparên jîyana roja îro, dizanibûn mafên wan çi ye.

Slogana me jî ev bû: 'Ne aqilê zarokan lê mafê zarokan.' Me bala xwe tim li serê hêla. Me dît, bi vê xebatê, bi taybetî jî zarokên ku li deverên xizan dijîn, êdî ji xwe û ji endamên malbata xwe bawer dikin. Bi kurtayî me dît, ew jixwebawerkirin, dibe sedem ku zarok xwe ji meseleya tiryakkêşî û bikaranîna hişbiran dûr bike û ji xwe re bi tiştên dîtir mijûl bibe. Wek min got, ev tenê pêngavek e, belkî gaveke biçûk e lê helbet bi tena serê xwe jî ne çare ye.

Yek ji şaredarên me yên berê gotibû, divê xebatên li ser çand û ziman werin destekkirin. Ji ber ku bi Kurdî axivîbû min fam nekiribû lê Sedat Beg we bi kurtayî wergerand. Dîsa bi heman rengî hevalekî me ji Weqfa Mezopotamyayê tiştekî wisa pirsîbû. Hûn pir heq in. Gava em di Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê de hatin ser kar, ji roja pêşî ve şayîşeke me ya wisa çêbû. Ev bajar refahek çêdike û sed

korayî ev refah, ji alî kesên ku li rêza pêş ya bajêr rûdinên ve tê berxwarin. Rêzên paş yên bajêr hene. Me ji ber kendavê rengê Îzmîrê bi amfî tiyatroyê dixist. Li amfî tîyatroyê tim kesên li rêza pêş, kesên ku li rêza pêşa ya kendavê rûdinên, xêra mezin ya bajêr hildidin. Yên li rêza paş rûdinên jî jixwe ser dikê jî nabînin. Loma jî, yên li rêza paş jî, bi piranî, ew Kurd bûn ku ji rojhilata Tirkîyeyê hatibûn. Ji bo ku em vê çîrokê biguherînin, ji bo ku refaha ku bajar çêdike bi awayekî adilane were parvekirin, me komikên bi navê 'çareserîya lezgîn' ava kirin. Me bi van komikan re, bi taybetî li wan taxan, xebatên ku em ê zû encam ji wan bigirin, kirin. Ev xebat, di rewşeke asayî de, ji ber demajoyên îhaleyan, wê bi salan bikudanda. Lê me çareserîyên pir bilez peyde kirin. Ev bi kêrî çi hat? Di dawîyê de, em fikirîn û me got, tevî ku li bajêr, li rêza paş in jî, divê wekî ferdekî vî bajarî, bila bizanibe ku rêz lê tê girtin û bi rûmeta xwe dijî. A rast, li paş perdeyê, fikira hîmî ya vê xebatê ev bû.

Em fikirîn ku heta wekî hevwelatîyekî vî bajarî bi xwe şanaz nebe, em çi jî bikin, em ê nikaribin wî kêfxweş bikin. Loma jî, xebatên ku wê pêşanazbûnê zêdetir bikin, hat kirin. Xebatên ku van komikên çareserîya lezgîn kirin, ne tenê ji bo çêtirkirina şertûmercên fizîkî yên taxê bû. Navendên ciwanan ku me li wan taxan ava kirin, yekîneyên şaredarîya zarokan û bi taybetî jî xebatên ku me li ser jinan kirin, tiştên hîmî ne. Me li taxan bistanên taxan danîn. Bi taybetî ev tax, ew tax in ku piranîya hevwelatîyên taxê Kurd in. Me karibû li wan deran pişteva nî, hilberandin û tevkarîya bo aborîya malbatê geştir bikin.

Der heqê wekhevîya zayenda civakî de, ez dikarim bêjim Îzmîr ji gelek bajaran pir li pêş e. Piranîya birêvebir û kadroyên me yên jorîn, jin in û pir jî serketî ne. Ji 200î zêdetir jin, me wekî ajovan kar bi wan da. Di nav dema peywira xwe de, me bi dehan jin perwerde kir da ku makîneyên kar bi kar bînin û me kar bi wan da. Li Îzmîrê, êdî jin hene ku otomobîlan tamîr dikin, rûnê erebeyan diguherînin, lastîka erebeyan diguherînin û me jin perwerde kirin, me kar bi wan da. Li her derê Îzmîrê dixebitin. Bi kurtayî, Îzmîr her ku diçe dibe bajarê jinan.

We got, gelo wekhevîya zayenda civakî di bûtçeyê de çawa cî girt. Yek ji meseleyên hîmî ku em ji demokrasîyê fam dikin, şefafî ye. Heke hûn nikaribin hesabê bidin û şefafî tunebe, mirov nikare behsa demokrasîyê bike. Loma jî, ne tenê ew e ku hûn di bin 162 seta daneyan de îhaleyan zindî biweşînin. Hema bêje hûn dikarin her tiştê Şaredarîya Bajarê Mezin ya Îzmîrê, bi awayekî şeffaf, di rûpelên wan de bibînin. Hemû îhale, hemû demajoyên kirînê, hemû proje, çavkanîyên hatine terxankirin, yên ku nîvco mane, yên ku hê berdewam dikin, hûn dikarin her tiştî bi awayekî şefaf bibînin. Ez dikarim bêjim, di nava şaredarîyên li Tirkîyeyê, herî zêde em daneyan parve dikin.

Duygu Berekatoğlu pirsî, ka gelo xeta destekkirina psîkolojîk çawa li kar ket. Ji nişkê ve erdhej li me qewimî; me ji hêlekê ve ji hevwelatîyan re digot, nebî nebî pandemî heye, ji mala xwe derneyên, ji hêlekê ve jî, me digot, erdhej çêbû li mala xwe nemînin. Loma jî, vê yekê sergêjîyek çêkir. Mirov ber bi nedîyarîyeke mezin ve çûn. Di xeta desteka pîskolojîk de, herî zêde pirsên wisa ji me hatin kirin: Em ê der-

kevin an têkevin? Em ê travmayên ji ber vê yekê qewimî, çawa ji xwe dûr bixin. Qet nebe, bingeheke me ya daneyan çêbû ku rê nîşanî me dide û bi gelek daxwazan teşe pê hatiye dayîn. Bi wê jî, hem navenda me ya têkilîya hemşerîtîyê hem jî yekîneyên me yên eleqedar, bi taybetî tenê li ser wan daneyan, me karibû çareserîyên wisa peyde bikin ku li hemû bajêr dikat pêkanîn.

Bi kurtayî, yek du tiştên din jî bêjim. Min di destpêka axaftina xwe de behsa ekonomîya demokratîk kiribû. Ez hay jê bûm ku min ew bi awayekî berfireh negotiye. Ez du mînakên berbiçav bêjim. Meseleya ku hilberînerê biçûk dibe kirdeyê ekonomîyê. Bi kurtayî, rêya herî hêsan ya ku em wekî demokrasîya ekonomîk pênase dikin, kooperatîfgerî ye. Lê kooperatîfgerî ne tiştekî wisa ye ku tenê di çandinîyê de tê pêkanîn. Em di veguhastinê û veguherîna bajarî de jî kooperatîfgerîyê bi cî tînin.

Em di veguhastinê de wiha bi cî tînin: Em dibêjin, em ê amrazên xwe yên veguhastina komî ji hin rêgehan vekişînin. Em bêjin, otobusên me rojê nizanim çenda caran diçin bajaroka Ödemişê. Em xwedîyên mînîbusên di wê xetê de diçin tên, li hev dicivînin. Em ji wan re dibêjin: Em ê amrazên xwe ji vê xetê bikişînin. Em ê li ser kalîte û standarda ESHOTê, amrazên veguhatina komî bikirin. Hûn ê heqê wan bidin. Lê wê hemû potansîyela rêwîyên vê xetê jî li ser we be. Daxwaza me ji we ew e ku hûn di standarda ku me danîye de xizmetê bikin. Loma jî, heke çûnûhatin ji bo kesên temenê wan ji 65an zêdetir e, bêpere be, tu yê jî wan bêpere bibî û bînî. Lê em ê perê wan bidin we. Ez dirêj nekim. Çîrokeke bi hûrgilî ye. Lê me bi vî rengî kooperatîf ava kirin, me kooperatîfên veguhêzkar ava kirin û me derfet bi dest xist ku amrazên veguhastina komî ji wê xetê hildin. Ev yek ji bo me. bû sexbêrîyek ecêb mezin. Ji mazotê, ji tamîra amrazan, ji ajovanan, sexbêrîyek çêbû. Di heman demê de, ji bo wan mînîbusvanên ku di bin banê wê kooperatîfê de dixebitin jî bû çavkanîyeke dahatinê. Ji bo hevwelatîyan jî bû keys ku bi kalîteyeke pir zêde biçe wan cihên ku qet erebe nediçûyê. Ev ew modêl e ku me di veguhastinê de ava kir.

Me heman modêl ji bo veguherandin bajarîyî jî kir. Di veguherandina bajarîyî de, me derfet çêkir da ku hevwelatî karibin ji milkdarîya tewqan derkevin û wekî pardarên erda kooperatîfê di bin banê kooperatîfê de bên cem hev û bi vî awayî jî karibin bêîhale bi şîrketên şaredarîyê re bixebitin. Ez dikarim van yekan bi kitekitî bêjim, ez dirêj nekim. Tenê ez difikirim ku kooperatîfgerî tiştekî pir pêwîst e. Heke hilberînerê biçûk, hevwelatîyê asayî nikaribe bibe kirdeyê ekonomîyê, wê çaxê ne di tevdehîkirinê de, ne di meseleya nîskan de, ne jî di tiştekî dîtir de, refah nagihîje hevwelatîyan. Ji bo ku hevwelatî karibin para xwe ji refahê bigirin, teqez divê karibin di bin banê kooperatîfê de bigihîjin hev. Ev yek jî peywireke giring ya şaredarî û STÖyan e.

Wekî dawî, Barış Avşar pirsî û got, gelo garantîyeke çawa heye. Ez bi wê bi dawî bikim. Tu garantî tune lê garantîyeke wisa heye. Ev xebatên ku me 10 sal li Seferihisarê 5 sal jî li Îzmîrê kirin û hûn dixwazin bila li hemû Tirkîyeyê bibe modêlek, bi taybetî jî ew ên ku me di çarçoveya aştîya civakî de kirin û xebatên ku me li ser

çanda bihevrejîyînê kirin, garantîya wan xebatan ya herî mezin, ew hevwelatî bi xwe ne ku wê dijîn. Baş e, em ê çawa xwedîtî li vê bikin û em ê çawa vê berbelavtir bikin? Bi xwedîtîkirina li partîyê, bi veguherandina li partîyê, bi çêtirkirina li partîyê, ez behsa partîya xwe dikim. Di dawîyê de, girêdana me ya li vî welatî, eşq û sewdaya me, hûn çi dibêjin bêjin, tu eleqeya wê bi palgeh û miqamê re tune. Wekî encam, em li ku derê bin jî, em ê wekî divêtîyeke wê eşqê, wê bengîtîyê, xebatên xwe bikin. Ez jî, ji vê û şûnde, ji bo çêtirbûna partîyê, ji bo xurtbûna wê û ji bo ku ev çîrokên me afirandin li hemû derên welêt berbelav bibin, ji bo ku ev desthilata çavsorbûyî were sekinandin, teng lê were jidandin, çi hewce be, ez ê hewlê bidim ku wê bikim.

Bi kurtayî, ez wisa difikirim ku ev çîrok, şayîşên me hemûyan e. Ez dizanim, hûn hemû yek bi yek şayîşên wisa dikişînin. Em hemû, ji vê xizanî, ji vê perîşanî, ji van azadîyên sînorkirî ne razî ne û tu yek ji me bi vê rewşê ne kêfxweş in. Dawîya dawî, lêgerîna me hemûyan ew e. Gelo em ê karibin çi bikin da ku karibin hemû çîrokê biguherînin, em ji vê xelas bibin û em ê çîrokeke dîtir bikin tiştekî gengaz. Bi ya min, em ê vê bikin tiştekî gengaz. Ne gengaz e em ji vê verevin, ji vê dûr bimînin, em bêgav in vê yekê bikin. Ji ber ku em dizanin, kesên ku hildiberînin, mirovên qenc û ked bi xwe, her tim bihêztir e.

Ez bêjim, xebata ku îro DİTAMê kir pir hêja ye û min jî ders jê hildan û axaftina xwe bi dawî bikim. Dest û keda her kesî xweş be. Bi rastî jî pir kêrhatî bû. Ez li ser navê xwe, bi hêvîdarîyekê ji vir diçim. Min dît ku mirov li cihekî Tirkîyeyê, her çend şaredarîya wan tunebe jî, serê xwe diêşînin û dibêjin, gelo em dikarin ji bo bajarê xwe çi bikin, pirsgirêkan dîyar dikin û çareserîyan peyde dikin. Heke piçikek jî tevkarîya min lê çêbûbe, şabaş ji min re. Ez spas dikim.

Sedat Yurtdaş

Birêz Serok, spas ji bo van tevkarîyên we yên hêja. A niha, ji bo ku civînê bi dawî bike, ez gotinê dispêrim Serokê Desteya Birêvebirinê ya DİTAMê, Birêz Mesut Azizoğlu.

Mesut Azizoğlu

Ez ê pir dirêj nekim. A niha gelek tişt hene ku em bikin da ku em karibin hêvîyê bidin Îzmîrê. Me ev fam kir. Ez spasîya xwe li hemû mêvanan, li kesên ku rapor amade kirine, li mêvanan, li Birêz Tunç Soyer, li Birêz Feridun Çelik dikim. Rojeke xweş ji bo her kesî dixwazim.

Seyrantepe Sanayi Mahallesi, Elazığ Caddesi, Çeysa Twins Towers,
C Blok No:10/77, 21120 **Yenişehir/Diyarbakır**

Tel: 0412 228 00 03 **E-mail:** info@ditam.org

ditam.org.tr